



Armanc

Danê rojnameya pêşî ya Kurdî
Wîqadê Mihêd Bedirxan

HEJMAR/NO: 9-10, NÎSAN-GULAN/APRIL-MAJ 1996, BIHA/PRICE: 40 000 TL, 20 SKR, 4 DM

Di 1'ê Gulanê de xwîn herikî

Li Stenbolê di pîrozkirina 1'ê Gulanê de di navbera polis û meşvanan de şer derket, 3 kes hatin kuştin; grûbên çep ên îlegal çend taxên Stenbolê bi çend seetan be ji xistin bin kontrola xwe, bi dehan seyare şewitandin, bi sedan dikanên resmî û neresmî dan ber kevir û daran, rê li ber serok û berpirsiyarên sendikayan jî girtin û nehiştin ku ew di mitîngê de biaxivin.

Polîs ji bo ewleyîyê destûr neda ku karkirên sendikaya KESK li Diyarbekirê 1'ê Gulanê pîroz bikin. Li Suleymaniyê 1'ê Gulanê bi xwepêşandin û bi şahiyekê hat pîrozkirin.

Rûpel: 10

Demokrasî, dîn û dewlet

Di esasê xwe de tu carî li Tirkîyê têkiliyên dîn û dewletê ji hev cuda nebûn, Îslamiyeta sunnî ya li ser mezhebê Hanefîtiyê avakirî, her ma dînê esasî yê dewletê; lê bi wî şertî ku ew jî bi her awayî têkeve bin kontrola otorîta merkezî ya nuh û bibe tabîê "dînê nuh" ê cumhûriyeta Tirkîyê; Kemalîzmê. Li Tirkîyê berî her tiştî Kemalîzm dihat, pişt re sunnîtiya Hanefî û di pey wan re jî yên dîn.

Gerçî hin dîn û mezheb; her wekî Alewîti û Bektaşîti, heta dereceyekê dînên din jî pê kêfxweş bûn ku sunnîtiya Hanefî ket bin destê Kemalîzmê, hêvî kirin ku belkî piçekî bilhna wan jî were ber wan, lê heta îro jî her çendî ku bi vê hêviyê man û xwe dan pişt Kemalîzmê jî, ev hêvî ji wan re rast negeriya, Kemalîzmê cihekî maqûl ê birûmet û şerî neda wan, firsenda jiyaneke serbest ji wan re peyda nekir. Gellek terîqet û cemaet jî her bi vî awayî man, heta wan jî Alewîtiyê bêtir derb xwarin. Sunnîtiya Hanefî ya ku di rîya Diyanetê re-hevsarê wê di destê Kemalîzmê de bû, her serdestê hemû dîn, mezheb û terîqetan ma. Îro jî kê zêde rewş bi vî awayî ye. Yanî ne ku li Tirkîyê karûbarê dîn û dewletê ji hev cuda bûye û jiyaneke layîst a demokratîk belav bûye.

Rûpel: 3



PYSK AVA BÛ

Pênc rêxistinên Kurdan bûn yek, Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê damezirandin

KAWA, KUK, TSK, TS û YEKBÛN ku ev demek bû di bin navê Platforma Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê de xebata xwe ya yekîtiyê dimeşandin, bi hev re kongreyek yekîtiyê civandin û partiyeke nû, PYSK (Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê) damezrandin

PYSK, hêzên neteweyî yên her çar perçeyan wek hêzên neteweyekê û welatekî dibîne. Bi hemû hêzên neteweyî û demokratîk ê her çar perçeyan re siyaseta hevkarîyê diparêze. Loma jî vatîniya avakirina Konseya Neteweyî ya Kurdis-

tanê ku hêzên welatparêz ên her çar perçeyan û Kurdên li derveyî welêt tê de ciyê xwe bigrin, vatîniyêke di rojevê de dibîne.

KAWA, KUK-RNK (Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê), TSK (Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê), TS (Têkoşîna Sosyalîst) û YEKBÛN (Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê) ku ev demek bû di bin navê Platforma Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê de xebata xwe ya yekîtiyê dimeşand, di navbera 21-27ê nîsanê de bi hev re kongreyek yekîtiyê civandin û partiyeke nû, PYSK (Partiya Yekîtiya

Sosyalîst a Kurdistanê) damezirandin û ev bi daxuyaniyekê ji raya giştî re îlan kirin.

Li gor daxuyaniya Komîteya navendî ya PYSKê, ev cara yekem e ku bi vî awayî yekîtiyek di nav hêzên Kurdistanê de pêk tê. Wek tete zanîn ev demek bû di nav van 5 partî û grûbên sosyalîst de xebata yekîtiyê dihate kirin. Piştî xebateke nêzîk sal û nîvekê, bi beşdarbûna hin kadroyên serbixwe jî -ku ji tradîsyona YEKBÛNê dihatin- PYSK hat damezirandin.

Rûpel: 10

PROBLEMÊN ROJNAMEVANIYÊ

Medyaya partî-polîtîk li Kurdistanê serdest e û berpiyê rojnamevanan jî pîrr teng kiriye. Arîf Zêrevan di neynika vê hejmarê de dibêje heta li Kurdistanê qedrê kesekî himbe yê serokekî neyêt girtin dê rojnamevanî pêş ve neçe.

Rûpel: 6

'BILA SALA 1998'AN BIBE SALA ROJNAMEGERIYA KURDÎ!

Bi munasebeta salvegera roja rojnamegeriya Kurdî, di 23'ê Nîsanê de li Navenda Çanda Mezopotamyayê panelek pêk hat û di vê panelê de berpirsê Armancê Yakûp Karademîrî pêşniyar kir ku "sala 1998'an bibe sala rojnamegeriya Kurdî".

Rûpel: 8

QURBAN YAN BERPIRSIYAR?

Sosyonom Abidê Diyarbekirî dibêje: "Me her gav xwe qurban dîtiye û ev hîna jî berdewam e. Ev ruh di her tebeqeya civata Kurd de kê zede heye. Ji dê û bavên me bigire heta serokên me, ev bêçaretî di tarîxa me de, heta îro wek toqekê ketiye hustuyê me."

Rûpel: 5

Armanc hate cildkirin

Cild 1, hejmar 62-92

Cild 2, hejmar 93-128

Cild 3, hejmar 129-158

Bihayê hersê cildan 750 SKR ye

Kesên ku bi posteyê bixwazin
divêt heqê posteyê jî bidin

Navnîşan

Armanc
Box 15216
161 15 Bromma - SWEDEN
Tel: +46-(0)8-80 31 35
Faks: +46-(0)8-80 18 25

SERSAXÎ

Diya endamê redaksiyana me Faris Can, Kamîle
xatûn di 10'ê Nîsana 1996'an de wefat kir.
Em ji hevalê xwe û malbata wî re sersaxiyê
dixwazin.

REDAKSIYON

Radyoya Mizgîniyê

Li Ewrûpayê

Her roja Şemiyê (Sebtê) êvarî di navbera saet 20.45 û
21.00-ê de li ser pêla navîn (MW), 1395 kHz.

Li Tirkîyeyê

Her roja Yekşemê (Lehdê) êvarê di navbera saet 21.00 û
21.30-ê de li ser pêla kin (SW), 31 Metre, 9430 kHz.

Mizgîni, Postfach 1125,
35441 Biebertal, Elmanya

Serrastkirin

Di hejmara Armancê ya meha Adara 1996'an de (no: 8), di nûçeya bi sernivîsa "Kongreya Komeleya Nivîskarên Kurd" de agahdariyek kêm hatiye dayin. Di paragrafa duduyan de, navên kesên ku ji bo Komîteya Karker hatine hilbijartin hatiye rêzkirin. Di nava wan de navê Firat Cewerî nehatiye nivîsîn. Kesên ku ji bo Komîteya

Karker a Komeleya Nivîskarên Kurd hatine hilbijartin ev in: Mehmed Malmîsanij, Osman Aytar, Zinar Soran, Rohat Alakom, Firat Cewerî, Salim Çelîker û Elîşer.

Herweha her di wê hejmarê de xeletiyên rêzkirinê çêbûne.

Em ji bo vê kêmasiyê û xeletiyên rêzkirinê uzrê xwe dixwazin.

REDAKSIYON

Divê PKK jî bê rexnekirin!

M. SERDAR - DIYARBEKIR

Bi hatina biharê re ordiya Tirk Bêrişke mezin bir ser gerillayên PKK'ê. Ordiya Tirk di vê êrişê de 30 hezar leşker bi helikopterên Kobra û Super Kobra bi kar anîn. Operasyona ku bi piranî sêgoşeya Hênî, Licê û Pasûrê de çêbû li gor îstatistikên dewletê 30 leşker û 100 gerillayên PKK'ê hatine kuştin. Lê li gor PKK'ê wan zayıatek mezin dane dewletê, gelek esker hatine kuştin, heta gotin navê 50 eskerên kuştî di destê me de ne.

Lê di neticeyê de herdu alî jî li hember hev şerê psikolojîk didin, kuştiyên xwe ji raya giştî ya xwe re jî nabêjin.

Ev şer weha bûye ku êdî di raya giştî ya Kurdan de jî bûye tiştekî normal. Xelk êdî reaksiyon nîşan nade, bêdeng û laqayîd dimînin. Xelk huzûr û aştiyê dixwazin. Piraniya xelkê nizanin çibikin, hinek ji wan li îmkânên aborî digerin ku terka bajar, qeza û gundên xwe bikin. Piraniya xelkê derveyê saha xebatê ye, lê ew êdî zanin ku tesîra vî şerî bi

awayekî digihêje wan jî. Sedemên buhabûna jiyânê û feqîrbûna wan, bi şerî ve girêdidin, taqet bi wan re nemaye ku bifikirin. Xort piranî bê kar in û li qehwexaneyan rûdinin. Qehwexane

bûne wek karxaneyên bajêr. Diyarbekir weha bûye ku êdî kes kesî nas nake; ji ber ku gundî û însanên qezayên derûdora Diyarbekirê piraniya wan hatine li bajêr bi cî bûne, û yên Diyarbekirî jî însanên ku rewşa wan ya aborî baş in terka bajêr kirine û çûne metropolê.

Wê rojê ez li qahweyekê bûm û min guhê xwe da hin sohbetan ku di navbera hin kesan de derbas dibûn. Sohbet weha bû: "PKK bi têkoşîna xwe ya çekdarî çendek be jî li ser şuûra neteweyî ya Kurdan tesîra xwe nîşan daye û di şiyarbûna millet de rola xwe listiye. Baweriya ku li ber millet hebû û di mêjiyê gelî de bi cî bûbû ku dewleta Romê mezin e û meriv nikare li hember wê şer bike, PKK'ê bi şerê xwe ev tabu şî-

kand. Ew her gav pîrsa Kurdî di rojevê de dihêle. Lê, ev 10 sal in ku PKK li dijî dewleta Tirk şerê çekdarî dide lê di vê 10 salan de 10 mitro erdê rizgarkirî jî bidest nexistiye û şehîdên ku wê daye ji

kuştîyên dewletê 3-4 qat zêdetir in. Wexta piştî 10 salên şerê çekdarî gelek bajar û gund hatibin vala-

kirin, bajar û qezayên ku bi salan welatparêzî li wan deran xurt bû û îro wan ev taybetiyên xwe wenda kiribin, bi milyonan însan welatê xwe terk kiribin, li ser millet tirs û xof hebe û ya herî girîng civata Kurd ber bi civata eskeribûnê ve here, dive li ser vî şerî dûr û dirêj bê rawestandî, munaqeshe û analizên ciddî bînin kirin û netîce jê bînin derxistin".

Van kesan li ser strûktûra PKK'ê jî weha digotin; "Di eslê xwe de PKK wek partî tune ye, her tişt serokê wê Abdullah Ocalan ve hatiye girêdan. Ne organ û ne jî demokrasî di hundirê parti-

ya wî de tê bikaranînin. Ew her tişt e û li ser hemuyan e. Ma we heta nuha dîtiye ku bi navê Komîta Merkezî ya PKK'ê belavokek jî hatibe belavkirin? Abdullah kare endamên xwe bike qehreman û kare wan bin erdê xe jî. Kes nikare wî rexne bike lê tenê karin pesnê wî bidin. Hevalên wî yên ku wî rexne dikin, tînan afaroz kirin. Endamên wî li cem wî dikevin hezrolê. Ji tirsê be an ji hurmetê be wexta ew bi telefonan (ji ber ku ji ciyê xwe nikare derkeve, mahkûm e) jî beşdarê programên MED-TV dibe herkes radibe ser lingan û çepikan jê re lêdixin, heta temaşevanên MED-TV bi wî dest bi axfina xwe dikin û bi wî axaftina xwe dawî tînin. Spîkerên televizyona wî dikevin hezrolê heta dawiya programê xwe di hezrolê de dimînin. Gelo ecêbeke weha li dinyayê qewimiyê!

Ku em civatek demokratîk û plûralîst diparêzin û li hember sistema Tirkîyê derdikevin, divê em ji wan demokratîktir û bi toleranstir bin. Divê em karibin rexneyan li serokên partiyên û dîtinên wan bigrin. Ger ku em weha nebin, sistema ku em ê ava bikin, dê çî ferqa wê ji ya dijmin hebe!?"



Armanc
Box 15216
161 15 Bromma
SWEDEN

FÎŞA ABONETIYÊ

Armanc

SWÊD: Armanc, Box 15216, 161 15 Bromma - SWEDEN
Postgiro: 4972255-6, SWEDEN • 250 SKR/sal

ALMANYA: M. Ali Karaaslan, Dresdner Bank - Giessen
Konto: 8 838 847 00 • BLZ: 513 800 40 • 60 DM/sal

TIRKIYE: Yakup Karademir, Akbank T.A.Ş., 142 Aksaray - ISTANBUL
Hesab no: 0017880-6/BU6/01 • 400 000 TL/sal

Aboneyên Ewrûpayê abonetiya xwe li hesabên Ewrûpayê razînin, û yên li welatî jî li hesabê welatî razînin.

NAV/AD:

PAŞNAV/SOYAD:

ADRES:

PEREYÊ RAZANDÎ/ÖDENEN PARA:

Armanc

Rojnameya Kurdî
ya mehane
&
Monthly Kurdish Magazine

Hejmar 9-10 (167-168)

Redaktorê berpirsiyar
Mûrad Ciwan

Redaksiyon

Mumtaz Aydin
Faris Can
Nihat Eli

Ehmed Huseynî
Yakûp Karademîr
Remzî Kerîm
Mahmûd Lewendî
Hesen Mizgîn
Emîn Narozî

Berpirsiyarê beşê dimilî
Malmîsanij

Nûçegihan

M. Ali Karaaslan - Almanyayê
Azad Ibrahim - Ingilîstan

Mizanpaj / Redigerîng
Arif Zêrevan

Şertên abonetiye Abonetiya salekê

Skandinaviya: 250 SKR
Ewrûpa: 60 DM
Derveyê Ewrûpayê: 50 \$

Prenumeration
maqam/myndighet
450 SKR

Anons / İlan
Niv-rûpel
5 000 000 TL
2 500 SKR, 500 DM

Adresa Ewrûpayê
Box: 15216
161 15 Bromma
Sweden

Tel: +46-8-803135
Faks: +46-8-801825

Hesabê Ewrûpayê
Postgiro: 4972255-6
Sweden

Ji bo aboneyên Almanyayê

M. Ali Karaaslan
Dresdner Bank - Giessen
Konto: 8 838 847 00
BLZ: 513 800 40

Utges av
Kurdiska demokratiska
arbetarunionen

ISSN: 0348-7385

Li Tirkîyê yek ji wan pirsên ku pirtirîn tèn munaqesekirin, mesela têkiliyên dewleteka demokratîk e ku ligel dîn datîne. Wekî hemû têkiliyên dewleta Tirk, yên wê yên bi dîn re jî tu caran li cihê xwe rûneniştine.

Esasen têkiliyên dewleta Tirk yên bi dîn re hê ji dema avabûn û geşbûna dewleta Osmanî de dest bi şikilgirtinê kirin. Bi taybetî gava ku dewleta Osmanî li rojhilat û rojava ber bi firehkirina erdên bin destê xwe kir, merkezên dînî yên Îslamiyetê dagir kirin û sultanên wê, xelîfetiya îslamiyetê xist destê xwe, piştî jî di wan şeran de ku bi Îraniyên şîî re hatin kirin têkiliyên dewletê bi dîn re bi wî awayî hatin avakirin ku dîn ket bin kontrola otorîta siyasî, sunîti û bi wê re jî mezhebê Hanefî bû dîn û mezhebê resmî yê dewletê, rê li ber serbestî û geşbûna dîn û mezhebên din hat girtin. Dewletê li gor berjewendiyên xwe di çarçeweyên taktîkên siyasî de têkilî bi dîn û mezhebên neresmî re danîn. Carna li hesabê dewletê hat destek da bin hinekan, çav li wan girt an ew teşwîk kirin ku serî bilind bikin û berfireh bibin. Carna jî gava xeteriyek di wan de dît, hucûmî ser wan kir darbe li wan da û ew jar xistin.

Di tarîxê de palpişkîrîna dem bi dem ya Bektaşîtiyê di nava yenîçeriyên de ji bo mejişûştina endamên wê ordiya ji zarokên Xiristîyanan berhevkirî û berfirehkirina erdên dagirkirî li Balkanan, çav lêgirtin û hetta teşwîkkirina Mûsewîtiyê di nava erdên Împaratoriya Osmanî de li hemberî dinya Xiristîyan, qetilkirina bi dehhezaran Alewîyan di wê dewrê de ku şer bi Îranê re dihatin kirin, dewr bi dewr serkutkirina Alewîyan di tarîxên piştî van şeran de jî, zulma li ser Ortodoksên Ermenî û Suryanî, Keldanî û Marûniyan, qetilkirina Bektaşîyan di demên dawiyê de ku gava yenîçerî bûn xeter ji dewletê re; ev hemû mîsalên wê yekê ne ku dewleta Osmanî dîn xistibû bin hukmê otorîteya siyasî û di hemû têkiliyên xwe de bi dîn, mezheb û terîqetan re serê hevzar di destê xwe de digirt.

Piştî ku dîn û mezhebê dewletê bû Îslamiyeta sunnî û bi taybetî jî Hanefîti îmkân û teşwîkek mezîna dît, ji alî bîr û

MÛRAD CIWAN
m.cilgin@pocab.se

Demokrasi, dîn û dewlet

rêveçûnan ve xwe xurttir kir, prensîb, fetwa û rêveçûnên wê şerîyeteke mezin wergirtin, dîn, mezheb û terîqetên ku bi Hanefîtiyê re ne muwafiq bûn hatin piçûkxistin, rê li ber wan hatin girtin, îmkân ji destên wan hatin stendin, heta gelekên ji wan zoreka mezin a dewletê li ser xwe dîtin, terîqetên tesewufî yên ne ligorî vî mezhebî, hatin eşandin, li ser navê sunnîti û Hanefîtiyê sansûrek giran li ser van der û doran hat meşandin ku em dibînin di dewra xurtbûna Împaratoriya Osmanî de dewlemendiya pirreng a dînî, felsefî û teswufî ya ku di sedsalên 9, 10, 11 û heta 12'an de di civakên musulman de hebûn, bere bere jar bûn, dînamîzma fikrî pûç bû, li ciyê fikir û munaqeseyan bawermendiyên hişk ên dogmatîk serdest bûn, bêtehamulî û bêfahmiyê pencên xwe avêtin nava mejiyên însanan, felsefe û tesewuf paşde ket, qels bû.

Gava di destpêka sedsala me de Împaratoriya Osmanî ber bi têkçûnê de çû û li şûna kaviîlên wê Cumhûriyeta Turkiyê

xwedî li mîrata wê împaratoriye derket û ava bû, têkiliyên dîn û dewletê bi vî awayî bûn. Di demên dawîya jiyana împaratoriye de, ew tevgerên ku aligirên ber bi jiyaneke Rojavayî de bûn rexne li wê sistemê girtin û daxwaz kirin ku her wekî gellek welatên Rojava, têkiliyên dîn û dewletê ji hev bîr cudakirin.

Tu carî li Tirkîyê têkiliyên dîn û dewletê jêv cuda nebûn, Îslamiyeta sunnî ya li ser mezhebê Hanefîtiyê avakirî, her ma dînê esasî yê dewletê; lê bi wî şertî ku ew jî bi her awayî têkeve bin kontrola otorîta merkezî ya nuh û bibe tabîê "dînê nuh" ê cumhûriyeta Tirkîyê; Kemalîzmê.

Piştî, danerên Cumhûriyeta Tirkîyê, xwedî li wan rexneyan derketin ku li wê sistema Împaratoriya Osmanî dihatin girtin û xistin qanûnên esasî û yên dîn ku dewleta Tirk dewleteke laîk e, têkiliyên dîn û dewletê ji hev hatine cudakirin. Lê di esasê xwe de tu carî li Tirkîyê têkiliyên dîn û dewletê ji hev cuda nebûn, Îslamiyeta sunnî ya li ser mezhebê Hanefîtiyê avakirî, her ma dînê esasî yê dewletê; lê bi wî şertî ku ew jî bi her awayî têkeve bin kontrola otorîta merkezî ya nuh û bibe tabîê "dînê nuh" ê cumhûriyeta Tirkîyê; Kemalîzmê. Li Tirkîyê berî her tiştî Kemalîzm dihat, piştî re sun-

nîtiya Hanefî û di pey wan re jî yên din. Gerçî hin dîn û mezheb; her wekî Alewîti û Bektaşîti, heta dereceyekê dînên din jî pê kêfxweş bûn ku sunnîtiya Hanefî ket bin destê Kemalîzmê, hêvîkirin ku belkî piçekî bîhna wan jî were ber wan, lê heta îro jî her çendin ku bi wê hêviyê man û xwe dan pişt Kemalîzmê jî, ev hêvî ji wan re rast negeriya, Kemalîzmê cihêkî maqûl ê birûmet û şerî neda wan, firsenda jiyaneke serbest ji wan re peyda nekir. Gellek terîqet û cemaet jî her bi vî awayî man, heta wan ji Alewîtiyê bêtir derb xwarin. Sunnîtiya Hanefî ya ku di riya Diyanetê re hevzarê wê di destê Kemalîzmê de bû, her serdestê hemû dîn, mezheb û terîqetan ma. Îro jî kême zêde rewş bi vî awayî ye. Yanî ne ku li Tirkîyê karûbarê dîn û dewletê ji hev cuda bûye û jiyaneke laîsîst a demokratîk belav bûye. Dewletê dîn xistiye bin kontrola xwe, Hanefîti kiriye şerê nava qefesê û yên dîn jî pelixandine.

Ji ber wê çendê jî hemwelatiyên Tirkîyê yên ji bilî Kemalîstan her tim eşkere ji ber bîr û baweriyên xwe yên dînî û tesewufî û îbadetên xwe, zulm û zor dîtine, hatine eşandin. Sunniyên Hanefî yên ku ne Kemalîst bûne wan bi xwe jî tu carî qîma xwe bi wê rewşê neanîne, tevî ku gelekên ji wan ji wan nîmeta îstîfade kirine ku Kemalîzmê mezhebê wan serdesttir girtiye, hetta gellek caran bi saya îmkânên ji wê serdestiyê hatî, êriş birine ser dîn û mezhebên din.

Grûbên civatê yên ne musulman ên wekî Xiristîyan û Mûsewîyan hê di dema peymanê Lozanê de bi saya dewletên Rojhilat li hemberî qanûnên Tirkîyê statuyê serbest û azad wergirtine. Tirkîye nikare bi qanûnan rê li ber Xiristîyanî an Mûsewîtiyê bigre, çimkî li gor peymanê, qanûnên ku li Tirkîyê derkevin nikarin li dijî Peymana Lozanê bin. Lê divê em ji bîr nekin ku di praktîkê de hergav prensîbên peymanê li ber çav nehatine girtin, di binî re hergav û car carina jî bi eşkeriyê ehlê Xiristîyanî û Mûsewîtiyê xwe di bin tehdîdê de hîs kirine, di warê propaganda, hîndekariyê û siyaseta de hatine dîskrimînekirin, neheqî li wan bûye.

Ew mezheb û terîqetên Îslamî yên ne sunnî; hetta ne Hanefî, ji parastîneke peymanê navnetewî û pê re jî ji ya qanûnan jî bêpar mane, loma jî di praktîkê de pirtir hatine eşandin û piçûkkirin û lekekirin.

Ji alî têkiliyên dîn û dewletê ve, îro dewranek wilo hatiye ku ev têkilî nema dimeşin; nema kes qîma xwe bi wê rewşê tîne. Loma jî têkiliyên dewletê bi dîn re, qanûn û mûeseyên wê yên ku van têkiliyan ava dikin û şikl û reng didin wan, tèn munaqesekirin. Diyar e ku di van munaqeseyên de rexneyan de rewş hatiye qonaxek wilo ku Kemalîst jî tê de kes îdî nikare bibêje ku ew dewlet dewleteka laîk e û têkiliyên dîn û dewletê ji hev cuda ne. Daxwaza reorganîzekirina dewletê li hemberî dîn her ku diçe di nava civatê de bilindtir dibe.

Divê meriv balê bikşîne ser xaleke Muhîm ku erê hema hema tevayîya civatê ji bilî Kemalîstan jî wê rewşê ne razî ne ku heta îro hatiye, lê di daxwazên xwe de ne muştêrek in. Hin hene ku daxwaza wê yekê dikin ku bira dewlet dev ji mildana ber sunnîtiya Hanefî berde, rê li ber mezheb an terîqeta wan veke, hin jî hene ku dixwazin bira Diyanet rabe, dersên dînî ji medresan bîr rakirin, dewlet meaş nede îmaman, camî û



îmamxetîban ava neke, bira dewlet alî-kariya tu dîn an mezhebî neke, ehlên her dîn an cemaetê bira li gora baweriyên xwe yên dînî bijîn.

Evên ku bi vê îddayê radibin alîgirên dîn û mezhebên dîn in ku tucarî baweriyê bi wê yekê naynin ku wê dewlet alîkariya dîn an mezhebê wan bike naxwazin tu mezhebinî dîn jî xwedanê îmkanên dewletê bin.

Lê piraniya xwedanê wan teklîfên jorîn ew kes in ku terefdarê sunnîtiya Hanefî ne qenaeta wan ew e ku piraniya xelkê Tirkîyê musulman û Hanefî ye, heke rê li ber vebe wê qeweta xwe bide vî

be tedaxulî hebûn, jîyan an serbestiya dîn, mezheb an terîqetêke dîn bike. Ji bo ku ev prensîb têkeve jîyanê, dewleteka demokratîk çî qanûn lazîm bin divê derêxe, çî mueseşe lazîm bin divê ava bike, çî îmkanên maddî û zanistî lazîm be divê pêşkêşî hemwelatîyan bike.

Li Tirkîyê di warê dînî de ji bo ku meriv jî dewletê re karibe bibêje demokratîk divê mîsalen; hemwelatîyên wê yên musulman ên sunnî yên Hanefî bi her awayî karibin hanefîtiya xwe bijîn bes bi şertê ku ew nikaribin rê li ber Şafîîyan, Alewîyan, Şîîyan, Bektaşîyan, Êzîdîyan, Xiristîyan, Mûsewî, Bûdîst an bêdînan bigrin,

heqaret an neheqiyekê li wan bikin, gerek ew jî û bi wan re alîgirên hemû dîn, mezheb an terîqetên dîn jî karibin ji îmkanên dewletê yên ji bo meselên dînî veqetandî fêde bistînin.

Divê hemû dîn, mezheb û terîqetên ku hemwelatî baweriyê bi wan tînin û heta yên ku ne hemwelatî ne lê li


Tirkîyê dimînin, dijîn an seyahet dikin karibin ew çawa dixwazin bi wî awayî xwe îfade bikin û pêk binin û dewlet bes lê miqate be ku kes nikaribe rê li ber wan bigre, neheqiyê li wan bike an ew neheqiyê li hinan bikin. Çarçewa wazîfa dewletê ne ji vê yekê û lazîmîyên vê yekê wêdetir e. Mîsaleka herî aktuel; em bêjin ku jinek bixwaze bi çarşev bigere, kar bike an bixwîne divê ev serbestî hem ji alî dewletê hem ji alî hemwelatîyan jê re hebe, lê her eynî îmkan û fîrsend divê ji yeka serserqot an cilkurt re jî hebe. Yan jî mîsaleke herî "ekstrem"; em bêjin heke mêrek çar jinan bîne, bes bi şertê ku ew zewac bi temamî jî zorê bigêrê; bi her awayî bi dilxwaziya her pênc terefên zewacê be, divê ew karibin bîzewicin û dewlet an hin kesên dîn nikari-

Helbet Kemalîst ku bingehên wan pirtir îro di nava ordiyê, burokrasiyê û hin entellektuelên Tirk de heye dixwazin dewran her wekî berê bimeşe, laîkî li ser navê dewletê bimîne lê di eslê xwe de mezhebê resmî tabîi Kemalîzmê be, serokê Diyanetê jî bimîne wekî şeyxulîslamê Kemalîzmê.

Helbet Kemalîst ku bingehên wan pirtir îro di nava ordiyê, burokrasiyê û hin entellektuelên Tirk de heye dixwazin dewran her wekî berê bimeşe, laîkî li ser navê dewletê bimîne lê di eslê xwe de mezhebê resmî tabîi Kemalîzmê be, serokê Diyanetê jî bimîne wekî şeyxulîslamê Kemalîzmê.

Li Tirkîyê gellek ne zêde bin jî hin der û dor jî hene ku dibînin tîkiliya vê rewşa dewleta Tirk a ji alî dîn û mezheban ve ne bi laîsîzmê ne jî bi demokrasiyê re lihev dike, lê ji bo ku gava wekî terefdarên serdestiya dînî û mezhebî bikin nabe û wekî Kemalîstan bikin nabe, dikin nakin nikarin rewşeka zelal a demokratîk bidin xwe û di navbera du astengan de diqilqilin. Helbet ev jî tîrnenasîna demokrasiyê, dewleta demokratîk û awayê tîkiliyên hemwelatîyên dewleteka wiha tî.

Di dewleteka demokratîk de ya ku reng dide rewşa dîn û dewletê li hemberî hev, ne dîn bixwe ye, ne jî nêrîna dewletekê ya li ser dîn e. Ya ku reng dide wê, maf, azadî û berpirsiyariyên hemwelatîyan e. Wekî di hemû meselên jîyanê de, di mesela dîn de jî berpirsiyariya dewleta demokratîk ew e ku xwe bi awayekî wilo ava bike, kar û bar bike ku dîn, mezheb, terîqet an baweriyên hemwelatîyên wê çî dibin bila bibin, çend hindik an zêde dibin bila bibin, çend dîr an nêzîkî hev dibin bila bibin hemû jî bi serbestiyêke temam karibin wacibên dîn, mezheb an terîqetên xwe bi cîh binin bes bi şertê ku yek ji wan nikari-



ALEWÎ • Gerçî Alewî kêfxwêş bûn ku sunnîtiya Hanefî ket bin destê Kemalîzmê lê tucaran hevîyên wan bi cîh nehatin.

Foto: Arif Zêrevan

bin rê li ber vê yekê bigrin, lê divê gava her bi eynî rizamendiyê jinek bi çar mîran re jî bizewice ne dewlet ne jî tu kesên dîn karibe rê li ber vê yekê bigre.

Dewlet divê xwe bi wî awayî bikemilîne ku terefdarên dîn, mezheb an siyaseteke ku gava werin ser hukum wê azadiyan jî holê rakin, -erê; bijîn, îbadetên xwe bikin lê- nikaribin serdestiyê bi zorê li hin kesên dîn bikin û nikaribin bi awayekî welê werin ser hukum ku karibin maf û azadiyan jî holê rakin. Demokrasi ne ew e ku piraniya xelkê deng bidin kê, ew werin ser hukum û programê xwe bi her awayî li gora dilê xwe bimeşînin. Na ev prensîbê piraniyê, şertekî asgarî yê demokrasiyê ye lê ew bi xwe jî bi şertekî ve girêdayî ye ku divê nikaribe maf û azadiyên yeko yeko hemwelatîyan an grûbên civakê kêmbike an ji holê rake, bi vî an wî awayî tecawuzî mafên wan bike.

Ji bo xizmeta hemwelatîyan divê mueseşeyeka dewletê ya kar û barên dînî hebe, lê divê ne wekî Diyaneta îroyîn şeyxulîslamiya mezhebê Hanefî bike. Divê ew bi xwe mueseşeyeke modern a laîk a ne dînî be ku bi riya pisporan û dezge û rê û dirbên hemdem agahdariyên zanistî li ser hemû dîn, mezheb û terîqetan bide, ne çav li riya dîn an mezheban be lê li ya hemwelatîyan be ku gava alîkariyêke dînî jê xwestin bibeze xizmeta wan di warên dînî de. Ew bi xwe îmamî, keşetî, pirtî an hahamî neke, lê gava ji musulmanan re îmam, ji Xiristîyanan re keşe, ji Mûsewîyan re haham û ji Êzîdî û Alewîyan re pîr lazîm bûn, bide xizmeta wan. Heke hemwelatîyekî jî yek ji van dîn an mezheban muhtacî waaz, nesîhet, fetwa an şîretan be, vê wazîfê bide bicîhanî; li gora daxwaza yê hemwelatî ne ku li gora daxwaza dewletê.

Divê li mekteban ne ku dersên Îslamî lê dersên zanyariyên dînî hebin ku bi awayekî zanistî û uslûb û metodên pedagogîk hemû dînen mezin; Îslam, Xiristîyanî, Mûsewîti, Hîndûti û Bûdîzm ûhw. bi berfirehî û dînen dîn jî heta de-

reçeyêke pêdivê ji bo zarokên dibistanê bê dayîn. Êzîdîti, Durzîti, Îsmailî, Alewîti, Bektaşîti û gellek dîn û mezhebên dîn jî tê de hemû mezhebên li welêt û yên li Rojhilata navîn, hemû terîqet û cemaet bi wan bîn hînkirin. Ew zarok û xwendevanên ku diçin mekteban, dê û bavên wan kîjan baweriyê dixwazin, mekteb hay jê hebe, rê li ber veke ku zarok wan baweriyên bi serbestî bijîn bêyî ku kesekî dîn karibe henekê xwe bi wan bike an neheqiyê li wan bike.

Bi kurtî ya ku di mesela dîn de berpirsiyariyan dixê ser milê dewleteke demokratîk û reng dide tîkiliyên wê yên li hemberî dîn û mezheban, ne filan an bêvan dîn an mezheb e, ew prensîbên dewleteka demokratîk bi xwe ne ku jî bingehên maf û azadiyên insanan yên unîversal dertên, heq û huqûqê hemwelatîtiyê, peyman û prensîbên navnetewî û berpirsiyariya dewleteke hemdem a li hember însaniyetê, neslê niha û yê pêş e.


KURTENÛÇE

Nûçeyên Kurdên Moskovayê

Moskova Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskovayê, di sala nû de du semîner amade kirin. Yek ji wan li ser bîranîna 50 saliya Komara Kurdistanê (Mehabad) bû. Di vê semînerê de serokê Navenda Kurdî Profesor Şakîrê Mihî û D. Şerîf bi firehî li ser bûyerên dema serfiraziya komarê û rola nemir Qazî Mihemedî rawestîyan. Amadekarên semînerê cara pêşî hin dokumêntên giranbiha pêşkêşî beşdarên semînerê kirin.

Semînera duwem jî ji bo bîranîna heştaliya tevkuştina (qetlîama) Helepçeyê bû. Berî ku semîner dest pê bike filmek dokumênter ê di heqê tevkuştina Helepçeyê de hat nîşandan.

Roja 21'ê Adarê di bin serpereştiya Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskovayê, rêxistin û partiyan Kurdan ji bo pîrozkirina cejna Newrozê şeveke hevbeş amade kirin. Nêzî hezar kesî beşdarê vê şevê bûn.



Operasyona "Atmaca"

Dewletê wek her sal îsal jî cardin dest bi operasyona biharê kir. Operasyonê di 5'ê Nîsanê de dest pê kir û hîn jî berdeyam e. Li gor agahdariyên dewletê di çend rojên pêşî de 27 esker û nêzî sed gerîlayên PKK'ê hatine kuştin. Cenazeyê eskeran bi merasimê hatin binerdkirin. Lê dewletê tenê 2-3 gerîlayên kuştî nîşanî rojnamevanan dan. Heke agahdariyên dewletê rast bin, tê wê maneyê ku wan hin çekên qedexê bi kar anîne loma jî naxwazin ku cenazeyên kuştîyan nîşanî rojnamevanan bidin. Ku ne weha be diyar e ev operasyon jî wek ên hersal bi ser neketine.

Her weha ji aliyê dîn jî balafir û helikopterên Tirkan her roj êrişan dibin ser deverên li ser hudûdên başurê Kurdistanê. Li gor daxuyaniya Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê ya 15/4 1996'an, Tirkan ji roja 8'ê Nîsanê pê de gundên Baloka, Milxate, Helwa, Spîndarê û Tirwanşê yên li devera Barwarî Bala û gundê Jame li devera Barzan topbaran kirine. Di daxuyaniyê de ev êriş tenê protestokirin û jî hikûmeta Tirkîyeyê tê xwestin ku van êrişan di cî de rawestînin.

Qurban yan berpirsiyar?

Dema qala guhertinên civakî dibin, mirov tê qonaxekê ku mecbûr dibe bersiva hin pirsên ku derdikevin pêşya mirovî bide yan jî, bi kêmasî, wan zelal bike. Gelo têkiliya di navbera mirovî û strukturê de çi ye? Pir teorî yan jî metod hene ku dixwazin li gora xwe vê pirsê zelal bikin. Û gelek teorisyenan li ser vê geşeyê xebat kirine û hîn jî dikin. Partiyên siyasî li gor nêrînan xwe, li ser mirovî û struktura civakê siyasetekê dimeşînin.

Ez ê di vê nivîsarê de bi kurtî wan teoriyên heyî di du modelan da bicivînim û dîtînan wan ên li ser mirovî, têkiliyên mirovî û strukturê û ka ew çi ne û çawa ne rawestim.

Ez ji yekê ji van modelan re dibêjim "modela qurbanîyê".

Nêrîn û baweriya vê teoriyê ev e; şertên jiyane imkanên jiyana me destnîşan dikin û imkanên me yê formdayina jiyane pir kêmin. Ango struktura civakî formekê dide jiyana me, sebebên problemên mirovî bi şertan ve girê dide. Çêbûna problemên mirovî yê sosyal, psikolojîk û aborî ji wan şertan tî ku mirov tê de dijîn. Li gor hin alimên psikolojîyê, problemên şexsî ji struktura psikolojiya mirovî têt; wek di dema zaroktiyê de têkiliyên bi dê û bavî re, xwendin, rewşa malbatî û hw.d. Li gor dîtînan hin kesên ku di sosyolojiyê de ji wan re dibêjin "strukturalîst", problemên sosyal girêdayî struktura civatê ne. Yanî bi sinif û grûba ku şexs jê tî ve girêdidin. Struktur destnîşanker e, ango kapîtalîzm dibe sebebê geşeyên mirovî. Li gor olê jî problemên mirovî li gor qedera mirovî têt pêşya mirovî. Di qedera me de çi hatibe nivîsandin ew dê bêt pêşya me.

Li gor vê nêrîne, mirov nikare şertên jiyana xwe kontrol bike. Bi kurtî, ev tê wê maneyê ku mirov di hinek şertan de dibe qurbanê şertên struktura jiyane. Bi zimanekî din ev determinîzm e, hinek tişt di jiyana me de, bêtî îradeya me, berê hatine destnîşankirin; mirov obje ye.

Bi kurtî, nêrîna wê perspektîvê, di heqê helkirina prblemên mirovan de ev e: gerek mirov struktura ku dibe binasê porobleman hel bike.

Modela duyemîn jî "modela berpirsiyariyê" ye. Li gor vê perspektîvê mirov mexlûqekî azad e û diafirîne; mirov subjê ye. Tiştên ku li der û dora mirovî çêdibin, bi tevayî jî ber şêla mirovî tî. Mirov berpirsiyarê helwesta xwe ye. Alternatîva me ya bijartinê heye di

heqê jiyana me û rewşa ku em tê de ne. Em dikarin biryarên xwe biguhêrin û bijartinên nuh bikin. Mirov azad e û her gav imkanên wî yê bijartinê hene.

Yek ji van modelan an teoriyan bi serê xwe tenê, têtî îzahkirina şêla mirovî nake. Teorî carinan dibe alîkar û tiştan hêsanîtir dike û di heqê realîteya kompleks de perspektîvê dide mirovî. Ev herdu modelên li jor bi serê xwe tenê şêla mirovî bi hêsanî îzah dikin. Heta ev hêsanîti bi xwe ra perspektîva reş û spî tî ne; yanî mirov bi çavekî reş yan spî li tiştan dinêre. Ev jî me ji perspektîva pi-

ralî mehrûm dike; têkiliya navbera yê qurban û yê berpirsiyar. Li gor baweriya min, mirov carinan qurbanê şertan e, û carinan jî berpirsiyarê şêla xwe ye. Û ev herdu alî di jiyana mirovî de dibin dînamîk. Ji ber vê yekê, ihtiyaca me bi teoriyan heye; ji bo ku em karibin tiştan bibînin ew alîkariya me dikin; kengê û çawa em dibin qurban û çawa em dikarin berpirsiyariya xwe bi pêş xin.

Gelo mirov dikare wan teoriyan an perspektîvan bîne ser şêla me Kurdan? Di rewşa ku em tê de ne, gelo berpirsiyarî çiqas ya me ye û çiqas jî ji ber bîndestîya me têt? Gelo sebebên problemên me Kurdan, tenê ji bîndestî û zordariya ku Tirk, Ereb û Ecem li me dikin tî, yan na? Çaxa Kurdek bi Kurdî nizaniye, berpirsiyarî çiqas ya wî/wê ye, û çiqas jî sûtê dijmin e? Çaxa partiyên me û rêxistinên me nekarin rola xwe ya civakî di civata Kurd de bilehîzin gelo sûtê kê ye? Em dikarin pir pirsan ji xwe bikin, lê bersivdayin jî ne pir rahet e.

Li gor bawerî û tecrûbeyên min me Kurdan her gav xwe wek qurbanê jiyana

nê dîtine û hîna jî dibînin. Di analîzên di heqê rewşa me Kurdan de, ku em Kurd wek ronakbîr, wek partî, wek nivîskar û wek insan dikin, bi taybetî em hemî li ser wan şertan disekin ku Kurd tê de ne û problemên ku ji wan şertan tî û pir tiştan jî em girêdayî wan şertan dibînin. Ji ber vê yekê jî Kurd nikarin ji bo helkirina meseleya kurd riyên nuh bibînin. Û nabin xwedî insiyatîv, di prosesa helkirina meseleya Kurd de, çi di çerçeweya dîplomasiyê de be û çi jî di warê siyasî de be... Em Kurd xwe di her warî de belengaz û bêçare dibînin. Û ev nêrîn bi xwe re pasîvbûnê, bêîmkaniyê û qurbanbûnê tîne. Ev jî, helbet tesîrê li civata Kurd dike. Wek şexsî, ronakbîr, an jî wek serok em berpirsiyariya xwe bi cî naynin, em her tiştî yan diêxin hustuyê şertan yan jî yê dijminî. Heta rêxistinên me, ji ber ku nikarin di civata Kurd û di pêvajoya siyasî de roleke mezin bileyîzin, sebebên vê nekarîne yan bi rewşa siyasî yan jî bi dijminî ve girêdin. Rêxistin bi xwe, tu analîzan nakin û para xwe ya di vê serneketinê da nabînin, ango çi sûtê me ye, û çi jî yê dijminî ye. Rêxistin tu perspektîvên nuh naafirînin, her gav bêçare û belengaz in di pêvajoya guhertinên civakî de.

Me her gav xwe qurban dîtiye û ev hîna jî berdewam e. Ev ruh di her tebeqeya civata Kurd de kême-zede heye. Ji dê û bavên me bigire heta serokên me, ev bêçaretî di tarîxa me de, heta îro wek toqekê ketiye hustuyê me. Di vê dewreya zanebûna mirovî de gerek em Kurd jî nesîbê xwe bistînin, berpirsiyariya xwe ya mirovane bibînin û di helkirina problemên xwe yê civakî de bibin xwedî insiyatîv û otorîte. Di nav me Kurdan da guhertinek pêwîst e; em tenê ne qurban in, em di helkirina jiyana xwe ya milî de aktor in jî. Gerek em Kurd mentalîteya xwe ya polîtîk biguhêrin.

Dîwarê Berlîne herifî û sîstema Sovdyetê wenda bû. Sîstema apartheidê ya nijadperest li Afrîqaya Başûr ji meydana hat rakirin û girtiyê apartheidê Mandela bû serokwezîr. Gelek dewletên paşdemayî îro berên xwe didin demokrasîyê. Yekîtiya Ewropayê jî deh dewletan bû panzdeh dewlet û nuha jî dixwazin bibin bîstûpênc-sî dewlet. Li Tirkiyeyê meseleya Kurd eşkere têt mînaqêşkirin û Kurdan di hîlbijartinan da rayên xwe li Kurdistanê dan partiya Kurdan.

Ev guhertinên cihanî û herêmî pewist dikin ku em Kurd jî xwe li gor van şertan îro yê dinyayê nuh bikin, û bi riyên nuh pirsê Kurd di salên 2000-î de çareser bikin.

Ev riyên nuh çi ne û polîtîkayek çawa pêwîst e ji bo ku em karibin geşê xwe hel bikin?

KURTENÛÇE

Başurê Kurdistanê ber bi aşitiyê ve?

Li gor agahdariya ku hem PDK û hem jî YNK'ê belav kiriye, bi hewl-dana Komîteya Alîkariya Niştîmanî ya Kurdistanê ku ji 8 partiyên Kurdistanî pêk hatiye; herdu hêzan ji bo ku rê li ber lihevkirineke giştî vebe, li ser hin xalan li hev kirine. Xalên ku roja 8/4 1996'an li ser hatine lihevkerin ev in:


1. Dê şerê çapemenî û ragihandinê ji seet 3'yê roja 9/4 1996'an dest pê bike bê rawestandî û ev yek dê ji aliyê komîteyek taybetî bête kontrolkirin.

2. Hemî karên ne qanûnî, wek girtin û lêgerînên ku bi sedema siyasî bin, ji seet 3'yê roja 9/4 1996'an pê de bînin rawestandî.

3. Lîsteya hemî girtiyên herdu alîyan dê seet 6'ê roja 11/4 1996'an de teslîmî Komîteya Alîkariyê bibe.

4. Herdu alîyan li ser azadiya belavkirina weşanan li hemî aliyê Kurdistanê li hev kirine.

5. Komîteya Alîkariyê ji bo azadiya hatûçûnê bi rêve biçê bi herdu alîyan re hevkarîyê dike.



PÊŞMERGE • Pêşmergeyê PDK'yê li Lolanê, li gundê Şêx Reşîdî.


Foto: Arif Zêrevan

Emrê girtina wezîrê Îranî

Mehkemeya ku li daweya kuştina sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê Sadiq Şerefkendi û hevelên wî; ku di payiza 1992'yan de li bajarê Berlîne hatibûn kuştin, dinêre emrê girtina wezîrê karûbarê hundur û serokê istixbarata Îranê Elî Felahyan derêxist. Li gor mehkemeyê emrê kuştina rêberên Kurdan ji aliyê vî kesî ve hatiye dayin.

Ecevit: "Bila Sedam bête Kurdistanê."

Li gorî projeya ku serokê DSP'ê Bülent Ecevit amade kiriye, divêt Tirkiye hewl bide ku Hêza Çakûç li Kurdistanê nemîne û başurê Kurdistanê cardin têkeve destê Sedam Husênî. Ecevit dibêje: "Heta Hêza Çakûç neçe û Kurdistan nekeve bin kontrola Sedamî, Tirkiye ji talûkeya avabûna dewleteke Kurdî xelas nabe."



Çima rojnamevanî li Kurdistanê pêş ve naçe?

Divêt em mînaqeseyê li ser rola medyaya kurdan bikin. Lê problema bingehîn rojnamevanê kurd e. Gelo rojnamevanê kurd he ye an no?

Divêt em tesbîtekê bikin. Medyaya kurdan medyayêke partî-polîtîk e. Kovar, rojname û TV-yên ku heyîn bi destgiriya partiyên derdikevin. Medya polîtîze (ne polîtîzebûyî) ye. Xeterên polîtîzetiya medyayê gelek in.

Yek: Kîj partî kengê bixwaze dikare bê asteng weşana rojnameya ku ew derdixê bide rawestandî, dikare şefredaktor û birêvebirên rojnameyê ji karî derbixê û tukes ji nikare li dijî vê rewşê derbikeve. Maneya vê ew e ku rojnamevan nikare nûçeyên ku ne bi dilê partiyê be binivîse, nikare rexneyan li partiyê bigire û ya rasttir nikare rojnamevaniyê bike.

Dido: Ji ber ku partî, rojnameyê wekî organa propagandê û şerî dibîne, ew tenê rê dide tiştê ku di berjewendiyê partiyê (ne ya rastî û xwendevanî) de be.

Sê: Kengê serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan bixwaze dikare MED-TV-yê bigire, ku ew bixwaze dikare hemî wextê weşana MED-TV-yê ji bo beyanên xwe yê siyasî veqetîne û şeş saetan li ser hev destî dane ser MED-TV-yê. Kemal Burkay dikare rojnameyê bide girtin, Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê dikare rojnameyê bide girtin, Celal Talebanî dikare *Kurdistanî Nuê* bigire û Mesûd Barzanî dikare *Xebatê* bigire. Li tu welatên demokratîk desthilatdarek nikare taserufek hewqes serbest di medyaya wî welatî de bike.

Çar: Medyaya partiyên li ser problemên xelkê nanivîse. Heger berjewendiyên xelkê li dijî yê partiyê bin, xeta partiyê têt parastin, ne ya xelkê. Ew tenê berdevkiya partî û serokê partiyên dike. Ew herro behsa beyanên serokên partiyên siyasî, berjewendiyên wan, dijayetiyên wan bi hev re û hwd-yan dikin. Vêca her partiyekê ne ji xwe ve çend rojnamevan hene ku destên wan dikarin qelemê bigirin.

Bi ya min, heta ku li Kurdistanê qedrê gundiyekî bi qasî yê Abdullah Öcalanî neyê girtin, heta ku heqê endamêkî PSK-yê bi qasî yê Kemal Burkayî neyê parastin, heta ku nêrînên xwendekarekî himbe yê Celal Talebanîyî hêja neyên dîtî û heta ku rojnameyê jiyana rojane ya pêşmergeyêkî himbe civîneke siyasî ya Mesûd Barzanîyî giranbiha nebîne, dê rojnamevanî li Kurdistanê bi pêş nekeve û dê medya ji rola xwe ya ragihandinê nelehîze.

Ez du-sê caran bi hinek berpîrsên MED-TV-yê re li ser rojnamevaniyê axivî me. Min ji wan re wiha got: Hun ew

kesên ku di MED-TV-yê de dixebitin û hemî rojnamevanên kurd pesnê kurdan û rêxistinên wan bidin, lê ezê bi hinek hevkarên re programekê çêbikim ku rexneyan li civat, partî, rewşenbîr, serok, nivîskar û hwd-yan bigire. Wan ji min re gotin "divêt rexne li rêxistina azadiyê (özürlük hareketi) û serokê wê neyê girtin".

Qebûlkirina vî şerî tenê dê bibûya mirina min wekî rojnamevan. Ji ber ku kengê min karekî ne bi dilê wan bikirîya dê bi argûmentên ku ew "li dijî rêxistina azadiyê ye" bi meqesê bibirîyan yan jî neweşandan.

Nêrînên min û hevkarên MED-TV-yê di heqê mirovî de jî ji hev cida ne. Min ji wan re got: Ji min re ewil ez mihûm im, paşê welatê min, paşê (heger ku hebe) partiya min û paşê jî belkî serokê partiya min mihûm be. Ji we re ewil Abdullah Öcalan mihûm e, paşê PKK, paşê welatê we û dawîya dawî hun bi xwe mihûm in.

Nêrînên min û wan hevkarên MED-TV-yê di heqê mirovî de jî ji hev cida ne. Min ji wan re got: Ji min re ewil ez mihûm im, paşê welatê min, paşê (heger ku hebe) partiya min û paşê jî belkî serokê partiya min mihûm be. Ji we re ewil Abdullah Öcalan mihûm e, paşê PKK, paşê welatê we û dawîya dawî hun bi xwe mihûm in.

Ji ber çî divêt mirov pîr li ser heq û hiqûqên mirovî wekî ferd raweste? Heger ku bingehê wê civata ku em dixwazin ava bikin ne li ser berjewendiyên mirovê kurd avakirî be dê em tucaran nekarin jiyaneke azad û bextewar bijîn; dê em hertim mirîdê hinek serok û partiyên bin.

Pênc: Xeterêke din ya medyaya polîtîk ew e ku rojnamevan nikare rexneyan li dostên partiyên siyasî jî bigire. Bo nimûne heger ku MED-TV bi hinek reportajan rexneyan li Sûriyeyê bigire dê desthilatdarên Sûriyeyê bi gixika desthilatdarên PKK-yê bigirin. Û encama vê rewşê jî diyar e. Ta niho li gor ku ez dizanim MED-TV-yê tu berpîrsyarê partiyên kurdên Sûriyeyê der-

neexistine û bi wan re hevpeyvînen ku Sûriye pê biêşe nekirine. Heger ku MED-TV ne di bin desthilata partiyekê de bûya dê ew azadtir û rexnegirtir bûya. Hingê tu dewlet û kewan jî nedekarî bi weşaneke rexnegir ya MED-TV-yê hinek partiyên kurd yê siyasî tawanbar bike.

Erê baş e, ev problemên medyayê ne. Vêca çî problemên rojnamevanê kurd hene? Gelo rojnamevanê kurd he ye, heger ku hebe ew rojnamevaniyê yan berdevkiyê dike?

Praniya mirovên ku di medyaya kur-

peyvîni bi wî re dikirin jê bipîrsîyan ka PDK-yê çawa korucutî li Botan bi cih kirîye. Divêt rojnamevanan bigotina ku PDK li bakurê Kurdistanê ne xwedî desthilat e.

Günay Aslanî piştî êrişê PKK-yê hevpeyvînek bi Abdullah Öcalanî re kir. Di destpêka hevpeyvîne de Günay Aslanî wiha digot: "Sayın Başkan, siz atılımdan atılıma koşuyorsunuz, yeni atılımınız ne olacak?" Yanî: "Birêz serok tu ji pêngavekê ber bi pêngaveke nû ve dibezî, ma dê pêngava te ya nû çî be?"

Ev hevok diyar dike ku Günay Aslanî êrişê PKK-yê biheq û pêngaveke nû dibîne. Yan Günay Aslanî rewşa başurê Kurdistanê nîzane, yan jî dizane lê dixwaze propagandaya PKK-yê bike. Ji ber kesek ku hinekê PDK-yê û başurê Kurdistanê nas bike û polîtîkaya Rojavayê jî bizane, dê bikare têbigihî ku PKK bi şer tucaran nikare PDK-yê bişkêne. Şerê navxweyî jî ne pêngaveke serketinê ye.

Herwekî şerê 1992-an ev jî bi binketina PKK-yê xelas bû. Di şerê 1992-an de ji 1500 gerilayan pirtir hatin kuştin. Û di vî şerî de ji 600 gerilayan pirtir hatin kuştin. Bi eskerî diyar bû ku Abdullah Öcalan ne komandarekî jêhatî ye. Gelo Günay Aslanî çima li ser vê dorandina PKK-yê roportajekê çênake? Çima ew ji Abdullah Öcalanî napirse ku ka kî berpîrsê kuştina dor 2 000 gerilayan bû? Heger di şerê de 600 eskerên ordiya tirk bîn kuştin dê roja paştî serokerkan Ismail Karadayî ji wezîfeyê biavêjin.

Bînin bîra xwe, ev ne mirîşk in tén kuştin; ev kurên xelkê ne, yanî mirov in. Çima heta niho tu rojnamevanan hesabê berpîrsê jiyana wan mirovan ji Abdullah Öcalanî ne pîrsîye? Çima heta niho tu rojnamevanan nûçeyek li ser komandariya wî ya şaş nenivîsandine?

Herwiha çima heta niho tu rojnamevanan ji Celal Talebanî û Mesûd Barzanîyî nepîrsîne ji ber çî ew xelkê di şerê navxweyî de didin kuştin?

Heta ku rojnamevanên kurd vê zelaliyê nebînin û li gorî wê pîrsan ji kesên berpîrs nekin dê rojnamevanî li Kurdistanê bi pêş de neçe û dê siyasîvanan jî rojnamevanan ne wekî rojnamevan, lê wekî berdevk û borîzan bihesibîne.

Heta ku rojnamevanên kurd serxwebûna xwe ya meslekî neparêzin, dê desthilatdar jî dest ji desthilata xwe bernedin û dê ew tehemila rexneyan jî nekin. Medyaya polîtîk rojnamevan fetisandî ye; divêt rojnamevan li hember siyasîvanan berxwedanekê bike, xwe biparêze.

Heta ku em vê perdeyê neçirînin tu qîmetê avakirina "Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê" jî nîne.



ARIF ZÊREVAN, rojnamevan

Bi îstatîstîkan 98 salîya rojnamegerîya Kurdî

MAHMUD LEWENDÎ

Rojnameya pêşî "Kurdistan" e, li Qahireyê di 22'ê Nîsana 1898'an de ji alî Mîqdad Mîdhet Bedirxan ve hatiye derxistin. 75 sal piştî derketina vê rojnameyê, di 1973'an de li Kurdistana Iraqê, 22'yê Nisanê wek Roja Rojnamegerîya Kurdî hat qebûlkirin û ji wê rojê de ye her sal ev roj tê pîrozkirin.

Îsal jî 98 salîya rojnameya "Kurdistanê" ye, bi vê wesîleyê em îstatîstîkeke kurt a derheqê kovar û rojnameyên kurdan de radixin ber çavan.

Heta nûha bi qasî ku min tesbît kirîye 1026 kovar, rojname û bultenên Kurdan derketine. Nêzî 700 hebê wan ji alî partî û rêxistinan ve hatine derxistin. 270 heb jî wan tenê bi Kurdî ne (piranî bi Soranî, paşê Kurmancî û Dimilî), yên din bi Tirkî, Erebi, Farişî ne. Hinek jî wan nîvanîv in (Kurdî-Tirkî, Erebi-Kurdî û hw.). Nêzî 35 kovar û rojname jî bi zimanên din derketine, wek Ing., Alm., Swêdî, Yunanî, Rusî, Fîni û hwd.

Ji van kovar û rojnameyan nêzî 600 hebên wan illegal derketine.

Kovara herî stûr (qalind) Kovara Korî Zanyarî Kurd (no:1-2) ye ku di 1974'an de li Kurdistana Iraqê derketiye û ev hejmar 976 rûpel e.

Kovara herî kêmrûpel kovara Belavok e ku li Swêdê derdiket, hejmarek wê 1 rûpel e.

Piraniya kovar û rojnameyên ku ji teref dewletê hatine girtin yê Kurdistana

Tirkiyê ne. Hema hema çî bigre ji % 96'ê wan jî teref dewletê hatine girtin, an jî derheqê wan de mahkeme vebûne.

Piraniya rojnamevanên Kurd li Kurdistana Bakur jî teref dewletê ve hatine kuştin.

Li gor welatan hejmara rojname û kovaran

Iraq û Kurdistana Iraqê.....	378
Tirkiye û Kurdistana Tirkiyê.....	181
Iran û Kurdistana Iranê	74
Suriye û Kurdistana Suriyê.....	83
Lubnan	21
Almanya.....	68
Swêd.....	98
USA.....	16
Canada.....	9
Fransa.....	27
Yunan	9
Sovyet.....	17
Pakistan	7
Finland	4
Danmark	7
Bulgaristan	5
Urdun.....	5
Romanya.....	4
Holland	7
England.....	11
Belçika	5
Norveç.....	7
Misir.....	11
Çekoslovakya.....	5
Awistiryay.....	7
Yên ku ciyê derketina wan nediya e.....	47



MOZAYİK • Kovar û rojnameyên Kurdan bi pirrengiya xwe mozayîkekê pêk tînin.

Ji van kovar û rojnameyan

ji bo zarokan.....	8
yên mîzahî.....	6
yên jinan.....	5
îslamî.....	17
li zindanan.....	7
tiyatro û sînema.....	2
yên xortan.....	8
magazîn.....	1

KURDISTAN.....	22
NEWROZ.....	5
ŞORES.....	7

Çavkanî:


- Ji % 80'yê van kovar û rojnameyan min bi xwe dîtine. Ji bo yên ku min nedîtine jî min ji van çavkaniyên jêrin sîd girtiye:
1. Malmîsanîj û M. Lewendî; Li Kurdistana Bakur û Li Tirkiyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1981), Weşanên Jîna Nû, Stockholm, 1989, 309 r.
 2. Abdulcebbar Muhammed Cebbarî; Mêjûy Rojnamegerî Kurdî, Silêmaniye, 1970, 191 r.
 3. Kemal Mezher Ehmed; "Têgehîştinî Rasti" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Bexdad, 1978
 4. Cemal Xeznedar; Raberî Rojnamegerîy Kurdî, Bexdad, 1973, 192 r.
 5. Mumtaz Heyderî; Mistefa Şewqî w "Peyje", Hewlêr, 1985, 143 r.
 6. Silvio van Rooy & Kees Tamboer; ISK's Kurdish Bibliography Nr. 1, Volume: A, Volume: B, Amsterdam, 1968, 658 r.

Ji bo kovar û rojnameyan, navên ku herî pir hatine bi kar anîn

AZADÎ.....	10
BANG.....	4
ALA.....	16
ÇIYA.....	9
DENG/DENGÊ.../DENGÎ.....	78
DEMOKRAT/DEMOKRASÎ.....	7
GELAWÊJ.....	9
HAWAR/HEWAR.....	9
JÎN/JIYAN.....	22

MAHMUD LEWENDÎ

Rojî Kurdistan 1922-1923 Silêmaniye



Ji salên 1920'î û vir de, li Kurdistana Iraqê, bajarê Silêmaniyê ji alî derxistin û belavkirina rojname û kitêbên kurdî de gelek li pêş bû. Bi taybetî jî piştî ku Îngilîzan Silêmaniye dagîr kirin bi vî dagirkirinê re çapxane jî li Silêmaniyê peyde bû. Û bi wasita wê çapxaneyê gelek rojname û weşanên kurdî derketin.

Cara pêşî di 1.4.1920'î de ji teref Îngilîzan ve bi navê Pêşkewtin rojnameyê hefteyî derket û li ser hev 144 hejmarên wê derketin.(1)

Pişt re di bin rêveberîya Mustafa Paşa Yamulkî de Bangî Kurdistan (2.8.1922) dest bi weşanê kir. Her çendî berpîrsiyarê wê Mistefa Paşa Yamulkî bû lê rojname zimanê resmî yê hukûmeta Şêx Mahmûdê Berzencî bû. Li ser hev 14 hejmarên wê li Kurdistanê, 3 hejmarên wê jî li Bexdadê derketin.

Piştî vî rojnameyê, di 15.11.1922'yan de di bin berpîrsiyarî û rêveberîya M. Nûrî de, dîsa li Silêmaniye, rojname Rojî Kurdistan dest bi weşanê kir.

Rojî Kurdistan rojnameyê hefteyî bû ku hejmara wê ya yekem di 15.11.1922'yan de, ya dawîn (hejmar 16) jî di 3.3.1923'yan de derket.

Di bin navê kilîşeya rojnameyê de bi kurdî ev ibare heye: "Siyasî, edebî, îctîmaî, xezeteyêkî resmî ye, heftê carêk derdeçê"

"Sahibî îmtiyaz û mudîrî mesûl: M. Nûrî

Muherrîr: Elî Kemal

Bo hemû şitêk muracaat be mudîrî me-

sul ekrê"

Rojî Kurdistan li ser hev 16 hejmarên wê derketine. Her hejmarek wê çar rûpel in.

Ebada wê 34x21,5 cm ye (2)

Di rûpela dawî ya hejmara yekem de hatiye nivîsîn ku "Le metbe'ey hukûmeta le Silêmanî teb'i kirawe".

Ev rojname wekî ji naveroka wê jî diyar dibe, rojname resmî ya Hukûmeta Şêx Mahmûdê Berzencî ye. Çimkî tê de ligel nivîs û gotar û helbestên cûr bi cûr her weha gelek îlan û beyanên Hukûme-

ta Şêx Mehmûd jî hene.

Mesela di hejmara 3. de beyaneke "Qûmandarî Eskerî Kurdistan, Sahibqîranzade Salih Zekî" heye.

Di hejmara 7. de bi îmza "Melikî Kurdistan Mehmûd" beyanek heye.

Her di eynî hejmarê de name û telgrafên Îsmail Axa Simko û yên Şêx Mehmûd ku ji hevûdin re şandine hene. Ev name û telgraf hemû bi Tirkî ne. Naveroka wan jî alîkarîyahevkirin e. Lê di bersivêka xwe de Simko ji Şêx Mehmûd re dibêje "Îngiliz Hukûmetinden başka bize hukukumuzu bahş edecek bir kimse yoktur. Ve bize edecegi lutfu karşı hizmet bekliyoruz....." (no: 7)

Zimanê rojnameyê bi Kurdî ye lê hema hema di her hejmarekê de nivîsek an jî helbestek bi Tirkî jî heye ku bi piranî ji alî Refîq Hilmî, E. Necîb, Husên Nazim û Seyid Teha hatine nivîsîn. Her weha çend helbestên bi Farişî jî hene.

Hin nivîsên Rojî Kurdistan ev in:

- Bangî Kurdistan/Rojî Kurdistan (Mudîrî mesul M. Nûrî), no: 1
- Xezetey El-Iraq le nusxey 738 da... (Arif Saib), no: 1
- Dîwanî Mehwi (îlan), (Mudîrî Teb'i Abdulmecid), no: 1
- Reîsî Qabîney Yunan hebs kirawe, no: 2
- Lord Curzon û hellî meseley Şerq, no: 2
- Ey bira... (helbest), (Ahmed Fewzî), no: 2
- (Helbestek) Hemdî, no: 2
- Şairî vatanperver Refîq Hilmî efendî tarîndan gaderîlmîştîr (helbest, bi Tirkî), no: 2
- Îlan (Wekilî Şer' we 'Edl Ahmed Muxtar), no: 2

- Mucadeley heyat, (M. Nûrî), no: 5
- Siyasetî emro, (Arif Saib), no: 5
- Wîlayetî Mûsil le Lozan da, (M. Nûrî), no: 6
- Yekbûn/İttîhad (Arif Saib), no: 6
- Teşrîf; Melikî Kurdistan Mehmûd, no: 7
- Telgrafeka Simko, no: 7
- Bersiva Şêx Mehmûd, no: 7
- Kurdistan malî Kurdan e, (M. Nûrî, Elî Kemal), no: 9
- Qewmî necîb Kurd (Abdulqadir), no: 11
- Terbiye we tedrîsî mindalan (M. Qadirî Saîd Qazî), no: 11
- İxtîlaf û Balqan, no: 11
- Makîney metbe'e, (Muellîm Zîwer), no: 12
- İhtiyacman be çî ye? (M. Qadirî Saîd Zekî), no: 13

Piştî ku Îngilîzan careke din Silêmaniye dagîr kirin, bi vî dagirkirinê re rojname Rojî Kurdistan jî rawestiya, Şêx Mahmûdê Berzencî xwe vekîşandin serê çiya û girên derdorên Silêmaniye û li wir li Şikefta Cesene dest bi derxistina rojname Bangî Heq kirin. Piştî ku Şêx Mahmûd dîsa vegerya Silêmaniye, îcar di 1923'yan de bi navê Umêdî İstîqlal rojnameyê hefteyî derxistin û rojname li çapxaneyê hukûmeta Şêx Mehmûd dihat çapkirin. Ev rojname jî tenê 25 hejmarên wê derdikevin.

Çavkanî:

1. K. M. Ehmed, "Têgehîştinî Rasti" û Şwênî le Rojnamenûsî Kurdî de, Bexdad, 1978, r.218
2. Rojî Kurdistan, kokirdinewe wê pîşî: C. Xeznedar, Bexdad, 1973, r.11

"Bila sala 1998'an bibe sala rojnamegeriya Kurdî"

ARMANC - STENBOL

Bi munasebeta salvegera roja rojnamegeriya Kurdî, di 22'ê Nîsanê de li NÇM (Navenda Çanda Mezopotamya) panelêk pêk hat. Li ser navê Navendê rojnamevan Nijad Yarûk panel rêvebir. Di vê panelê de; li ser navê rojnameya Armancê Yakûp Karademîr, li ser navê rojnameya Azadiya Welat Mehmet Gemsîz, li ser navê kovara Nûbiharê Suleyman Çevîk û li ser navê rojnameya Demokrasiyê Hayrettîn Çelîk beşdar bûn. Ji aliyê din ve, tevî ku xwediyê Weşanxaneyê Dozê Av. Ahmet Zekî Okçuoglu û ji rojnameya Ronahiye Latîf Epozdemîr jî hatibûn vexwendin, beşdarî panelê nebûn.

Panelîst di sê tûran de; li ser dîroka rojnamegeriya Kurdî, li ser gir û griftên rojnamegeriya Kurdî yê îroyîn rawestiyên û ji bo pêşerojê pêşniyarên xwe pêşkêş kirin.

Panelê bi axaftina Suleyman Çevîk destpêkir. Çevîk di axaftina xwe de bi kurtî wiha got: "Ji ber ku îmkana xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî jî mêt de tunebûye, di nav Kurdan de edebiyata zargotînî ango ya devkî jî ya nivîskî pirtir pêşveçûye. Ji ber vê jî gelek berhemên edebî, çandî û hwd nehatine parastin û wendabûne. Her weha Kurdan nikaribûne dîroka xwe jî binivîsin û dîroka wan jî alî biyaniyan ve an jî ji alî dijminên wan ve ne sererast û bi tahrîfat hatiye nivîsin..."

Di pey Çevîk re, Yakup Karademîr axîfî û weha got: "Wek di warê çand û dîroka Kurdî de, di warê dîroka rojnamegeriya Kurdî de jî kêma lêkolîn çêbûne. Lêkolînên heyî jî li her beşekî Kurdistanê bi alfabekekê çêbûne û hemû Kurd nikarin jê sûdwergirin. Giriftên rojnamegeriya Kurdî pir in, lê problema mezin ew e ku berê û îro jî tu rojnameyek Kurdî li seranserê Kurdistanê nehatiye belavkirin û ji aliyê hemû Kurdan ve jî ber gelek sedeman nehatiye xwendin. Sedemên vê yekê berê rewşa civakî ya Kurdan, ya coğrafya welatê wan û tunebûna îmkânên teknîkî bûn. Îro bi îmkânên xwe yê teknîkî em karin astenga coğrafîk jî holê rakin. LÊ jî ber partîzaniya teng em dîsa civaka xwe perçe dikin û weşanên me tenê ji aliyê alîgirin me ve tên xwendin. Rojnamegerî divê ji tesîra organîzasyonên siyasî hinekî dûr be, xwedî muxtariyet be. Em gelekî behsa demokrasiyê dikin, lê em jî bîr dikin ku di demokrasiyê de çar erkên girîng hene ku rojnamegerî jî yek ji wan e. Çawa tesîra politîka yê li ser rojnamegeriyê heye, divê ya rojnamegeriyê jî li ser politîkayê hebe. Bi vî awayî rojnameyên me dikarin bibin Kurdistanî, berevajiyê wê wek îro wê bibin organên organîzasyonên siyasî. Dema ku rojnameyên me bibin Kurdistanî û jî alî hemû Kurdan ve bîn xwendin, wê

çaxê dê zimanekî nivîskî yekgirtî û şû-ûrek neteweyî li seranserê welêt pêk bê..." Karademîr, di gel hin pêşniyarên din pêşniyara ku "1998, bibe sala rojnamegeriya Kurdî" kir û ev pêşniyar jî alî hemû panelîstan ve hat pesinandin.

Paşê Mehmet Gemsîz axîfî û bi kurtayî weha got: "Malbata Bedirxaniyan hem hîmê rojnamegeriya Kurdî ya bi tîpen Erebi û hem jî ya bi tîpên Latîni danîne... Rojname û weşanên Kurdan xurû bi zimanê Kurdî derneketine û di gel

zimanê xwe, cîh dane zimanên din jî... Îro jî ev kevneşop didome û rojnameyên Kurdan, wekî "Ronahî" di gel zimanê Tirkî, cîh didine zimanê Kurdî jî..."

Dawiyê Hayrettîn Çelîk peyivî û wiha got: "Ez di rojnameyê Kurdan de, xebata çapemeniyê dikim, lê ne bi zimanê xwe, bi Tirkî... Çapemeniyê li Kurdistanê dereng destpêkiriye û tevgera Kemalîstan, bi her awayî dibe destpêka qirkirina çand, huner û ziman..."



PANEL • Li Stenbolê panelêk li ser rojnamegeriya Kurdî hat çekirin.



DANER • Miqdad Mîthed Bedirxan danerê "Kurdistanê", rojnameya pêşiyê ya Kurdan e.

1966 ساله عوليه

1573

دۆپه

بە کاندێک فی ریک

رێبکت مەصری سەر

خۆبێنی جێبەبێ

لاو بدرخان پاشا

مال مەدحت بێکی

مار دۆهزر جێبەبێ

بره آزیه ریک

سانی ده بدن حاکی

روژا جارکی نیت

شێبانان

کوردستان

1310

کوردی ایتاد و تحصیل صنایه تشویق اجون شمبلاک

اردن بش گویده بر نسر اولور کردجه غزته در

کوردستان خارجه سه ۲

ایمون سهات اوه بدم

۸ غروشر

کر سال داغاه - صومر

1. نهامره عانا کورد بولور

روژا بیجینی ده ۳۰ ذواقده سه ۱۳۱۰ بیجینه فی ۹ نسان سه ۱۳۱۱

بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شکر و حمد ز غیری نمانده ام مسلمان
 بگردن و طاعتنا علم و معرفتیره عش و زکادامه درحقا
 دنیا علم و معرفتیره گنگ آیین جلیله واحادیث شریفه
 دنیا بیده بچاق مسلمان همین گووند و باز برین
 مکتب و مدرسه و جریده هفت دنیا بیده چه دبه
 ایه جریده دینیت حقیقت نیت ز کرداره کرد
 ن قوما زیده تر خویی هت و زکاه جامیرن دین
 راست و قویه خورتن و دیسا و که قومین دی
 و نه درودن دنیا بیده چه دبه جیران وان موسوق
 به وی چه بکه ظلمت نوما و با خدیجه من اف
 بی نیسی مژده خدی تعش شو هر روز

لکودری مروف دنگله لکودری مدرسه و مکتب قنج هت
 ازین نیشا کردا بکم لکودری چه شر دبه دولین مظن چ
 دکن چاره شر دکن تجارت چاره دبه ازین حیا حکمت
 بکم حتی هو کسی جریده کی هولی نیشی به اف جریده
 مناها یا عولیه لوما وی گنگ کبابی هیتن از هیتی درا
 کبابیا جریده بی زمیره بنشین حمی نشت و کی نو چه دبه
 کین پاشی هکی دجه دکوه ریده آفه ایدی ازین دست
 مقصدی بکم (ومن الله التوفیق)

حضرت بیغمه علیه الصلوة والسلام گوئی به ه العلم
 ورثة الایمه ااکر عانا وارثین انبیا نه طرف خدی
 مامورن وعظ و نصیحتی بدن خاکی ریا قنج نیشا وا
 مکن نوما کئی عیبین کردا چاره اون و نطق و نصیحه
 غیری ددن ون غیری اون هبر وانما و کرمناجین دانسه

YEKEM • Hejmara yekem ya rojnameya "Kurdistanê"

Konferansa zimanî

M. ŞERÎF MUŞTAK – HAMBURG

Komeleya Mamosteyên Kurdîstana li Zaxsena Jêrîn (KOM-MAK) di 23'ê Sibatê de li bajarê Osnabrückê li Almanyayê konferansa li ser zimanê Kurdî li dar xist. Konferansê 3 rojan ajot. Mamosteyên zimanê Kurdî yên ku li Almanayê dersên zimanê Kurdî didin beşdarê konferansê bûn.

Mûrad Ciwan, Dr. Celilê Celil û Zerdest Haco beşdarê konferansê bûn û li ser ziman û wejêya Kurdî dîtînen xwe pêşkêş kirin. Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê Malmîsanîj ji ber kar û barê xwe yê Swêdê beşdarê konferansê nebû.

Kesên axêver bi taybetî li ser nivîsandina zimanê Kurdî, xwendina zimanê Kurdî û gramatika Kurdî rawestiyên û dîtînen xwe anin zimên û guhdarê konferansê jî beşdarê munaqeseyan bûn.

Dr. Celilê Celil li ser edebiyata

Kurdî rawestiya û xebatên ku di vî warî de kiriyê pêşkêşî konferansê kir. Û di axaftina xwe de got ku "Pêwîst e di alfabeza Kurdî de reform bê çêkirin".

Mûrad Ciwan li ser gramatik û rastnivîsandina zimanê Kurdî sekîni. Çêkirina gotinan, tawandina navan, avakirina hevokan ji aliyê wî ve bi ilmî hat pêşkêşî kirin. Mûrad Ciwan got ku; "Alfabeza Kurdî ne hewceyê reformeke esasî ye, danerê alfabezê Mir Celadet Bedirxan wexta alfabeza xwe daniyê bi awayekî gellek berfireh, pîralî û zanistî xebitiye, acilîyeteke welê nîne ku meriv alfabeza wî biguhere".

Zerdest Haco jî di axaftina xwe de li ser tipên bêdeng û bideng sekîni, ji bo navên mêr û nêr îzahat anîn.

Herweha gelek kesên guhdar jî di konferansê de dîtînen xwe anîn zimên û pesnê konferansê dan û sipasê KOM-MAK'ê kirin ku wê ev konferans amedekiriyê.

Mejiyê me û çîroka Platonî

B. WELATEVÎN

Ez carna difikirim û ji xwe dipirsim: Gelo tenê dagirker dijminê me ne? Gelo tenê zilm û qeweta dijmin pêşî li serketina berxwedanê bi rûmet girtine û nehiştine Kurd mafên xwe bidestxin?

Ma li Kurdistana Başûr dijmin nahêle Kurd li ser axa xwe ya azad îdara xwe bi xwe bikin û hîmê dewletê jî xwe re deynin?

Na! Ez ne di wê baweriyê de me. Astenga herî girîng paşdemayîna zîrekên me Kurdan e. Problema me tenê ne dijmin e. Bê gumana her tim dijmin xwestiyê pêşî li damezirandina sazûman û dewleta Kurd bigre. Ev rastiyeke e. Lê ev tenê bi serê xwe parçayek ji rastiyeke ye. Û rastî tîrş û tahl be jî divê em Kurd vekirî bînin holê da ku em bikaribin birînen xwe bi destên xwe derman bikin.

Mejiyê me di vî warî de bûye beleya serê me. Bûye zincîrek ji hesin û li stuyê welatê me hatiye girêdan. Me bi destê xwe azadiya xwe xistiye binê lîngan.

Îro mejiyê me li Kurdistana Başûr pêşî li sazûmanên dewletbûyîna girtiye. Em Kurd kilîdê li deriyê parlamana xwe dixin. Bi destê xwe dezgehên xwe belav dikin. Bi karê birakujîyê em hoyên yekbûyîna dizivîrin belavbûnê. Ji ber çî? Bi felsefî û teorîk bersivên van tiştan hêsan in. Feodalîzm, axa, eşîr, paşdemayî û hwd. Lê ev gotin bi serê xwe bersiva vê pîrse-girêkê nadin.

Ku hîs û dîtînen demokrasîyê di nav rêxistin, partî, tebeqe, çîn û jiyana însan de bi kar neyên û ev nebe kultureke giştî dawîya me dîsa bihevketin, xwekuştin û belavelabûn e. Ku em Kurd li ser çiyayekî, li taxekê, li gundekî, li bajarekî Kurdistanê an jî li derveyî welêt bi hemû cudayîyên xwe di rêxistinê an di rêxistinên de fêrî karkirina bi hev re nebin û tahamula hev nekin avakirina jiyaneke nû û riz-

garkirina Kurdistanê xeyal e.

Ji bo vê rewşê çîrokek Platon heye. Platon di nivîseke xwe de li ser rastî û xûpakîyê diskine û li ser nezanîna bi hev re jiyandina (damezirandina dewletê) însanan radiweste.

"[...] Ji bo afirandina jîndaran, Xwedanê nemir di bin erdê de hazirî dikirin. Beriya ronahiyê şikil didin hevîrê jîndaran. Ji agir, ax û tiştên din hevîrê wan ecilandin. Ew Prometheus û birayê wî Epimetheus dikin berpirsiyarên jîndaran. Divê wexta ku jîndar bigihîjin ronahiyê ew li gorî pêwîstiyên wan qewet û jîrekîyê li wan belav bikin.

Ji bo belavkirina xûpaki û zîrekiyan li jîndaran Epimetheus dikin berpirsiyar. Piştî demeke dirêj Prometheus tê sere-dana birayê xwe ku wî pîroz bike. Dibînin ku birayê wî însan jîbîr kirine. Wexta dibîne însan tazî û perîşan in, xemgîn dibe. Ji bo ku kêmasiya birayê xwe ji holê rake dest bi xebatê dike. Gava yekem; ew û Hephaisto ji Athenê bi huner û zîrekî agir didizin û tînin bexşî însanan dikin. Bi vî zîrekîyê însan dibin xwediyê zanyariyê. Lê çî mixabin ku ew hê fêrî jiyaneke bihev re nebin. Ji ber ku hê nizanibûn di bin sîwana dewletê de bi hev re bijîn ji hev dûr diketin. Ji bo ku xwe biparêzin gava pêşîn bi hev re dest bi avakirina bajaran dikin. Ji bo avakirina bajaran tînen cem hev, hêzên xwe dikin yek. Piştî avakirina bajaran vî carê jî nikarin xwe bi xwe îdare bikin. Ji ber vî yekê jî dikevin pêşî- rên hev û belav dibin. Û bi vî belavbûnê ew dibin xwarinên heywanên dirinde [...]"

Mejiyê me bûye beleya serê me, bûye zincîrek ji hesin û li stoyê welatê me hatiye girêdan. Me bi destê xwe azadiya xwe xistiye binê lîngan. Mejiyê me li Kurdistana Başûr pêşî li sazûmanên dewletbûyîna girtiye.

Gelo wexta Prometheus zanyarî bexşê mirovan kir ji me Kurdan re hîç parçeyek ji neket? Ku neketibe jî serok, pîspor, zanyar, pêşeng û sosyalîstên me gelo nikarin piçekî ji serketinê gelên serbixwe van zanyariyan fêr bibin? Ez bawer im em ê jî rojekê fêr bibin. Gelê Kurd bi fêrbûn û pêşketina xwe dê bi xwe re me jî xelas bike.



KONFERANS • Li Almanyayê konferansê li ser zimanê Kurdî hat çêkirin.

Serê Tansuyê xwarin lê hemû wek wê ne

Ji ber ku serokwezîra kevin a Tirkiyeyê û seroka Partiya Riya Rast Tansu Çillerê hîsseyên dewletê di dema şexsikirina (prîvatîzetkirina) TOPAŞ'ê de sîstîmal kirine û dewlet xistiye zerarê di heqê wê de lêgerîna meclîsê hat vekirin. Pêşniyara ku divê di heqê Tansu Çillerê de dawa vebe ji aliyê Partiya Refahê ve hat Meclîsa Mezin a Tirkiyeyê. Xeynî DYP'a Çillerê hemû partiyên ku di meclîsê de ne; ANAP, RP, DSP, CHP û BBP'ê li gel vî pêşniyarê deng dan û ev pêşniyar bi 376 dangan hat qebûlkirin, 141 deng jî li dij vî pêşniyarê derketin.

Tê ragihandin ku dê Tansu Çiller di Dîwana Bilind de bête mahkemekirin û êdî ew dê nikaribe bi be serokwezîr.

Berî çend mehan jî wexta Tansu Çiller serokwezîrtiya xwe teslîmî

serokê ANAP'ê Mesûd Yilmazî kir tê gotin ku ji butçeya veşartî 500 milyar lîrayê Tirkî xistiye zîmmeta xwe û ji bo menfaeta xwe ya şexsî bi kar aniyê.

Piştî 12'ê Îlonê û bi taybetî jî di dema Ozalî de duzanek wîlo li Tirkiyeyê peyda bûye ku bi hezaran hetta milyonan kes bi bertîl û bi riyên gayrîmeşrû dewlemend bûn. Dewlemend hin dewlemendîr û feqîr jî hîn feqîrtir bûn. Kesên ku bi keda xwe debara xwe kirin bi çavekî "ehmeqî" li wan têt mêzêkirin.

Hukûmetên ku piştî 12'ê Îlonê hatin avakirin, serokên partiyên wan, wezîrên wan û endamên partiyên wan pîranî rûşwet û bertîl xwarine, bi rêyên gayrî-meşrû dewlemend bûne.

Di eslê xwe de duzana Tirkiyeyê genî bûye, rejîm xitimiye, rûşwet û



TANSU ÇILLER • Serê xatûn Çillerê dê bêt xwarin?

bertîl li dar in, yek ji yê din xerabtir e. Hemû wek Tansuyê pey menfaetên xwe yê şexsî ne. Divê avzêl bê zûhakirin. Yan yê mêşek here yeka din bê.

Heger hun bixwazin diranên xwe bi zimanê Kurdî derman bikin, werin nik Sabahat Karadumanê

TANDAKUTEN GÄRDET
Sabahat Karaduman
Leg. tandläkare

Adres

Erikdahlbergsgatan 16
115 32 Stockholm

Tunnelbana: Karlaplan

Tel: 08-661 62 34

PYSK ava bû

Daxuyaniya PYSK di derbarê yekîtiya hêzên neteweyî de weha dibêje: "Kongreya me ya yekîti û damezrandinê, ji bo serkeftina şoreşa me ya neteweyî û demokratîk, bereya neteweyî û demokratîk ku hemû hêzên welatparêz tê de ciyê xwe bigrin, pêwîst dibîne û gavên ku heta îro di vî warî de hatine avêtin wek destkeftinekê dibîne û piştgiyariya hemû gavên samîmî ku di vî warî de bîne avêtin dike û karê ku dê bikeve ser milê PYSK dê bi awayekî biryardarî bîne bicîanîn.

Kongreya me li hember şerê birakujî û şerên di navbera hêzên neteweyî û demokratîk de helwestê werdigre û vî yekê tawanek welê dibîne ku zerarê dide yekîtiya gelê me û têkoşîna me."

Daxuyaniya di derbarê partiyeke legal a Kurdî de jî weha dibêje: "Kongreya me dezgehên neteweyî yên Kurdî wek unsurên welê dibîne ku hebûna me ya neteweyî bi hêz dikin û giranbuhayiyekê didin dezgehên ku di warê kulturî, dîrokî, civakî û siyasî de ava bûne û dê ava bibin. Loma jî wek di gelek warên jiyandê de di

warê xebata siyasî ya legal de jî pêwîstî bi partiyeke Kurdî ya legal heye. Partiya me di wê baweriyê de ye ku partiyeke ku di warê neteweyî û demokratîk de nasnameya Kurdî bi aşkerayî biparêze pêwîst e û dê piştgiyariya gavên di vî warî de bîne avêtin bike."

Di daxuyaniyê de li ser avakirina konseyeke neteweyî ya Kurdistanê weha têtê gotin: "Kongreya me, hêzên neteweyî yên her çar perçeyan wek hêzên neteweyekê û welatekî dibîne. Bi hemû hêzên neteweyî û demokratîk ê her çar perçeyan re siyaseta hevkarîyê diparêze. Loma jî vatiniya avakirina Konseye Neteweyî ya Kurdistanê ku hêzên welatparêz ên her çar perçeyan û Kurdên li derveyê welêt tê de ciyê xwe bigrin, vatiniyêke di rojevê de dibîne. Kongreya me di wê baweriyê de ye ku organek weha divê ji ez merkez im dût be, pîralî û îradeya hemû perçeyan temsîl bike û bi awayekî demokratîk, bi pêşengiya hêzên siyasî yên herî fireh ava bibe, divê zemînek amade bibe. Partiya me, ji bo avakirina organekê weha çî bikeve ser milê wê dê bike."

Di 1'ê Gulanê de xwîn...

Bi munasebeta 1'ê Gulanê Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê (PYSK) beyanêke bi zimanê Kurdî derxist. Di beyanê de li ser rewşa dawî a Kurdistanê tê rawestandin û weha têtê gotin: "Ji bo ku em di pîrozkirina roja yekîtiyê, hevkarî û têkoşinê di 1ê Gulanê de bi ser kevin, li dijî şerê hov ku dijminên kolonyalîst ji çar alî ve li ser gelê me ferz dike, partiya me di wê baweriyê de ye ku divê li her çar perçeyan jî yekîtiyên neteweyî pêk bîne. Di rîya avakirina Komara Demokratîk ya Kurdistanê Serbixwe de, ev wezîfe û berpirsiyariyêke dîrokî ye. Ji bo ku em 1ê Gulanê nû bi gavavêtinên nû û saleke yekîtiyê bixemilînin û têkoşîna gelê xwe geştir bikin, divê em destên xwe bidin hev."

Stenbol

Li Stenbolê li du ciyan 4 Konfederasyonên Sendikayên Karkiran; DİSK'ê, TURK-İŞ'ê, HAK-İŞ'ê û KESK'ê îsal bi hev re 1'ê Gulanê organîze kirin. Pîrozkirina li meydana Taksîmê sakin derbas

bû lê di pîrozkirina meydana Kadikoyê de bûyeran rûdan. Berê ku meşvan bîne meydana meşê polis xwest ku wan saxî bike, li ser vî meşvan li dijî polîsan derketin û di navbera wan û polîsan de şer derket. Polîsan li hemberî meşvanan gulle bi kar anîn û 3 kes; Dursun Odabaş (20) û Hasan Albayrak (18) li herêma Sogutluçeşme û Levent Yalçın ji li herêma Kadikoyê ya Stenbolê hatin kuştin. Bi sedan kes birîndar bûn û bi sedan kes jî hatin girtin. Li ser van kuştinan, grûbên çep ên Tirkîyê wek MLKP, TIKKO, DHKC, TKP-ML, EKİM û yên din li meydana mitînga Kadikoyê seri hildan, çend taxên Stenbolê bi çend seetan be jî xistin bin kontrola xwe, bi dehan seyare şewitandin, bi sedan dikanên resmî û neresmî dan ber kevir û daran, rê li ber serok û berpirsiyarên sendikayan jî girtin ku nehiştin di mitîngê de biaxivin.

Li ser van bûyeran hukûmet civiya û biryar stend ku dê di qanûnan de hin guhertinan çêkin û kesên ku di bûyerên weha de cî bigrin dê derheqê wan de tahqîqat bê vekirin û cezayên giran bê dayin.

1'ê Gulanê û grûbên çep

FARIS CAN

Kuştin, cinayetên qesasnediyar, înfaz, zulm, enflasyon, bertil, bîedale-tî, birçîtî, tazîtî, perîşanî û çiqas sîfatên nehinî tîne bîra we îro bûne parçayekî jiyana gelê Tirk û Kurd. Piraniya civakê û tebeqe û çînen cuda yên wê, di bin neheqî û nehuqûqiya dewletê de dijîn. Hukûmet û dewletê çav û guhên xwe ji hawara karkiran re girtine, memûr bê sendîka hiştine, Kurd jî mafên wan ên demokratîk û neteweyî bêpar kirine; gund û qezeyên wan wêran kirine, insanên Kurd jî gundên wan bi darê zorê derxistine, bi cop û tankan diçin ser daxwazên xwendevanên universîteyan. Polîs, tîmên taybetî, leşker, komando li ber çavên civatê reş bûne, civat wan wek dijminê xwe yê herî dijwa dibîne.

Di filiyatê de hukûmet wek şûbeya erkanî herb dişuxule, siyaseta generalan li ser meclîsê ye jî. Siyaseta hukûmetê û aboriya Tirkîyê endeksê pîrsa Kurdî û şerê wê yê li Kurdistanê bûye. Dewlet bi her hawê xwe bûye eşqiya.

Di civateke weha de yên ku îro herî aktîf li hember neheqiyê derdikevin ciwan û xwendevan in. Ew li hember neheqiyê li herî pêş in. Di 1'ê Gulanê de jî yên ku li Stenbolê herêma Kadikoyê û Sogutluçeşme bi metodên xwe serîhildan ew xortên ku di bin baskê rêxistinên çep yên îllegal de bûn.

Ji ber sedemên civakî û aborî psikolojiya civata Kurd û Tirk gihîştibû wê derecê ku ew bi çirûskê piçûk jî êdî karibûn biteqin. Di pîrozkirina 1'ê Gulanê de bi bahaneya ku polis xwestibû ku meşvan berî ku bikevin meydana mitîngê wan saxî bikin, ev çirûsk teqiya.

Grûbên marjînal ên çep ên îllegal hatin provakasyona polîsan. Wek 'mayînen serserî' bê plan bê armanc nizanibûn çî dikin; wek ku di şerê navxweyî de bi ser ketibûn û taxên ku bi çend seetan be jî ketibûn bin kontrola wan, tar û mar kiribûn. Daîreyên resmî ne resmî; îstasyon, banka, şirketên xususî, dikan, buro dan ber kevir û daran. Ew kî û nefretên xwe yên li hember dewletê jî dikan û daîreyên dewletê girtibûn. Bi sedan dikan û bi dehan arabe xesar dîtin. Heta weha kirin ku xwedêgiravî ew çûbûn cejna karkiran ku piştgiyariya xwe ji wan re nişan bidin lê nehiştin ku berpirsiyar û serokên sendikayên karkiran di cejna xwe de biaxivin jî. Ku karkiran jî bi zimanê wan bersiva

wan bidaya dê netice çawa bûna? Lê karkiran bi aqlî-selîm hereket kirin û li hember wan bê deng man.

Ev cara pêşîn bû ku 4 sendikayên karkiran; DISK, TURK-İŞ, HAK-İŞ û KESK'ê bi hev re 1'ê Gulanê organîze kiribûn. Wan 4 konfederasyonên karkiran hemû karkirên Tirkîyê di bin şemsiya xwe de civandibûn û hêza wan li hember dewletê bûbû aksiyon. Lê grûbên çep ên îllegal bi reaksiyona xwe

ya li dijî dewletê ev aksiyona karkiran jî herimandin. Lê di neticeyê de hukûmet û dewlet jî vî tevliheviya 1'ê Gulanê fêde girt; him bi provakasyona xwe 'rûyê' grûbên çep ji raya giştî re eşkere kir û him jî nehişt ev aksiyona karkiran bigihîje armanca xwe. Ji xwe Mudurê Emniyeta Stenbolê neçotibû ku; "me hişt millet rûyê van grûban bibîne".

Van grûban bi kirinên xwe, xwe tamin û navên xwe ji raya giştî re eşkere kiribûn lê di raya giştî de tesîreke negatîf hiştibûn. Bi tevgerên xwe îspat kiribûn ku tîkiliya wan bi çîna karkir re tune. Wan bi kirinên xwe îmajêke wilo dan raya giştî ku ew li dijî her tiştî ne; li hember mulkiyetê û kedê ne, li hember karkiran û berjewendiyên karkiran in jî.

Ev grûbên çep bi kirinên xwe yê 1'ê Gulanê bûn sebeb ku provakasyona polîsan li ber çavê raya giştî wenda bin, 3 kesên ku bi gulleyên polîsan hatibûn kuştin li ber bayê herin.

Heyf ku hinek partiyên Kurdan jî di nav vî toz û dumana ku grûbên marjînal yên çep ku tîkiliyên wan bi gel û çîna karkir re tune çûn. Wan jî ciyên xwe li ber wan grûbên marjînal yên çepê Tirkîyê girtin û îmajêke nebaş dan raya giştî.

Ev piştî 19 salan bû ku di 1'ê Gulanê de li Stenbolê dîsa xwîn diherikî. Çawa ku di sala 1977'an de di 1'ê Gulanê de 34 kes hatin kuştin û qatîlên wan hîn eşkere nebûne dê qatîlên wan 3 xortan jî eşkere nebin û dewlet dê bincil bike.

Dewlet dê zerar û ziyana xwe ji bacên dê û bavên wan xortan bigire ku taxên Stenbolê dan ber kevir û daran û jî wan karkiran bigire ku nehiştin di 1'ê Gulanê de daxwaz û mesajên xwe ji hukûmetê re eşkere û bi rîyeke demokratîk bibêjin.

Bûyerên 1'ê Gulanê jî diyar kirin ku îro dewleta Tirk bûye îllegal. Divê dewlet xwe ji îllegaliteyê derxe û bi resmî rê bide wan rêxistinên Kurd û Tirkên ku êdî legal in, lê li gor qanûnan îllegal in.



1'ê GULANÊ • Di 1'ê Gulanê de li Stenbolê xwîn herikî, polîsan cardin li xelkê reşandin.

amadekar: **HESEN MIZGÎN**

ZANISTE & TEKNÎK

Kilîta metela jiyane

Reçeteya hemû tiştên bi can

Kutleya mîrasê ya însên DNA, ji zêdeyî 50 000 genî pêk tê. Gen agahdariyên bingehîn ên li ser fonksiyonên laşî, nexweşî û qabiliyetên îrsî didin.

Tehlîla xwîne qala

goştepareyê (cenîn) dike

Dê û bavên ku bi nexweşiyên îrsî ne dikarin bend li hember zarokên bi nexweşîyên pir ciddî bigrin.

Bi alîkariya teknîka genan îro doktor dikarin gelek tiştan li ser zaroka nebûyî bibêjin. Tenê bi tehlîla ava goştepareyan jî bi tehlîleke basît a xwîne doktor dikarin behsa nexweşiyên goştepareyan jî rîska nexweşiyên pêşerojê bikin.

Ev îmkânên nû, bûn sebaba gelek munaqeseyan. Hin di wê tîrsê de ne ku teknîka genan dê civatek wisa biafirîne ku xeletiya herî piçûk a di warê goştepareyê de, bibe sebaba zarokjiberbirinê (kurta-jê). Eger doktor dest bi bikaranîna lêhûrnêrîna tehlîla xwîne bike ev rîsk dê zêdetir be. Hêj di hefteya çaran an pêncan a bihemlebûnê (bizarokbûnê) de agahdariyên lêhûrnêrîne dikarin bête bikaranîne, ku jina bizarok dikare di demek kurt de biryara xwe ji bo zarokjiberbirinê (kurta-jê) bide.

Jin keçan naxwazin

Kesên din, vê teknîka nû ji xwe re îmkane baş dibînin, ji ber ku ew dikarin di wextê xwe de bend li ber zaroka/ê bi nexweşiya îrsî ya pir ciddî bigrin, ku doktor jî nikarin tu tiştî pê bikin.

Piraniya lêhûrnêrîna tehlîla goştepareyê tenekirin ji ber sebaba nexweşiyên îrsî yê malbatê ne yan jî ji ber ku jina bizarok gihaştîye temenekî (umr) weha ku rîska anîna zarokêkî nenormal mezin e.

Heya nuha jî li gor hûrlênêrîna goştepareyê tiştê ku doktor li ser zarok/a nezayî bibêjin pir bi sînora in. Yek ji wan tiştên ku doktor bi rehetî dikarin bibêjin, cinsiyeta zarok e. Li welatên wek Çîn û Hindîstanê bûye sebeb ku jin dema pê dizanin ku zarok keç e, serî li zarokjiberbirinê didin. Li welatên weha qedra lawan ji ya keçan zêdetir e.

Şaştîya di hejmarên kromozonan de; wek sendroma Downê (mongolîzm) jî doktor dikarin kifş bikin. Eger nexweşî di genekê an jî hinan de be, encama hûrlênêrîne gelek caran girêdayî hebûna eynî nexweşiyê yedi dê û bavan de û dê û bav jî tîr lêhûrnêrîne.

Li gor texmîna doktoran nêzî 4 000 nexweşiyên îrsî ji ber xeletiyê ne ku bes di genekê de ye. Piraniya genan hêj nehatine kifşkirinê lêbelê roj bi roj û yek bi yek tîr kifşkirinê.

Testeke basît nexweşiya pişikê derdixe holê

Hin nexweşiyên îrsî yê pişikê ku ji ber geneke taybetî peyda dibin bi rehetî tîr kifşkirinê.

Nexweşiyên ku ji wan re nexweşiyên multifaktorî tîr gotin, ango nexweşiyên

ji ber hin sedemên ku bi hevûdu ve girêdayî peyda dibin; wek nimûne kanser, tansiyona bilind, nexweşiya dil û hin nexweşiyên psîkolojîk gelek zehmet e ku bi testek basît bête kifşkirinê. Nexweşiyên weha, ji ber hin faktorên wek tesîra derûdorê û danûstendina civakî peyda dibin. Ango nayê wê maneyê ku ji ber xeletiya di genan de mirov bi van nexweşiyên dikeve. Her êşkere ye, mirov di bin tesîra rewş û faktorên wî warî de dimîne ku lê dije.

Gen di jiyana mirovan de roleke pir girîng dilîzin

Di dema bizarokhîştinê [aviskirin (ji bo heywanan), jîndan, xwîndan, bergirtinê] de zarok ji dê û bavê xwe kombînezyoneke genan mîras distîne. Gen an domînant (bi desthilat, serdest) an jî rîsesîv (pasîf, bêhukum) in. Gena domînant ji dê yan jî ji bavê bête mîrasgirtinê jî xwe nîşan dide lê gena rîsesîv ger ne hem jî dê û hem jî ji bavê be xwe nîşan nade, pasîf dimîne.



TEKST-TV çawa dixebite?

Mirov dikare di programa tekst-tyvê de rûpelan li pey rûpelan bête zehmetî derxe ekrana(dîmendera) televizyonê. Gelo ev çawa dibe?

Televizyon tim acela xwe heye. Ew di saniyeyê de 25 wêneyan (resman) distîne ku heryek ji 625 xetan pêk tê. Ji van 625 xetan 40 xet ne ji bo afirandina wêneya televizyonê ya adetî lê ji bo agahdariyên teknîkî tîr bikaranîne.

Agahdariya teknîkî pir cî nastîne û ji ber vê yekê jî muhendîsan piştî demeke din kifş kirin ku ev kapasîteya zêde bêtî ku wêneya televizyonê bête xirakirin, dikare bête bikaranîne. Vê xebatê rê ji bo pêşdexistina tekst-tv vekir. tekst-tv bi 22 xetên teknîkî tîr weşandinê.

Agahdariyên ku bi riya tekst-tv tîr weşandinê dîgîtal (dijîtal) in, ango ji jîmarkodan (kodên reqemî) pêk tîr. Jîmarkod di weşandinê de pir cîh nastînin û ji ber vê jî cîh ji bo wê agahdariyê dimîne ku ji sedan rûpelan pêk tê.

Televizyon eger dekodera xwe ya taybetî ku sînyalên tekst-tv werdigerîne hebe dikare tekst-tyvê werbigre. Televizyonek ku vê dawiyê hatine çêkirinê dikarin heya 1000 rûpel agahdarî di mejiyê xwe de kom bikin.

Pilotê Îngilîzî û motora Jetê

Pilotê Îngilîzî Frank Whittle dema di sala 1930'yî de patenta motora yekem a

Jetê sitend tenê 23 salî bû. Wî kir nekir karmendê xwe Royal Air Force ji bo pêşeroja motora Jetê îqna nekir û di sala 1936'an de şirketa xwe ya şexsî ava kir û bi pêşketina motora Jetê karê xwe domand.

Gelê şekirxwer

Li Dinyayê gelê ku pirtirîn şekir dixwe gelê Kubayê ye. Her Kubayî di salekê de 89,2 kg. şekir dixwe.

Aqara dinyayê

Aqara dinyayê nêzî 510 milyon km2 (kilometre çargoşe) ye. Ji vê nêzî 362 milyon km2 yan jî ji % 21 ji avê pêk tê.

Makyaj

Li dinyayê cara pêşîn Misriyan bi makyaya ku îro tîr bikaranîne xwe xemilandine. 4000 sal berê hem mîr û hem jî jinên Misrî çavên xwe kildikirin.

Masûlkên laşê insanî

Di laşê însên de ji zêdeyî 600 masûlke (zeblek, zîper, lemlate) hene û bi hevkarîya hestî û movikan (geh, girêçk) dikin ku laşê me bilive (hereket bike). Nivê giraniya laşê însên ji masûlkeyan pêk tê.

Germahiya rojê

Germahiya rojê nêzî 5 500 derece ye. Lê di kûrahiya rojê de germahî digihîje nêzî 15 milyon dereceyî.

Japonî û temenê wan

Japonî ji gelên din dirêjtir dijîn. Jinên Japonî bi navincî (ortalama) 83 sal, mîr jî 77 salan umur dikin. Di ciyê duduyan

de Fransîzî tîr. Jinên Fransîzî bi navincî nêzî 81 salan dijîn.

Mezinahiya çermê insanî

Mezinahiya çermê însên nêzî 2 m² û giraniya wî jî nêzî 10 kiloyan e.

Kaxeza nivîsandinê

Misriyan di dema kevn de şikleki kaxîzê, papîrûs ji bo nivîsandinê bi kar dianîn. Papîrûs ji nebata papîrûs (şikleke zilîk, qamîş) dihat çêkirinê. Lê belê Çîniyan 100 sal p.z. (piştî zayîna Îsa) cara yekem kaxîza ji bo nivîsandinê çêkirin.

Şertên jiyane li Çînê

Dewleta Çînê wê berê 700 000 Çîniyên ji bakura Çînê bide herêmên din ên ku şertên jiyane lê baştir in.

BERSIVA TESTA ZANISTÎ

Di hejmarê 7'an de me di vê quncikê de bi navê "Zanista xwe biceribînin" 9 pirs ji xwendevanan pirsî bû û nivîsîndibû ku kesê bersivên me rast bidin dê salekê bêpere bibe aboneya/ê Armancê.

6 xwendevanan bersiva pirsên me dan û di nav wan de jî xwendevanekî tenê rast bersiv dabû. Ew jî Azad Bozo li Swêdê ye. Em wî pîroz dikin û salekê bêpere dikin aboneyê Armancê.


Bersiva pirsên me weha bûn.

1. Gurçik 2. Charles Darwin 3. Green Peace 4. Thomas Edison 5. Psîkolojî 6. Amonyak 7. Vatîkan 8. Kûsî 9. Kristof Kolombo

Li dinyayê xwendina rojnameyan

Ji 1000 kesan çend kes dixwîne

* 1993



ZINAR SORAN

Dadgerên dewletê yê leşkerî bawer dikirin ku wê ve carê jî tevgera Kurdistanê û dengên welatparêz, rewşenbîr û şoreşgerên Kurdan "bêdeng" bitefîne. Lê di van hesab û planên xwe de, bi ser neketin. Welatparêz, rewşenbîr û şoreşgerên Kurdan û bi taybetî endamên DDKO-yê bi nasnameyên xwe yê Kurdî bersîva îdeayên nerast û pûç ên dadgerên leşkerî yê kolonyalîstan dan. Ew dengên welatparêzên Kurd yê ku di dadgeha Antalyayê de nehiştibûn zêde olan bidin, êdî li dadgeha leşkerî ya birêvebirina awarte ya Diyarbakirê û Sêrtê bilind dihatin bihistin. Di doza DDKO-yê de, li hemberî îdeanameya dadgerên leşkerî du bersîvên bi serê xwe yê dîrokî hatibûn pêşkêşkirin.

Bersîva yekem ya îdeanameya dadgerê leşkerî yê qumandariya birêvebirina awarte ya wilayetên Diyarbakirê û Sêrtê, di 12-ê çeloya pêşîn a 1971-ê de li ser navên Fikret Şahin, Mümtaz Kotan, İbrahim Güçlü, Yümnü Budak, Ali Beyköylü û Nezir Şemmikanlı hatiye amadekirin û pêşkêşkirin. Ev bersîv ji 164 rûpelan pêkhatî ye û bi dorfirehî li ser dîroka Kurdan, zimanê kurdî, di dema şerê damezrandina komara Tirkîyê de peywendiyên Kurd û Tirkan, soz û peymanên ku Atatürk di wê demê de danê Kurdan û konferansa Lozanê, serhildanên Kurdan, rewşa dinyê, Rojhilata Navîn, rewşa aborî, civakî û siyasî ya Tirkîyê, bûyerên komando, muxtiraya 12-ê adarê, mitîng û şevên Rojhilatê, xebat û çalakîyên DDKO-yê hatiye rawestandî û îdea û nerastiyên dadger xal bi xal hatine pûç kirin. Di dawîya wê bersîvê de, weke encam weha hatiye nivîsîn:

"1. Li Tirkîyê bi ziman, adet, dîrok û

çanda xwe ve cuda gelêk heye ku Kurd e. Înkara wê yekê, li dijî berjewendiya welat, rewşa civakî û aborî, mercên objektîf û zanyariyê ye.

2. Behskirina ji hebûna objektîf a gelê Kurd û encama wê ya ji hebûna ziman, edebiyat, kultur, dîrok, folklor yanî çanda kurdî, bi tu awayî nabe tawanbarî. Berevajiyê wê, ev dibe parastina mafên mirovan û zanyariyê.


3. Tu eleqeya tewanbariyên ku di madyên 141/4 û 141/3-an ên qanûna cezayî ya Tirkan de hatine diyar kirin, bi me re tune. Ramana qedirbilind a ku biratiya mirovatiyê û wekhevîya gelan qebûl dike, di rastiya xwe de yekgirtinê armanc digre; ji dîr û nêzik ve, tu eleqeya wê bi propogandaya nijadî û hejarkirina hîsên millî yê uneyê ku ew madde îddîa dikin.

4. Teva van hemû tiştan, ger heyeta dadgehê di warê hebûna Kurdan, ziman û edebiyata kurdî de nebe xwediyê baweriyê misoger; em daxwaz dikin ku heyeteke hevbeş a zanyariyê ya ku ji dîroknas, zimannas (bi taybetî pisporên li ser zimanên klasîk û zimanên jîndar ên Şerqê xebatên zanyarî dikin), civatnas, antropolog û pisporên folklorê pêkhatî, di derheqê hebûna gelê Kurd a objektîf de, di warên rewşa aborî û civakî, ziman, edebiyat, dîrok û folklorê de lêkolînê bikin.

Em didin diyarkirin ku dîr an jî nêzik, wê sistemeke li ser esasê biratiyê bête avakirin.

Ji ber ku delîlên têr di derheqê tawanbarkirina jme de tunene û nîşanên tewanbariyê nehatine holê, em daxwaza berdana xwe dikin" (19).

Bersîva duyem jî, di 18-ê çeloya pêşîn a 1971-ê de li ser navê Nusret Kılıçaslan, Sabri Çepik, Zeki Kaya, Faruk Aras, Ferrit Uzun, Hasan Acar, Niyazi Dönmez,



Rûpelek ji dîroka

KOMELEYA ÇANDA Ş

pêşverû wê bi tu awayî nebe tişteki ku serê xwe pê bilind bikin.

Di gel rêzdariyên me" (20).

İbrahim Güçlü dide diyarkirin ku berî biryara dadgehê li ser navê Fikret Şahin, Mümtaz Kotan, İbrahim Güçlü, Yümnü Budak û Ali Beyköylü li derdora 500 rûpelan berevaniyêke siyasî hatiye amadekirin û pêşkêşî dadgehê bûye. Ji ber ku di wê navberê de Nezir Şemmikanlı hatibû berdan û êdî xwe berdest nekiribû, ew neketiye nav wê berevaniya siyasî. Awûkatên wê grûbê ku yek ji wan Şerefettin Kaya bû jî berevaniyêke siyasî û hukûkî pêşkêşî kirine. Ango, wan ne tenê girtiyên xwe parastine, herweha xwedî jî li dozê derketine. Piştî biryara cezayî û îtirazê, dawê dihere "Yargıtaya Leşkerî".

İhsan Aksoy û İhsan Yavuztürk hatiye pêşkêşkirin. Di wê bersîvê de ku ji 26 rûpelan pêkhatî ye, bi kurtayî li ser dîroka Kurdan, dema şerê damezrandina komara Tirkîyê û rola Kurdan, mitîng û şevên Rojhilatê, xebat û çalakîyên DDKO-yê, peywendiyên DDKO, TIP û DEV-GENÇE hatiye rawestandî û bi wî awayî bersîva dadgerên leşkerî hatiye dayin. Ev bersîva îdeanameyê, bi bersîveke îdeayên dadgêr, weha dest pê dike:

"Em dibêjin ku ev dawê, daweyêke ku li hemberî rewşenbîrên welatparêz û şoreşger e ku ew li welatê me yê kêmpêşketî hewl didin dawezîfeyên xwe yê dîrokî bi cih binin ku ji kêmpêşketinê tîr û daxwaza Tirkîyêke bextewar dikin ku li ser bingehê yekitiya dewletê û biratiya wan gelan e ku ji sedsalan ve li ser eynê erdî weke bira jiyane,

Di dawîya wê bersîvê de, weke encam jî ew xalên li jêr hatine pêşkêşkirin:

"1. Tirkîye welatek e ku bi emperyalîz-

Li gor agahdariyên ku Faruk Aras dide; beriya biryara dadgehê Nusret Kılıçaslan, Sabri Çepik, Faruk Aras, Niyazi Dönmez û İhsan Aksoy berevaniyêkê amade dikin û pêşkêşî dadgeha leşkerî dikin ku li derdora 200 rûpelan e.

mê ve girêdayî û paşdemayî ye.

2. Li rojhilatê Tirkîyê gelê Kurd ê zêdeyî pênc milyon heye ku ji mafên xwe yê bikaranîn û pêşdebirina ziman û çanda xwe bêpar hatiye hiştin, keda wî tê xwarin û kêmtê ditin.

3. Hewldanên veşartina hebûna gelê bi metodên zilm û şiddetê, zirarê dide biratî û wekhevîya gelan û dibe sedemê nexweşîya civakî û pevçûnên biratiyê.

4. Di têkoşîna gelên Tirkîyê de ya ku ji bona nan, erd, maf û azadiyên demokratîk li dijî hêzên korfesend û her awe bîr û baweriyên paşverû tê dayîn, em şoreşgerên rojhilatî hemû nêrîn û baweriyên nijadperest, şoven û paşverû bi şidet û nefreteke mezin şermezar dikin.

5. Em bi serbilîndî diyar dikin ku em ji Tirkîyê ne û welatparêz in.

6. Ji bona wekhevî, biratî, pêşeroja gelê me ya ewlekar, rohnî û bextewar, sînga me ji hemû êşan re vekirî ye. Lê îro, ev rewşa ku dijminên gel bi serbestî digerin û em mexdûr bûne, ji bo Tirkîyeyîyên

Li wê derê jî Fikret Şahin, Mümtaz Kotan, İbrahim Güçlü, Yümnü Budak û Ali Beyköylü berevaniyêke siyasî pêşkêş kirine. Di wê berevaniya siyasî de, ne tenê rewşa tevgera Kurdistanê Tirkîyê, her weha rewşa tevgera herçar perçeyên Kurdistanê hatiye şîrovekirin. Li ser kovar û rojnameyên ku hatine weşandin û rêxistinên kurdî yê ku hatine ava kirin û bi taybetî li ser Komara Mehabadê û Otonomiya Kurdistanê Iraqê hatiye rawestandî.

Li gor agahdariyên ku Faruk Aras dide; beriya biryara dadgehê Nusret Kılıçaslan, Sabri Çepik, Faruk Aras, Niyazi Dönmez û İhsan Aksoy berevaniyêkê amade dikin û pêşkêşî dadgeha leşkerî dikin ku li derdora 200 rûpelan e.

Di dadgeha leşkerî ya birêvebirina awarte ya wilayetên Diyarbakir û Sêrtê de, gellek rewşenbîr, welatparêz û şoreşgerên Kurdan bi cezayên giran ên heta 16 salan hatin cezakirin. Lê di dadgehan de, bi mîrxasî, parastina hebûna gelê

E Ğ İ T İ M
ve
Ö R Ğ Ü T L E N M E

DEVİRİMCİ
DOĞU KÜLTÜR OCAKLARI
Hafta Bülteni

SAYI : 1

25 MART 1970

KO OCAKLARI 4

me ya hevdem

REŞGERÊN ROJHILATÊ

Kurd û nasnameya kurdî ji aliyê rewşenbîr, welatparêz û şoreşgerên Kurdan, ji bo karbidestên dewleta Tirkîyê bû şoke-

şer pêk tînin, ji bo şiyarkirina neteweyî û belavkirina nerînên çep û şoreşgerî roleke mezin lîstine. Zilm û zordariya dewleta Tirkîyê ya li ser neteweyê Kurd, li gor hêz û taqeta xwe hem bi devkî û hem jî bi nivîskî deşifre kirine. Bi amadekirina şev, semîner, panel, konferans, mitîng û

DDKO-yê di gellek bûyerên siyasî de rolên taybetî listiye û pêşengî ji hinek xebat û hewldanên hêja re kiriye. Ji bona damezrandina hinek hêz, partî û grûbên siyasî yên Kurdan bûye weke hêlîneke kadroyan. Di perwerdekirin û tecbrûbegirtina gelek kadroyên siyasî de, DDKO-yê roleke girîng û taybetî listiye.

ke mezin û ji bo tevgera Kurdistanê û gelê Kurd jî destpêka qonaxê nû.

weşanên xwe, heyecan û hestê neteweyî û şoreşgerî gelekî bilintir kirine. Loma jî,

VI- DI TEVGERA RIZGARIYA NETEWÊYÎ DE ROLA DDKO-YÊ

Damezrandina DDKO-yê ne ji ber xwe û ne jî bi tesadufî derketibû holê. Ew berhemê guherandinên aborî, civakî û siyasî yên li Kurdistanê, Tirkîyê û dinyayê bû. Encamê ji encamên xebat û têkoşîna gelê Kurd a heta wê demê bû. Piştî damezrandina Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî ku di sala 1912-an de li Stenbolê hatibû vekirin, li başûrê Kurdistanê DDKO komeleya yekem a xwendekarên Kurd bû ku bi awakî eşkere hatibû avakirin. Di vê bûyerê de, divê mirov tesîra xebat û têkoşîna neteweyî bindest, tevgerên pêşverû û şoreşger yên welatên din ku li ser rewşenbîr û xwendekarên Kurdan dikirin jî, ji bîr neke. Bi damezrandina DDKO-yê, bingehê tevgera neteweyî ya Kurdistanê berfirehtir bûye. Beşeke mezin ji xwendekar û rewşenbîrên Kurdan, ji nav komele, rêxistin û grûbên Tirkan veqetiyane û ne resmî be jî bi nasnameya xwe ya neteweyî dest bi damezrandina rêxistinîyeke serbixwe ya Kurdan kirine. Pêvajoya rêxistinîya serbixwe ya Kurdan ku bi avakirina PDKT-ê ve dest pêkiribû, bi damezrandina KAKê û bi taybetî bi vekirina DDKO-yê geştir û berfirehtir bûye.

DDKO di demeke kurt de, ji bo gelê Kurd bûye navendeke girîng û hêviyê nû. Welatparêz û rewşenbîrên Kurdan, DDKO bi çêş û heyecaneke mezin himbêz kirine. Xwendekar û rewşenbîrên Kurdan ku beşekî civatê yê aktîf û têko-

DDKO-yê ne tenê bingehê tevgera neteweyî û demokrat a Kurdistanê berfirehtir kiriye; herweha xebata siyasî û îdeolojîk jî geştir kiriye. Piştî avakirina DDKO-yê, di gel xeta neteweperwerî ku di nav tevgera Kurdistanê de xwedî dîrok, kevnesopî û adeteke kevn û dirêj bû, xeta çep û şoreşer jî bêtir xwe derxistiye pêş.

Bi avakirina DDKO-yê, têkoşîna îdeolojîk û siyasî ya di nav çepê Kurd û Tirkan de jî geştir bûye. Pêvajoya veqetandina ji partî, komele û grûbên Tirkan, bîr û baweriyên avakirina rêxistinên serbixwe yên Kurdistanê berfirehtir kiriye. Herweha ew têkoşîna siyasî û îdeolojîk a di nav çep û şoreşgerên Kurd û Tirkan de, tesîreke berbiçav li ser hinek hêz û komele û weşanên çepên Tirkîyê jî kirine. Ne bi awakî tîr û objektîf jî be, di hinek kovar û weşanên çepên Tirkan de, bi navê "pirsa Rojhilatê" li ser pirsra kurdî bêtir hatiye nivîsandin û di gotûbêjan de li ser vê pirsê bêtir hatiye rawestandin.

Ev pêvajoya ku di nav grûb û partiyên çep ên Tirkan de dest pê kiribû, di nav TIPê de bi awakî zelaltir dihate dîtin. Di "vî warî de, rol û tesîreke taybetî ya rewşenbîrên wan Kurdan jî çêdibû ku di nav TIP-ê de dixebitîn. TIP-ê di kongreya xwe ya çaran de, di dîroka partiyên siyasî yên Tirkîyê de, cara pêşîn di derheqê pirsra kurdî de biryarek pejirand. Ev biryar, bi piraniyê mezin a dengên delegeyan hate pejirandin; tenê du delegeyan li dijî biryarê deng dan û delegeyek jî bêdeng ma.

Li gor agahdariyên İbrahim Güçlü, beşek ji delegeyên ku ev biryar pejirandine endamên DDKO-yê bûn. Ji bona ku di derheqê pirsra kurdî de çarçeweyekê tespît bikin û pêşkêşî kongreya çaran a TIP-ê bikin, nunerên kongreya TIP-ê yên li herêma "Rojhilatê" û "Rojhilata Başûr" li Diyarbekirê, piştî operasyona li ser DDKO-yê bi rojekê dicivin. Bi vî awayî, li gor encamên nerînên van delegeyan û

delegeyên din ên kongreya çaran ev biryar hate pejirandin:

"Kongreya çaran a TIPê diyar dike ku, Li rojhilatê Tirkîyê gelê Kurd dijî. Ji destpêkê de, îqtidarên faşîst ên çînên serdest dem bi dem li ser gelê Kurd tevgerên zilmî û xwînêrî, siyaseta tîror û asîmlasyonê meşandine.

Sedemên bingehîn ên paşdemayîna navçeya ku gelê Kurd lê dijî, di gel qanûna kapîtalîzmê ya pêşketina newekhevî, encameke siyaseta aborî û civakî ya îqtidarên çînên serdest e ku rastiya hebûna Kurdan ya vê navçeyê didin ber çavan û dimeşînin.

Ji ber vê yekê, ger li ser 'pirsa kurdî' tenê weke pirsê paşdemayîna navçeyekê bête rawestandî, wê jî berde wama nerîn û helwestên şoven- neteweperest yên îqtidara çîna serdest pê ve, nebe tiştêkî din.

Di riya bikaranîna mafên hemwelatîya qanûna bingehînê hemû hesret û daxwazên din ên demokratîk de, piştigiriya têkoşîna gelê Kurd wezîfeyê şoreşgerî, xwezayî û mecbûrî ya partiya me ye ku dijî minê hemû tevgerên nedemokratîk, faşîst, neteweperest û sîtemkar e.

Ji bona ku têkoşîna gelê Kurd a ji bo îfadekirin û pêkanîna hesret û daxwazên demokratîk pêşdikeve û têkoşîna şoreşa sosyalîst a çîna karker ku di pêşengiya rêxistinê wî ya pêşeng; partiya me de tê meşandin di yek pêla şoreşê de bête yekirin, divê sosyalîstên Kurd û Tirkan di nav yek partiyê de, mil bi mil bixebitin.

Di nav endamên partiyê, sosyalîstan û hemû karker û kedkarên din de, bertekirin û binerdkirina îdeolojiya burjuvazî ya nijadperest- neteweperest û şoven ku li dijî gelê Kurd tê xebitandin, dozeke bingehî û daîmî ya pêşketin û têkoşîna îdeolojîk a partiyê ye.

Partî dipejirîne û îlan dike ku ew li gor pêwîstiyên têkoşîna çîna karker ya şoreşa sosyalîst li pirsra kurdî dinere" (21).

Tevî ku weke komeleye legal û demokratîk hatibû avakirin jî, DDKO-yê di gellek bûyerên siyasî de rolên taybetî listiye û pêşengî ji hinek xebat û hewldanên hêja re kiriye. Ji bona damezrandina hinek hêz, partî û grûbên siyasî yên Kurdan bûye weke hêlîneke kadroyan. Di perwerdekirin û tecbrûbegirtina gelek kadroyên siyasî de, DDKO-yê roleke girîng û taybetî listiye. Ji xwe gava mirov li hinek bultenên wê dinere, mirov dibîne ku ew dişibin broşûr û weşanên perwerdekirinê yên rêxistinên siyasî.

Piştî efüya giştî ya hezîrana 1974-an girtiyên siyasî yên Kurdan jî hatin berdan û pêvajoye nû ya rêxistinîyê li Kurdistanê Bakur dest pê kir. Gelek kesên ku berê di nav DDKO-yê de xebitibûn, di damezrandina hinek partî û grûbên siyasî yên Kurdistanê de rolên bingehîn listin û di serokatiya wan partî û hêzan de cih girtin.

Piştî muxtiraya 12-ê adara 1971-ê bi demeke kurt, di 26-ê nîsana 1971-ê de ji aliyê birêvebirina ewarte ve, DDKO hatin girtin. Piştî vê biryarê, karbidestên dewletê dest danîn ser malên DDKO-yê û kiltî li deriyê wan xistin (22).

DDKO Dava dosyası

Komal

Têbînî û çavkanî

19. Ji bo tevayîya vê bersiv û berevaniyê binere: DDKO Dava Dosyası, r. 113-272.
20. Ji bo tevayîya vê bersiv û berevaniyê binere: DDKO Dava Dosyası, r. 305-317.
21. Binere: DDKO Dava Dosyası, r. 542.
22. Ji agahdariyên taybetî yên İbrahim Güçlü.

PENCERE

JUAN RULFO

Pedro Paramo

Berbi êvarê hatin, qasî deh kesan bûn û çekên hemûyan hebûn.

Pedro Paramo ew vexwandin şîvê. Bê ku sombrero-yên (şewqeyên lengerî) xwe derbixin li ser sifreyê rûniştin, qet nedipeyivîn. Tenê dema ka-ka vedixwarin an jî nan û fasûlî dixwarin fir fira wan bû, hew.

Pedro Paramo jî nêzik ve li wan nihêrî. Tu kes ji wan nedinasî. El Tilcu-ate li pişt patronê xwe di tariyê de sekinî bû.

"Ez ji bo we dikarim çi bikim begno?" got piştî ku xwarin xelas bû.

Yekî ji wan destê xwe li ba kir û pirsî; "patron tu yî?"

Di vê navê de yekî din dest bi peyvê kir; "bihêlin da ez bipeyivim."

"Baş e", got Pedro Paramo. "Ez dikarim alîkariyê çawa bi we bikim?"

"Tu dibînî em bi çek in."

"Yanê?"

"Em bi çek in. Têrê nake?"

"Gelo ez dikarim sedama biçekbûna we fêr bibim?"

"Hemû nasên me bûn çekdar, loma. Ma we nebihîstibû? Em li benda xeberê ne, em jî dê wê demê sedemê bizanibin. Nuha em ji van deran na-çin."

"Ez dizanim mesele çi ye", got yekî din, "ku tu bixwazî ji te re jî bibê-jim. Em li hember hukûmetê û yên wek te rabûn, ji ber ku edî sebra me nema. Bawerî bi hukûmetê nayê, hûn hemû sextekar û rezil in. Ez di der-heqê hukûmetê de zêde napeyivim, çimkî ji vir û pê ve em dê çekên -gul-leyên- xwe bidin peyivandinê."

"Ji bo serîhildana we çiqas pare pêwîst e?", pirsî Pedro Paramo. "Dibe ku alîkariya min bighîje we."

"Mêrik rast dibêje, Perseverancio. Zimanê xwe bigre. Çawa be alîkari-ya dewlemendê pêwîst e, çima ev beg alîkariyê neke? Deqîqeyê Casildo, texmînî divê em çiqas pare peyda bikin?"

"Çi ji dilê wî tê bila bide heyran."

"Nabe. Çima em hatin vir? Heqê me heye ku em hemû tiştê wî jê big-irin, ku dilê me bixwaze em dikarin garisên (misirên) di zikê wî de jî bistî-nin."

"Hêdî be, Perseverancio. Heta ji dest me bê divê em ji belayê dûrbike-evin. Werin em li hev bikin. Li ser navê me tu bipeyive Casildo."

"Li gor min ku di destpêkê de bîst hezar pesoyî bide xirab nîne. Hûn çi dibêjin? Dibe ku ew bixwe vî pareyî hindik bibîne, çimkî ew bixwe dix-waze alîkariya me bike. Bi hesabek gilover em bibêjin pêncî hezar. Baş e?"

"Ez sed hezar pesoyî didim", got Pedro Paramo. "Hûn çend kes in?"

"Qasê sêsed kesan."

"Baş e. Ez sêsed peyayî jî wek destek didim we. Heftêyê nakêşe meriv jî pare jî hazir in. Ez pareyan wek xelat didim we lê mirov bi deyn in; de-ma karê wan qedya hûn şûnde dişînin. Me li hey kir?"

"Helbet."

"Ku weha be em piştî heftêyê hevdu dibînin begno. Ez gelek şa bûm ku me hev nas kir."

"Dema ji derî derketin ji wan yekî di guhê wî de weha got: "Tenê vê ji bîr meke, ku tu li ser soza xwe nesekinî ez yaxa te bernadim, navê min Perseverancio ye, ji bîr meke."

Pedro Paramo destê wî jî girt û daxwaza şevbaşiyê lê kir.

"Li gor te serokê wan kîjan e?" jî El Tilcuate pirsî.

"Li gor min yê ku qet nepeyivî, yê qelew e. Li gor min serok ew e. Tu dizanî ez kêman çiqas derdikevim Don Pedro."

"Na, tu dê bibî serokê wan. Ma tu naxwazî tevî serîhildanê bibî?"

"Çawa, çiqas zû biçim herqas baş e."

"Baş e, pêwîst nake şîretan li te bikim. Sêsed mirovên ku tu pê bawerî hilbijêre û tevî wan serserîyan be. Bêje te ew mirovên ku min soz dabûn anîne. Tiştê din ji te dihêlim."

"Ya pare? Ez dê pareyan jî bibim?"

"Serê meriv deh pesoyî didim, ji bo pêwîstiyên destpêkê. Yên din ez li vir vedîşêrim, bibêje gerandina pareyan li gel xwe talûke ye. Haa, min jî- bîr kir ez bipirsim, çewlîgê (çiftlig, mezrea) heye ku dibêjinê Puerta da Piedra, tu wê dicibîni? Baş e, ji vir û pêve ew çewlig ya te ye. Ez dê note- kî ji aboqat Gerardo Tujillo ye ku li Comalayê ye binivîsim, tu dibî, ew çewligê li ser navê te qeyd dike. Tu çi dibêji?"

"Ma ev tê pirsîn patron? Tu wê nedî jî ez vî karî ji bo zewqê dikim. Ma tu min nas nakî? Cardin jî pir sipas dikim. Qet nebe jina min dema ez tu- nehim zehmetiyê nabîne."

"Ji çêlekên me jî hinekan bi xwe re bibe, çewlîga bê dewar ji tiştêkî re nabe."

"Brahmanan (cinsekî mirîşkan) jî?"

"Canê te kîjanî bixwaze, tu dikarî qasê ku jina te bikaribe lê miqate be çêlekên bibî. Nuha em vegezin kar, nebe tu ji erdên min dûr bikevî, dema hinên din hatin bila bibînin çekdarên me jî hene. Di nav re carna were ji min re xeberan bîne."


"Baş e patron."

Parçeyek ji kitêba Juan Rulfo ya bi navê Pedro Paramo, 1955
wergera ji tirkî: NÎHAT ELÎ

DANASÎNA PIRTÛKAN

amadekar: EMÎN NAROZÎ

Ekrad Lubnan
Kurdên Libnanê
Ehmed Mihemed Ehmed
1995



Berhem ji aliyê Ehmed Muhemmed Ehmed ve bi zimanê erebî hatiye nivîsandin û di sala 1995-an de ji hêla weşanxaneyê Mekteb el-Feqîh ve li Libnanê hatiye weşandin. Navê kitêbê yê eslî û temamî "Ekrad Lubnan we Tenzîmuhum el-İctîma'îyye we es-Sîyasîyye" (Kurdên Libnanê û Rêxistinên wan ên Civakî û Siyasî) ye.

Kitêb li ser rewşa kurdên Libnanê ye, bes serê pêşî ew bi binyat û welatê wan yanî bi danasîna Kurdistanê dest pê dike û pişt re li ser zimanê kurdî û zaravayên wî radiweste. Nivîs- kar bi agahdariya li ser kurdên ku pêşî koçî Lubnanê kirine didomîne û ji dema eyûbiyan û vir ve rewşa jiyana û kirinên gellek mîrek û gire- girên kurdan diyar dike. Di pey de ew koçeriya nîfşê duyemîn digre destê xwe û sedem û dilru- bayîyên wê, cihê ku jê bar kirne û hejmara wan giş dinivîsîne.

Di beşa sîsiyan de jî ew li ser rewşa rêxisti- nênan wan ên civakî, kulturî, siyasî, hunerî, urf û edetên wan radiweste û gellek kopya ji rojna-

me û kovaran dide ku li wir derketine; mîna Roja Nû, Ronahî û hinekî din. Ji bilî van jî di vê kitêbê de gellek agahdariyên hêja hene ku pêwîstî bi zanîna wan hebû lê agahdarî li ser wan hindik bûn. Di kitêbê de pîrr çavkaniyên hêja yên bi rêk û pêk jî hatine dayin ku mirov di vî warî de dikare ji wan feyde bigire.


Heyf ku ne di kitêbê de û ne jî di cihekî din de li ser nivîsariya tu agahdarî di destê me de nî- ne, bi tenê em dizanin ku kurdek ji yê Libnanê ye û navê wî Ehmed Muhemmed Ehmed e.

Ev lêkolîna hêja î akademîk ji aliyê Robert Olson ve bi inglîzî hatiye nivîsandin û van salên dawîyê jî wî bi xwe ew wergerandiye tir- kî. Li gor dibaceya vê kitêbê, profesor Olson cara pêşî di navbera salên 1965 û 1973-yan de di dema xebata xwe ya li ser dîroka Rojhilata Navîn û İslamê li Unîversîteya Indianayê (Eya- leteke Amerîkayê ye), bi serîhildana Şêx Se'îd hisiyaye. Di wê demê de jî profesore wî Wadie Jwaideh jî yekemîn dîroknas bûye ku li ser tev- ger û serîhildanên neteweyî yên kurdan berhe- meke berfêreh nivîsandibû.

Bi xêra vê hevnasîna Olson bi tevgera kurdan û serîhildanên wan re di navbera salên 1979 û 1980-yê de gava ew li Brîtanîya Mezin bû li arşî- vên inglîziyan geriya, wî hem li ser kurdan û bi taybetî jî li ser serîhildana Şêx Se'îd gellek doku- mentên bingehîn ku berê qet nehatibûn bikaran- nîn di arşîvên wezaretê hêzên hewayî de dît.

Olson bi serîhildana Şêx 'Ubeydullahê Nehrî (1980) dest bi kitêba xwe dike û pê ve diçe ta ku digihîje destpêka Alayiyên Hemîdî. Ew rew- şa wan Alayîyan, peywendiyên wan hem ên bi ermenîyan re û hem jî yên bi eşîrên kurdan re û yên nav wan xwe bi xwe jî qenc şîrove dike û tîne pêş çavên xwendevanên xwe. Herweha ew

The Emergence of
Kurdish Nationalism
and the Sheikh Said
Rebellion, 1880-1925
Robert Olson
Austin - USA
1991



di nav Alayiyên Hemîdî de destpêka şiyarbûna millî, pîrgirêkên ku di nav wan de derdiktin holê û têkiliyên wan bi tevgera azadîxwaz a kurdî re jî rind diyar dike. Olson di pirtûka xwe de li ser siyaseta inglîzîyan a li hember gelê kurd û bi vê re li ser rewşa peymanên Sewr û Lozanê jî disekine. Bêguman wî li ser mercên ku bûne sedem ji bo serîhildanê qenc lêkolîn kiriye û ew raxistine pêş çavên xwendevanan. Bi vî awayî jî ew wan nabûkariyên ku ji aliyê kemalist, Dew- leta Tirk û yên din ve li Serîhildanê hatine kirin pûç dike û temama derewîn û rûreş derdixe.

Robert Olson li Unîversîteya Kentucky profe- sorê dîroka Rojhilata navîn û ya İslamê ye û gellek xebat û berhemên wî li ser dîroka Rojhi- lata navîn û İslamê hene.

Bir Kürt Olarak Yaşamım
Nuredin Zaza
Mezopotamya Publishing
Stockholm
1994



an de li Swêdê ji aliyê weşanxaneyê Mozopo- tamya Publishingê ve hatiye derxistin.

Zaza di sala 1919-an de li bajarê Madenê ha- tiye dinyayê. Jiyana wî, wek ku di pêşgotinê de jî tê gotin di nav şeq û deqan de li gellek herêm û welatên cihê bi tekoşînên pîrralî didome.

Ji bilî vê berhemê wî Dastana Memê Alan jî bi pêşgotineke dîr û dirêj li Libnanê dabû çapkirin û bi zimanên cuda û yê kurdî jî gellek nivîs- andîne. Ew heyanî dawîya temenê xwe li Swîsrê dijîya û li bajarê wê ê Lozanê alîjiyan bû.

Berhemên din yên Nuredîn Zaza ev in:

1. Şerê Azadî (helbest)
2. Contes et poemes Kurdes (çîrok û helbestên kurdî)
3. Keskesor (çîrok)

MUMTAZ AYDIN

Nuha li Swêde filmê "Şêrê Xezayê" ku ji aliyê PeÅ Holmquist û Suzanne Khardalian hatiye çêkirin, li sinemeyan dilîze. PeÅ Holmquist berê jî çend film li ser biyaniyan û nijadperestiyê çêkiribûn. Beriya çend salan filmek dokumenter jî bi navê "Bi şûn de vegera ji bo Araratê" li ser rewşa Ermeniyên çêkiribû.

Şêrê Xezayê filmek dokumenter û 38 deqîqe ye, li Swêde û li Îsraîlê hatiye kîşandin, muzîka wê jî ji alî George Totarî ve hatiye afirandin.

Film li ser Nafiz e, xortekî Filistinî, yek ji wan e ku di destpêka salên 80'yî de kevîr davêtin polisên Îsraîlî û di serhildanan de li sefên pêşî bûn. Ji ber wê jî, jê ra dibêjin Şêrê Xezayê. Dû re Nafiz ji bo xwendinê diçe Polonyayê, li wir unîversîteyê xelas dike, dibe abûqat. Bi keçeke Polonî re dizewice û du zarok jê re çêdibin. Piştî xwendina xwe Îsraîlê re nade ku ew vegere Filistinê û nikare li Polonyayê jî bimîne, di destpêka sala 1990'yî de îlticayê Swêde dike û di sala 1994'an de mafê rûniştine werdigre.

Nafiz û PeÅ Holmquist hev û din ji sala 1982'an nas dikin. Di wê salê de dema PeÅ Holmquist ji bo çêkirina filmê dokumenter "Xeza-Ghetto" diçe Xezayê, Nafiz û hevalê wî Suêlê jê re dibin alîkar û dostaniyek di navbera wan de dest pê dike. Dema di Zivistana 1990'yî de Nafiz tê Swêde û muracaatê îltîca polîtîk dike, pêwendî bi Holmquist re datîne û pêwendiyên wan her dom dikin.

Di vê navberê de li dinyayê û li Rohilata Navîn guhertin çêdibin, Îsraîl û Filistinî li hev dikin, leşkerên Îsraîlî ji erdê dagîrkirî derdikevin û şertê vegera Nafiz çêdibe ku dê û bavê xwe, hevalên xwe bibîne, li wan kolanên ku lê mezin bûye, bimeşe. Nafiz biryarê dide ku bi keça xwe ya 6 salî re here Xezayê. Film ji Swêde li mala Nafiz dest pê dike, li Xezayê dom dike û dawiyê li Swêde diqedê.

Min di film de jiyana xwe, jiyana Kurdekî siyasî ku îlticayê Swêde kiriye dît. Dema min film temaşe kir -nasandina film bo çapemeniyê-, PeÅ Holmquist û Suzanne Khardalian li pêşiya min rûniştibûn, di dawiya film de min xwest ez wan pîroz bikim û bibêjim "ev ne tenê filmê penaberekî Filistinî ye, ev filmê min e, yê her Kurdekî penaber e".

Nafiz dema li mala xwe ya li Swêde, sûretên dê û bavê xwe, bira û xwişkên xwe nîşanî zarokên xwe dida û pesnê welat û bajarê xwe dida, tu ferqa wî û Kurdekî multeciye siyasî tunebû. Dema diçû balafirgehê û rûniştina wî di balafir-

'Şêrê Xezayê', filmê ku ez birim rojên buhurî

rê de, stresa min a cara pêşî ku piştî 10 salan (di 1990'yî de) diçûm Kurdistanê dianî bira min, wê heyecanê bi min digirt...

Dema li Îsraîlê Nafiz taksî digirt û ji şofêr re digot "ez dixwazim herim Filistinê" û di sinorê Îsraîl û Filistinê re derbas dibû û çav li polisên Filistinî diket, şaş dibû, wek ku di xewnan de bijî. Wexta ber bi bajarê xwe diçû heyecanek pir mezin ew girtibû, çûna min a Farqînê ya piştî 10 salan dihat bira min. Dema jî Diyarbekirê ber bi Farqînê ve diçûm, bi heyecan û meraqek pir mezin min bala xwe dida Asloyê, Qasimiyê, Başnîqê, Qurtê, Dara Hiznaxiyê, dilê min bi awayekî din lêdida. Min nizanibû ji hevalên ku hatibûn pêşiya min re çi bibêjim, gotin ji devê min pir kêma derdikevin, ne ku min nedixwest, min nizanibû ku çi bibêjim, gotinên ku hîsên min ji bidin der, min nedidit, belkî jî tunebûn... Wan jî qey bi rewşa min dizanibûn, pir kêma ez ji xeyalan şiyar dikirim. Dema ez nêzî Farqînê bûm, heyecana min hîn zêdetir bû, min dixwest serê Minara Qot, minara camiya Selahedîn ew çiyayê li pişt Farqînê ku li ser "Önce Vatan" dinivîsî, bibinim. Dema ez li Farqînê diji-

yam tu car nedihat bira min ku wê rojek bê ku ezê bêriya nivîsa "Önce Vatan" bikim. Tê bira min, dema 14-15 salî bûm, ez û du-sê hevalan rojekê em çûbûn ku wê nivîsê xera bikin, bi seetan me ew kevirên kilskirî ji hev belav kirin, heta dinya li me bû tarî... Wê şevê me bawer nedikir ku bibe sibe. Rotirê serê sibê ez derketim serê xêni, min nihêrt nivîs wek xwe ye, bes "A" yek piçek xwar bûye... Ne ji Hiv û Stêrkê (Ala Tirkiyeyê) bûna û Kurdiya "Önce Vatan" yanî "Pêşî Nîştiman" bihata nivîsîn wê çiqas xweş bûna...

Nafiz piştî 10 salan dema li wan kolanên ku lê mezin bûye digere, jê re her tişt xerîb tê. Ew çiyên ku bi salan jê re xeyal bûn, basit dihat, sebra wî lê nedihat û wî ev yek weha şirove dikir "Berê ev der ne weha bûn". Dema ez li Farqînê digeriyam ji min re jî her tişt guhertî dihatin, basit dihatin, ew cadyên ku berê ji min re fireh xwanê dikirin, gelek teng dihatin xwanê, ew avahiyên ku min mezin û xweş diditîn, gelek basit bûn. Min matmayî li der û dora xwe dinihêrt.

Nafiz dema ket hewşa malê bi tilîlî, bi deng pêrgî mirovên xwe bû, lê wî bêyî dê û bavê xwe kesî din nas nedikir, ge-

lek zarok û xortên sivik li der û dora wî hebûn, wî bi çavekî bi meraq li der û dora xwe dinihêrt, ji heyecana nizanibû çê bike. Keça Nafiz a 6 salî nizanibû çî dibê, ji qelebalixê tirsîya bi girî xwe avêt pêşa bavê xwe. Dema min birayê xweyê Metîn (10 salî) û xwişka xwe ya Amîne (7 salî) cara pêşî dîtin ku berê min qet nedîtibûn, bi awirên ku nayên tarîf kirinê me li hevêdu mêze dikir. Birayê min Ahmet ku dema ez ji welêt derketibûm 4 salî bû, bûbû xortekî 14 salî...

Nafiz bi tirs li hevalên xwe yên berê dipirsî û digot wê bi çî çavî li wî binêrin, bi çavê revokan, çavê xayinan... Ew hevalên ku bi hev re bi keviran derdikevin pêşiya tank û panzerên Îsraîlê, ew hevalên ku ew bi "Şêrê Xezayê" bi nav dikiirin, Mistefa û Suhêl hatin ew ziyaret kirin. Herçiqaş li ortê sûcek tunebû û Suhêl û Mustafa jî wek wî di keftelefa jiyana de bûn jî, Nafiz di psikolojiya sûcdariyê de bû.

Diyalogek weha di navbera wan de derbas bû:

Nafiz: "Ez dibînim pêşketin tune ye, vir paş ve ketiye. Ez bi xwe fêrî jiyaneke rehet bûme".


Suhêl: "Ez bawer im Nafiz bi çavekî Swêdî li rewşê dinêre. Ew me bi çavê biyaniyan rexne dike".

Mistefa: "Nafiz, divê tu neyê vir û qala hîsên xwe nekî. Tu nikarî rewşa xwe bi ya me re bidî ber hev; ya me gelek xerab e".

Dema ez li Farqînê rastî hevalê xwe yê berî 10 salan bûm pir guherî bûn, çî bigre her yek ji wan bûbû bavê 2-3 zarokan. Herçiqaş sohbetên me li ser pirsên siyasî dest pê dikirin jî piştî demekê peyv dihat ser pirsên bahabûnê, kar û debara malê. Herçiqaş carna bi niv-henekî gazind dikirin û digotin; "we xwe xelas kir, we em hiştin", lê di pirs û peyvên wan de xwestineke xurt ya ew jî riyekê bibin û li Ewrûpayê bi çî bibin, vekirî derdiket rastê.

Piştî ziyareta Filistinê, Nafiz xwendina fêrbûna Swêdî xelas dike û ji bo kar diçe daîreya kargerîne. Yê memûr jê dipirse: "te çî xwendiyê, çî kar jî destê te tê?" Ew li hember memûr soro-moro dibe, dibe lepek û bi şermokî bersiv dide, dibêje: "Min dadwerî xwendiyê, ez abûqat im, lê ez dizanim ji bo yê li derve dadwerî xwendiyê, ne mumkun e li vir di warê xwe de kar bibîne. Ez şofêriyê dizanim, dikarim otobusê bajom an jî di embarekê de truckê (makîneya kar) bajom". Hevoka dawiyê bi zorê ji devê wî derdikeve. Şêrê Xezayê di wê pozîsyonê de xwe wek pisîkekê hîs dike.

Lê rastî Nafiz ne şerek û ne jî pisîkek e. Însan e. Yê mirov dikin şer û pisîk şert in, dem û war in.



"Fîlmê kurdan" xelata Oscarî qezenc kir

EMÎN NAROZÎ

Fîlmê "Braveheart" bi pênc xelatên Oscar ve bû filmê salê. Du heb ji wan gihan Mel Gibson; yek ji bo rejîsoriya wî û yek jî ji bo çêkirinê film. Yek ji wan pênc xelatên jî ji ber dengderiyê (ljudeffekt) gihan Per Hallbergê swêdî. Braveheart herdu xelatên din jî ji bo foto, makyaj û nexşandinê standin.

Fîlmê "Braveheart" li ser tekoşîn û serhildana Skotîyan a serdema navîn e ku ji bo azadî û rizgarîyê tê dayin. Her çendî

ku li ser kaxiz projeyeke zor bû jî Mel Gibson gellek bi hostatî û serkeftî ew çêkiriye. Gellek perdeyên/sahneyên vî filmî serhildanên kurdan ên kevn, şerên wan ên di jî hev û neyekbûna wan tîne bira mirov. Herweha ew dek û dolabên ku inglîzî li wan dikin û wan bi zêr û dirav û bi erdê wan bertil dikin ji bo yekîtiya skotîyan çenebe jî dîsa eynî mîna fen û fûtên Osmanîyan û kirinê dewleta tirk in ku dianîn û tînin serê kurdan.

Xelata çêtirîn fîlmê biyanî jî giha filmê hollandî yê "Antonia's Line".

Nicolas Cage bi fîlmê "Las Vegas bi xatirê te" xelata çêtirîn aktor (şanoger) û Susan Sarandon jî ji bo rola xwe ya di "Dead Man Walking" de xelata aktrisa (şanogera) çêtirîn wergirt.

Tiştêkî balkêş di vê galayê de jî ew bû ku piştî xebata xwe ya pêncî salan li Hollywoodê Kirk Douglas jî bo durustî û dirêjîya xebata xwe cara pêşî xelat wergirt.

Hinek ji çêtirîn Oscar-ên 1996-an Çêtirîn şanogera jin: Susan Sarandon, "De-

ad man walking"
Çêtirîn rejîsor: "Braveheart", Mel Gibson
Çêtirîn film: "Braveheart"
Çêtirîn senaryo: "Yên Gumankirî", Christopher McQuarrie
Çêtirîn foto: "Braveheart", John Toll
Çêtirîn şanograftî (scenograftî): "Restoration", Eugenio Zanetti
Çêtirîn makyaj: "Braveheart", Peter Framp-ton, Paul Pattison û Lois Burwell
Çêtirîn dengdêr: "Braveheart", Lou Beberd û Per Hallberg

Sedsala me, bêzartirîn û belengaztirîn sedsal e

OCTAVIO PAZ

Weku têt bîra te, tu di sala 1914-an de ji dayikê bûyî?

— Bi rastî ne sedîsed.

Lê di germahiya şoreşa Meksîkî û di êvara şerê cîhanê yê yekemîn de, sedsala ku tu jiyayî hema hema serdema cengeke berdeyam bû, ma ti peyvên xweş li ser sedsala bîstan li cem te hene?

— Ez nemirim, di baweriya min de ev bes e. Dîrok – weku tu dizanî – tiştek e û jiyana me di dîrokê de tiştekî dî ye. Sedsala me malkambax bû, renga di dîroka mirovatiyê de bêzartirîn û belengaztirîn sedsal be, lê digel hin nakokiyên ji her û her jiyana wisa bû, jiyana taybetî ne jiyaneke dîrokîyane ye. Bi şoreşa Firansî û Amerîkî yan jî bi cengên di navbera Furs û Grekiyan de – renga di kîjan rûdan û bûyereke mezin û gerdûnî de be jî – guherandina dîrokê ranaweste. Lê mirov dijîn, dixebitin, hez dikin, nexweş dikin û dimirin. Mirov hevalên nû ji xwe re çêdikin û serdemine ji ronahî û xweşiyê yan jî ji tarîfî û şîniyê. Ti peywendiya van tiştan bi dîrokê re nîn e, yan jî eger tu bixwazî dê peywendiyê xav û pir lawaz pê re hebe.

Bi vî awayî em di dîrokê de ne û li derî wê ne?

— Erê, dîrok bi xwe dîmena me ye û ji bo jiyana me xala me ya xwesipartinê ye, lê trajediya rastîn û komediya rastîn di hindurê me de ye, bi baweriya min em dikarin vî tiştî li ser wan mirovan jî bibêjin ku di sedsala pazdehan de jiyabûn. Jiyana ne dîrokane ye lê tişteke bêtir nêzikî xuristiyê ye.


Tu dikarî ji me re li ser malbata Paz bi-peyivî?

— Bavê min Meksîkî û diya min Spanî bûn. Ligel me metek min î pir seyr dijîya. Bapîrê min nivîskar bû, romanivîsekî bi navûdeng bû, di wextekê de, em tev, li ser qezenca pirtûkeke wî dijîyan ku pir dihat firotin.

Li ser peywendiya xwe ya bi pirtûkan re tu çi dibêjî?

— Nakokiyêke pir seyr li vir peyda dibe, pirtûkxaneyê bapîrê min pir mezin bû, bi qasî şeş heft hezar pirtûk dihêwirand. Min azadiya derbasbûna pirtûkxanê jî baş bi dest xistibû. Di zaroktiya xwe de ji xwendinê tîr nedibûm. Herwa rê bi dest min ket ku ez pirtûkên qedexê jî bixwînim çînkî ti kesî guh nedida babetên xwendina min. Di ciwaniya xwe de min Voltaire xwendibû, di baweriya min de wê xwendinê bi xwe hizra olî li cem min qels û winda kir. Herwiha min romanên beradayî jî dixwendin.

Ma te pirtûkên zarokan jî dixwendin?



— Bêguman, min gelek berhemên nivîskarê itâlî Salgarî, ku li Meksîkê pir navdar bû, xwendibûn, herwiha min Jul Verne jî dixwend, ji xwe yek ji qehremanan min ên herî hîlbijarte Povalò Bêl ê emerîkî ye. Ez û hevalên xwe, ji xwendina romana Aleksander Duma û "Sê lehengê", bê hestên poşmaniyê yan jî bê bêrûmetkirina mafê dîrokê, em ber bi xwendina çîrokên gavanan de, diçûn.

Bi rêjeyî (bi nisbetî) helbesta Spanî?

— Ez li nik helbestvanên Spanî, nişê salên bîstan, rawestiyam, Lorca, R. Albêrtî, Gillî. Wisa jî min A. Maşado û R. Xîmînzê ku wê çaxê şahîşahê helbestê bû, dixwendin. Pişt re min dest bi xwendina Borxîsî kiribû: ji xwe hê nebûbû nivîskarê kurteçîrokê: di destpêka salên sihî de helbestvan û gotarnivîs bû. Lê bêguman dixazim li vir bidim xuyanîkirin ku amaje û peyama herî giring, bandûra herî balkêş a ku şûna xwe li ser jiyana min a wêjeyî, di wê wextê de; hiştibû, ji helbestên P. Neruda, hatiye.

Serdana te ya Spanyayê, ji derveyî siyaseta û parastina komarê, ji bo te çi bû?

— Min beşeke dî ji vemaî û kelepora

xwe nas kir, bêguman min bi xwe vemaî û kelepora wêjeyî ya Spanyayê dinasî, herwa, wek ku wêjeya Spanyayê wêjeya min bi xwe be, min lê temaşe dikir. Lê naskirina pirtûkan tiştek e û naskirin û dîtina xelkê, dîtina dîmenê û şûnşopan bi çavên serê xwe, tiştekî dîtir e.

Bêguman vekolîneke jografî bû jî?

— Erê, lê gerek em rada siyasî û exlaqî jibîr nekin. Baweriyên min ên ramanî û siyasî li ser ronahiya ramana biratiyê şiyar bûbûn, em tev li ser vê yekê dipeyivîn. Wek nimûne, romanên A. Marlo ev lêgerîna li birayetiye de xebata şoreşgêrî de bi dest xistibûn. Ezmûneya min a Spanî baweriyên min ên siyasî xurtir nekir, lêzivirandineke balkêş, di bîr û baweriya min a li ser birayetiye, dirust kir. Rojekê ez û helbestvanê Ingilîzî S. Spendar bi hev re çûbûn eniyêke şerî; li Madrîdê, nêzî bajarê xwendevanan bû, şerekî rastîn bû, carcaran di eynî avahiyê de, diwarekî komarxwaz û qiralxwaz ji hevdû cuda dikirin, me xirecira leşkeran ji rexê dî bi guhê xwe dibihîst. Wê gavê hestekî pir seyr ez dagîr kirim: ew kesên li hemberî min - ên ku dengên wan dibihîzim lê wan nabînim - dijminên min in, lê ew jî wek dengê min bi dengê mirovane di-

peyivîn, wek min bûn!

Piştî vê tu berê xwe didî Ewropayê?

— Erê, gerek min berê xwe jîda Parîsê, Parîs muzexaneyek bû. W. Binyamen Parîs wek paytexta sedsala '9'an didît; lê rast bû. Di baweriya min de jî Parîs paytexta sedsala bîstan bû jî, mebest ne ew e ku paytexteke siyasî û aborî û felsefî bû, lê paytexta huneran bi xwe bû, ne hema nîgarî û wênêkêşan û hunerên şewazkar; lê hunera wêjeyê bi taybetî. Ne hema ji ber ku Parîsê hunermend û nivîskarên hîlbijarte dihêwirandin, lê ji ber ku bizavên mezin hetanî ku digihêje surrealîzmê, himbêz dikirin.

Te çi dît, tiştên ku te hejandin çi bûn?

— Min serdana pêşengeha navnetewî kir. Min "Gênika" ku Picasso nû bi dawî anîbû, dît. Bîst û sêsalî bûm. Vê serdana giranbuha rêça dîtina berhemên Picasso û Mîro ji min re vekir. Wek avê ji nişkê ve ez pêrgî tabloya M. Arnest a bi navê (Ewropa piştî baranê) bûm. Vê tabloyê şopeke pir kûr di hinavên min de kola.

Sala 1938-an tu vedigerî Meksîkayê, A. Bîrîton û Trotskî li wir bûn, ma vê bûnê bala te dikişand?

— Bêguman, di warê siyasî de nakokiyên min û wan hebûn, min bawer dikir ku mezintirîn dijminê me faşîzîm e, ku Stalin rast dibêje, û gerek li beramberî faşîzmê em tev bibin yek. Digel ku Trotskî û Bîrîton wek nokerên faşîzmê nedihatîn hejmartin jî lê ez bi xwe li dijî wan rawestiyam. Lê ji alîkî dî ve, şexsiyeta Trotskî min dîn dikir, min pirtûkên wî bi dizî dixwendin. Her wilo Bîrîton jî li ser min xwedan bandoreke taybetî bû, nemaze pirtûka wî ya bi navê "Evîna Dînbûyî" ya ku bi giranî xwe berdida giyanê min.


Ne xwe bi vî awayî; digel helbesta Spanî û ya Spanî yî Emerîkayî; tu beşdarî taze-geriya Ewropayî dibî?

— Erê lê dixwazim bibêjim ku di vê qonaxê de, sê deqên bingeîn, beşdarî avakirina min bûbûn: deqê yekem helbesta S. Eliot a bi navê "Zemîna wêranê" bû. Min cara pêşîn ev helbest di sala 1931'ê de li Meksîkê xwendibû, wê çaxê 17-salî bûm, vê helbestê mit û mat û sermest kiribûm, pişt re min ev helbest gelek caran xwendiyê; hê jî di wê baweriyê de me ku yek ji giranbuhatirîn helbestên vê sedsalê ye. Deqê diwem helbesta Anabaz a S. J. Bers bû, û yê sêyem jî pirtûka biçûk a Bîreton bû ku li ser evîna şeyda û azad, helbest û rapêrinê dipeyive.

dom dike

Ehmed Huseynî ev hevpeyivîn ji Erebi wergerandiyê.

Ji we vedigerim



EHMED HUSEYNĪ

Ji we vedigerim
 Bêzar, wek ala we kovandar
 Li ser serê tiliyên poşmaniyê
 geh wek hiriyê
 geh wek heriyê, li berbejna xwe digirim
 Velerzîna xwe bi ser gerdena we de dirijînim
 Dîn im... Dîn!
 Asîtankên we, bi awazên girî, bi terkên çengelê
 derî
 bi nermebayekî hişk
 bi şiverêçên mirî, divejînim..
 Bi gavine tewş,
 bi viyaneke piştîxûz,
 xwe davêjim qolinca bextê we.
 Bi lavilavê, bi lepên silavê, cergên we
 diguvêşim..
 Demsalên qonaxê, tevn û ristên çax û axê
 ji westana çavên we dikêşim.
 Ji rengên bazbendên we,
 Ji deng û halana govendên we
 difûrim
 û
 dibim
 çar sînorên bi rim.
 Di kurtepista pêşwaziya we de
 dibim
 gumegum
 Zimanê biharê ji şikefta devê we hildikim
 Sîtav û xeyda êvarê bi ser lêvên we de dadikim
 Ji keviya kula we ta aviya sorgula we
 wek taya sar dilivim
 Dimirim... Dimirim, wek tim
 û ji we vedigerim.



Ji we vedigerim
 Ne helbest im, pasvanê nivê şevê me
 Ne pêtî û pît im, xweşmêr û siwarê revê me
 Spîndara perşikestî, ji kesaxa bagera we me
 Hawar û şevpestî, ji bîn û dûkela daxa we me
 Bi giyanekî pînekirî, bi nêrkewekî sincirî
 bişîrîn girêdayî, niyaz çiriyayî
 kelegirî

wek kulî
 bêrikirina xwe li ser zersimbilên sînga we
 datînim
 Şîrikê salnameya xwe ji bejna genimê we
 dimijim
 û ji raperîna toza pêşenîka we re dibêjim:
 Ji we vedigerim.



Ji we vedigerim
 Çemekî zuha û bê kevî
 Li çavkaniya xuşexuşa hêsrên we dipirsim
 Bi şîrê kovanê xwedî dibim
 Li nik leylandê, bi ava mirinê kedî dibim.
 Kurê we bûm
 Kurê we me
 Ez dê kurê we bim
 Babelîska şeva ebedî bi xwe re birim
 Ji pêxêra kunciyên bejî, ji himbêza garis û
 perparê rakirim
 Zengilê çol û qiçînê
 ji gunehkariyê rût kirim
 Mîna xuya Rehbê
 We ez bi ser birîna bayê hênik de
 werkirim
 Xwe bi çavşînkê we digirim
 û berya ku di cenga xwêdana we de
 bimirim
 Ji we vedigerim!



Ji we vedigerim
 Di hilata peyvên we de axîn im
 Di lebata bêdengiya we de teqîn im
 Hela de werin!
 Rûpelên vê ferhenga zorbaz zû zû
 biçîrînin!!
 Hela de werin!
 Vê xwîna kevgirtî
 ji xwelibakirina mûmên xemgîn,
 dawerivînin
 Hela de weriiiiiiiiiiiiin
 Xwedakî cegerdar di pirtûka hişê min
 de, biaxivînin!
 Min û zaroktiya wan kolanên tirsigirtî
 ji nav lapûşkên vê seqema dadayî,
 birevînin
 Hela de werin!
 Di neynika darbestên we de
 li termê xwe dinêrim
 çavên gerdûnê dihêrim
 û ber bi dojecha navê we de dirim
 Da ku ji we vegerim



Ji we vedigerim
 Di çêregeha bêrikirina we de, wek gur im
 Birçî û bê cî, li kavira bîranînê digirim,
 Mit û matî ji min diherikî, çîrên şikestî yên kuç û
 kolanan, perdeyên qalind û giraniya taristanê,

hevalê bê cigare, pirtûkên qedexe, evîna bi dizî,
 şevbuhêrkên bê ser û ber, mûzik û helbest û
 keçên dudil, û tavsorka êvarê ya ku bi
 xatirxwestinê dipertî..

Helbestvano!

Berya ku şîniyên te bibuhurin,
 berya ku nav û gav û tav û hevoka reşgirêdanê
 di hişê te de bidirin.

Ne xem e, tu ji mêj ve min dinasî
 Tu dizanî dê çi bibe eger bête der ji
 mehrebaniya avê masî??

Ne xem e, çiya dibû bela serê me, gezo diket
 her derê me, qamîş û qamir, dû û ardû, kon û
 heyveron, û girî, û xwelî li ser eniya me şîn dibû..

Dema ku ji we vedigerim

Asoya xwîntal û bajarê we bi bend û revendan
 dîn dibû...



Ji we vedigerim

Wek şîrekî sar ji guhanê êşa we dibarim



Min terk û qeşmûşka lêvên we bi hêsrên xwe
 xêz dikirin
 Min dîroka xwe û çîroka we li bin siya birînê rêz
 dikirin
 digeriyam
 her û her bi تنها dimam
 Min qurtek ji ava dirankiroska we
 Min xewa Rono ya bê balgeh
 Min porê Rono yê bê şeh
 bi cîhanê neda..
 Min xwe ji tevzînokên pêxêra we
 Min xwe ji tûjbûna devê kêra we berneda
 û ji nişkê ve, xweliya we werdigirim
 û bi azadî li agirdanka gulberoya we vedigerim.

Wêjeya Incîlê

ARVID KAPELRUD

Suhûf û Tewrat

Ji bo gellek mirovên berê, serpêhatiya derketina pîrê baweriyê Îbrahîm [pêxember] ji bajarê Urê ji Keldanê û (darê wî di dest de) çûna wî ya ber bi welatê ku Xwedê dixwest ramî bidê ve, meseleye xweş û pîr bi nav û deng e. Herweha ey-nî tişt û belkî hê zahftir jî, ji bo hikayeya dostê [Kelîmê] Xwedê Mûsa derbas dibe ku gelê xwe yê zorlêbûyî û kêmdîtî ji Misrê derxistiye û di deryayê de, di çola ber çiyayê Sîna de derbas kiriye her wiha şemala Xwedê ditiye, bi Xwedê re peyivîye û ew deh peyaman ji bo gelê xwe anîne. Ew [Mûsa] mirovê qanûnê bû û her pênc Suhûfên Mûsa jî bi navê wî dihatin nasîn. Kesê ku ji bo cuhû û xiristiyanan tev form daye her deh Zagonên Mûsa yên sert û fêrber ew [Mûsa] e.

Tewrat ne kitêba Mûsa bi tenê ye û ne bes nivîsareke olperestî ye jî, ew edebiyateke berfireh e ku tê de dîrok, helbest zagon û ferman, peyvên pêxemberan, gotinên pêşyan û serpêhatî hene. Ev wêje ne bi çend salên kurt hatiye holê lê belkî daneheva wê demek dirêj, mîna hezar salî, girtiye. Dana tarîxekê ji bo wan serpêhatiyên koçerî ne hêsa ye. Lê mirov dikare wan di nav salên 1200'ê berî Îsa de belkî hê kevntir jî hesab bike. Bes tarîxa wan beşên ku vê dawiyê ketine nav tewratê mîna hin perçeyên kitêba Danyal, eseyî digihîje dora salên 165'ê berî Îsayî.

Di nav Kenanî û îsraîliyan de meseleyên herêmî ku li ser kevir, dar û bîran, li ser dahl û bêl û li ser pêşiyên wan ên çeknas û şerûd hatine gotin, mane. Gellek ji vî meteriyalî bi riya nivîsandina berhemên mezîna ên dîrokî ku di dema avakirina meşûra îsraîlî-cuhuyan de formê xwe yê dawî girtiye, hatine hefidandin. Şayanê kêfxweşiyê ye ku wan nivîsan di helûmercên xwe yên dawî de jî formên xwe yên kevn parastine.

Ew serpêhatiyên wan ên koçerî û kevn bi gerrên pêşiyên wan ên li rojhilat û bakur ve girêdayî ne ku berî bicihbûna wan li Kenaanê çêbûne. Ew bi pêlên mezîna ên leşkerî derketin ku di dor salên 1500'ê berî Îsa de li dora rojhilatê Deryaya Sipî digeriyan. Wî çaxî hin gelên din jî ji warên xwe rabûbûn. Filistinî jî hinek ji wan bûn ku li dor salên 1200'ê berî Îsa jî aliyê Fir'awn Ramsesê II'mîn ve li ber kelebasta çemê Nîlê hatibûn sekinandin. Ew [Filistinî] bend û benda deryayê bi paş ve vekîşyan û xwestin ku xwe bi nav bakurê Filistinê ve ku navê xwe jî yê wan girtiye bikişînin lê li wir ew pêrgî pêleke penaberên din (Îsraîliyên) hatin ku li erdê Kenanê cihwar bûbûn.

Vêca heke wan li dor salên 1000'ê berî Îsayî di bin serokatîya Seûlê mezîna gundiyan de wek dewletekê xwe nedana hev û di dema Dawud [pêxember] û Suleyman [pêxember] de jî bi tevgerê bi rêk û pêktir xwe vêknexistina ew zor bi ser diketin.

Pîştî dewra Suleyman [pêxember] ew bûne du welatên piçûk: Welatê Îsraîl ku di sala 722'yan de ji aliyê Asûriyan ve hat perçiqandin û Welatê Cuhûyan ku

ew jî di 587'ê berî Îsa de ji aliyê serokê Babîliyan Nebukadnesar ve ji holê hat rakirin.

Heçî Îsarîlî ketin ber terqa Asûriyên wê herêmê û di bin piyê supayê wan de qirr bûn, lê Cuhû – di dema dîlîtiya xwe a li Babîlê de – hem hîwuş û edetên xwe û hem jî tekstên xwe bi xwe re parastin. Wan çand û wêjeya xwe, piştî vegeandina wan ji aliyê şahê Persî [Farsî] Kîros û peyhatiyên wî ve di sala 537'an de li welatê wan, li ser bingehê wan tekst û hîwuşiyên ava kirin.

Pirraniya edebiyata Samî ya rojava jî vê dema tekoşîn û tadehiya hingê derketiye. Ev li cem Îsarîliyan bi awayekî pîr diyar tînin û herweha di wan tekstên efsanewî yên 1300'ê berî Îsa de ku li Sûriye li Ras Şamra hatine ditin jî xuya dikin.

Hem deqên Ras Şamra û hem jî wêjeya Tewratê xwediyê şeweyê xweser in. Herduyan jî ji wan welatên xwedîçandeyên mezîna mîna Asûr, Babîl û Misrê tesîr girtine. Wêjeya wan a kevntirîn di formê helbestkî de bû, lê ne di wî formê helbesta Yûnanî a bi qafiyê de. [– – –]

Ras Şamra (Shamra)

Deqên Olperestî

Metnên Ras Şamra dema cotariyekî Sûrî rojeke biharê di sala 1929'an de li bakurê Sûrî, serseda cotê xwe kişand ber bendera piçûk a deryaya Spî – Mînet-el-Beyda – hingê jî nedî ve gîsinê wî li kêlikeke kevn ket û ew bêhemdî derketin holê. Arkeologên Firansî dest bi kolanê kirin û di demeke nêzik de xwe ji qeraxê deryayê hildane bajarê wêran ê Ras Şamra. Bi dîtina wan, lewheyên qafîk ji hêla Claude F. A. Schaeffer ve di 14 gulana 1929'an de wêjeyê hima çî bigire nenas derkete meydanê. Ew di xaniyê serrekkeşe de derketin ku ji bo dibistanên nivîsandinê hatibûn bikar anîn.

Naveroka wan teswirên efsanewî bûn û tarîxa nivîsandina wan jî digihî 1300'ê berî Îsa. Ew li ber hin nivîsên din hatibûn nivîsandin û nivîskarî di çend cihan de navê xwe jî dabû. [– – –]

Suhûfên Mûsa Serpêhatiya Penaberiyê

Bê guman meseleyên penaberîya Kenanê û ew serpêhatiyên bişewat ên dema derketina ji Misrê, tesîrên xwe li ser wêjeya Îsraîliyan hiştine û ew berhevok û ravekirina wan, bûne materyal ji bo wan Suhûfên Mûsa ku ji wan re pentateuken jî tê gotin. Ew ji yek eslekî ne, lê ew berhevokine welê ne ku ji gellek nasûtên (maddeyên) cihê cihê mîna tarîxa herêmî, çîrokên lehengî, serpêhatiyên gerrê, zagon, hîwuşî, edet, helbest û gellek tiştên din pêk hatine. Ji ber xebateke pîr li ser wan, ew wusa sipehî, yekere, hevgirtî û tekûz xuya dikin. Mûsa berhevokê baş ê hîwuşiyên bû û navê wî ew hin bi hin kirin xwedî ray. Hem meseleya mirina Mûsa û hem jî materyalên demek piştre jî didin diyarkirin ku nivîserê berhemê Mûsa ye. [– – –]

Di beşa duyemîn ji Suhûfa Mûsa ya pêşî de Jahveyê mezîna nenas bi xwe mater-

yal girtiye destê xwe û tê de qala xwe kiriye. Ew helûmercekê dixê temamê dîroka Îsraîliyan û ji dema afirandinê bigre heya wextê koçkirin û cihwarbûna wan li Kenanê giş digire destê xwe. Ew dixwaze nîşan bide bê çawa wî [Jahve] hê di destpêkê de eşîr û bavikên Îsraîliyan hilibijartine û bi destê wan girtine. Tarîxa hilibijartina wan bi afirandinê dest pê dike lê jiyan û mayîna wan li xasbaxçeyê Edenê dirêj najo ku Jahve ji bo mirovan ava kiriye. Hê ji kêlika pêşî ve çavên wan li bêemrî, kêmhîştî û hesûdiyê bû û wextê xwe bi bîziyê (nefretê) xerc dikirin. Jahve ji bo ku salix bide bê çawa ew bi wan re kesiriye û xwestiye ku ji wan bifilite, bûyera tofana kevn a dema Babîliyan digire û ji nû ve li gor lînerînên Îsraîliyan sere-rast dike. Herweha tê de salix tê dayin bê çilo Jahve bi riya Îbrahîm [Pêxember] destpêkeke nû ji wî û nesla wî re amade kiriye û wan ber bi wî erdê Kenanê ve şandiye ku bi wî [Îbrahîm] û zirriyeta wî re soz dabû. [– – –]

Dîroknivîsandina Fêrbar

Ew kesên ku jiyan dane vê berhema dîrokî û heya îro anîn hawîrdorên qiral Josia û peyrewên wî yên dîroknivîser bûn. Wan ew materyalên serdema penaberiyê ku di berhevokên tîkel û rengîn de civandî bûn, girtin destê xwe û lê xebitîn ku bi wan berhemên meşûrî re bikin yek û diyar bikin ku bijartina wan ji aliyê Xwedê ve wek gelê wî û sozdana bi wan re – li gor wan – rast û eseyî ye. Ew berhemên dîrokî ku ji wan re Berhema Dîrokî a Deuteronomî (Kitêba Josua, ya Domar, ya Samuel û yên qiraliyê) tê go-


ul û wan lehengiyên Dawud ên bidestxistina jin, navdarî û hekumdariyê ne. Kitêbên qiraliyê jî ku berdewama yên Samuel in û dexmeyeke xurt ji dîroknivîseran xwarine dîsa binaşeyê wan li ser avakirina bûyerên salane yên qiralî û danenasî-nên kurt in. [– – –]

Pêxemberên piçûk û mezîna

Pîrependî (wecîz) û Hişmendî

Ew nivîsên Tewratê ku li ser navên pêxemberên îsraîlî û cuhûyan in, rengîn û curbicur in. Di wan de hem gotarên kurt î tûj û hem jî nîgariyên (teswirên) berfirehtir hene. Herweha nifir, dua, teşbîh, hişmendî, beşên agahdariya li ser perestî-nê, teswirên we'hî, ilham û kerametan, wêneyên siruştî yên rewa û pêşnumayên jiyana rojane giş bi hev re bi pêwendiyê-ke fireh di wan de hatine bicihkirin. Cara pêşî gava mirov li wan suhûfên pêxemberan dinihêre mirov bi hasayî nêrîn û dîtînen nediyar û nezêlal digel qelsiya hevgerêdana kompozîsiyonê di gişan de dibîne.

Pêxember zanayên çalak, şewirmend û şîretkarên baş bûne ku di demên pêwîst de rêçenasîya xelkê xwe kirine. Gotarên wan kin, tûj û rûbirû bûne û ew li kuçe û kolanan, li perestgehên û carna jî li nik qiral û keşeyan dihatin dubarekirin. Ji ber ku ew kurt, helbestkî û gellek caran bişewat bûne jî xweş hatine bîra mirov û rihet hatine veguhastin. Ew peyv bi peyv ji devan hatine girtin û bi vî teherî hatine parastin, lê piştre ew beş bi beş hatine civandin û kêlî û zêde bûne berhevokên bi rêk û pêk ku demek dûvre jî hatine nivîsandin. Pêxemberan bi xwe pîr kêlî ni-



LEWHE • Lewheya qafîk ji wan e ku 1300-ê berî Îsayî yên pêşî ku di 1929'an de li bakurê Sûrî li bajarê Ras Şamra (Shamra) hatine ditin tevî hin serpêhatiyên efsanewî bi zîmanekî ku hê nû tê hatiye gihîştin.

tin ne ji bo kêfanîne, belkî ji bo fêrkirîna hatine nivîsandin ku mafê pêkanîna emr û fermanên Xwedê û belayên pêkneanî-nê ramî bidin.

Kitêba Josua navê xwe ji wî lehengî [Josua] sitandiye, ew berdewama Suhûfan e, xwediyê naverokeke xurt e û dîroka edebiyatê ye. Kitêba Domar qala penaberîya wan komikên piçûk dike ku bi şeweyê hêdî û bêvegirtin li Kenanê bicih bûne. Herweha di kitêbên Samuel de jî ew hîwuşiyên gelêrî hatine bikar anîn. Meseleyên wê li ser wî qiralê xemgîn Se-

vîsandine – belkî çend kesan ji wan nivîsandin jî – lê nenivîsandina wan ne ji bo ku wan nikarîbû binivîsin, bêguman pîrên wan dikarîbûn, lê girîngtirîn ew bû ku ew peyvên digotin bimana û bihatina veguhastin.

Berhevokên pêşî yên gotinên pêxemberan (hedîsên wan) hê di dema saxiya wan de hatine civandin. Pîr zor e ku mirov bibêje bê ka ew kengê hatine nivîsin, lê berhevokên pêşî hê di dema dîliyê [dîliya cuhûyan li Babîlê] de di navbera salên 587 û 537'ên berî Îsa de hebûne.




HERE BEJIYÊ! • Xwedê ji İbrahîm [Pêxember] re got: "Ji mala bavê xwe, ji welatê xwe û ji nav pismamên xwe derkeve, here welatê ku dê ez şanî te bidim" "Gerrên koçerî û şerên xwebixweî ku di 1000-ê berî İsayî de di nav êlên koçeran de ji bo herêmên erdxurt çêbûne, şopa xwe berdane ser wan welatên rojhilatênêzîk. Darkoliyeke bēnav ji sala 1300î.

Nivîsên Helbestkî

Di beşa kevn a incîlê (Tewratê) de ji bilî wan kitêbên [Suhûfên] dîrokî û nivîsarên peyxemberan, hin berhemên bijare yên helbestkî û lehengî jî hene ku ji ber hin sedemên cuda ketine nav wan nivîsên pîroz.

Di nav wê cîhana kevn a Cuhû-İsrailîyan de berhevoka lawjeyan (İlahîyan) ku jê re Zebûr (Psaltare) yan jî Zebûra Dawud tê gotin roleke mezin leyîstîye. Di Incîla İbranî de tu sernivîs tinebûn. Ji xwe kitêba lawjeyan a kenîşeyên cuhûyan digel çend İlahîyên bijare yên piştî wan, ji dema perestgeha Suleyman pêxember mane.

Hinek ji wan lawjeyan di serî de navên hinek nivîseran didin, mîna ku di 73'yan ji wan de navê Dawud wek sernivîs bi heberî "lê Dawid" tê, di 11'yan de "Zarûyên Kora" yan jî "Koraîtî" tê û di 12 heban de jî Asaf [Asaf Wezîrê Suleyman Pêxember e] û hinekî din tî: Xwedê nîha serwer e! Ji wê bûnê erd şad bûye



GEMÎ • Gemîya [Nebî] Nûh [berê wek beraqeyêke darîn bûye lê piştê hin bi hin] ketiye şekle keştiyêke nûjen. Di hin Wêneyên cuda yên Tofanê de mirov pêşketina teknîka keştiyan dibîne. Ji Incîla Lübeck 1494.

Çi welatên deryayî hene hemû şa bûn Ewr û mijê dora wî girtine, rastî û paqijî sûra bawerîya wî ne. Agir li pêşîya wî diçe û xêrnexwazên hawîrdorên wî dişewitîne. Birûskên wî hawîrdorê cihanê rohnî dikin: Dinya wan dibîne û diheje [- - -]

Incîl, Çavkaniya nivîsên Xiristîyanîyê

Ji me re bûye 'edet ku em Incîlê wek çav-

kanî û belgenameyêke xiristîyanîyê a bawerîya bi İsa û nişaya wê dibînin. Bêguman tiştêkî siruştî ye ku wusa bê dîtin, çiku mebest bi Incîlê ne gotin bi tenê ye belkî mebest pê ew e ku rêberî û rêçenasîyê bike. Herweha ew berhemeke wêjeyî û xwediyê xwuyekî cuda ye ku pîrr nivîsên cihê jî tê de hene.

Gellek ji wan – mîna name û Kerame-tên Yûhenna – hemberî bi edebiyata dema xwe re dikin û bi wan re tîr qiyaskirin. [- - -]

Herçar Incîl û Kirinên 'Hewariyan

Heçî Incîl in çendî ku xwediyê şewê û şiroveyêke xweser in jî lê dema ku bûyere-kê diyar dikin, mîna tarîxê ne. Li gor sernameya Incîla Luka û berhevoka bi navê Kirinên 'Hewariyan ku herduyan jî eynî kesî, "Teofiloyê Esilzade" nivîsiye, nivîskarên Incîlan bi zanîn weha kirine. Luka bi xwe ev herdu kitêb wek beşên eynî berhemê dîtine û mîna serpehatiya "Li ser bûyerên ku li nav me qewimîne" ramî daye. Luka ne yê yekmîn e ku ev bû-

yer û serpehatî nivîsandine. Bêguman pêşengên mîna Matteus û Markus ku Luka jî ew wek "kesên ku ji destpêkê ve bûne şahidên dîtin û gotina aştiyê", berî wî jî hebûne. Nuqteyêke giring jî li ba Luka ew e ku Incîl li ser hîwûşiyên kevn û jî serpehatiyên li ser İsa hatine avakirin.

Van hîwûşiyên hê ji dema İsayî ve li Filistinê bi zimanê Aramî, forma xwe ya pêşî girtibûn. Nivîskarên Incîlan ew giş bi zimanê Yûnanî nivîsandine lê kaîdeyên zimanê Aramî di serpehatiyên de ri-het xuya dikin. Gava mirov li herçar In-

cîlan dînihêre mirov wekhevî û hevgerî-danekê di nav hersiyên pêşî, Matteus, Markus û Luka de dibîne lê ya çaran – Incîla Yûhenna – hem bi naverok û formên xwe û hem jî bi ahenga xwe ji yên din cuda ye.

Keşe Papia ku di nivê sedsala pêşî de li ser Incîlan nivîsandiye dibêje ku Yûhenna Markus şagirtê hewariyê İsa Petrus e û wî ew meseleyên ku Petrûs jê re gotine nivîsandine. Wî [Markus] berhema xwe nêzî salên 70'yî dema wêrankirina Qudsê, li deryayê Filistinê li Roma yan jî li Sûrî, nivîsiye. Markus qîma xwe bi tenê bi weşandina wî materyalê ku bi Aramî hebû neaniye lê ew bi serê xwe li ser hevgerîdana wan xebitiye.

Markus bi xwe li ser 'edet û hîwûşiyên devkî xebitiye û wan daye hev lê heçî Matteus ew berhevokên ku berê hebûne bi taybetî jî wê berhema ku Markus hingê dabû ser hev, bikar anîne. Matteus, bi awayê kronolojî (rêzkirin) û coxrafi jî li pey wî [Markus] diçe û ew berhevoka Markus bûye mazmazka piştê ji xebata wî re. Wî Incîla Markus gellek serbest û azad bikar anîye, lê di peyvên İsa bi xwe de guherandinên zêde çênekirine.

Luka di Incîla sêyemîn de qet venaşêre ku berhemên berî xwe bikar anîne. Ew di pêşgotina Incîlê de ku jî "Esilzade Teofiloyê" re dike diyarî, bi Yûnaniyêke rind dide zanîn ku berî wî gellekan ev bûyer ji kesên dîtî bihistine û guhastine.

Dema nivîsandina vê eseyî di navbera salên 70 û 90'î de ye û cihê wê jî eseyî li deryayê Filistinê ye.

Incîla çaran ya Yuhenna ji hersiyên din gellekî cuda ye; heçî bingehe wê ku teswîreke diyar î kronolojî ji jîyan û peyvên İsa ye mîna ên din e, lê ew Incîlnivîserên din bi tenê bahsa geşteke İsa ya Qudsê dikin, bes Yûhenna qala sê gerr û mayî-neke dirêjtir li Qudsê dike. Di Incîlên berê de serpehatiyên kurt û gotar li ser hev hatine kom kirin lê di ya Yûhenna de em rastî gotarên dirêj tî ku destpêka wan ji serpehatiyeke kurt e.

Stûnlisteyên Deryaya Mirî (Sor) û Deqên Qiptî

Niha, ji çaryeka sedsala berî niha agahdariya me pîrrtir e li ser wêjeya ku di dema İsa û hinek berî û piştî wî de li Filistinê û welatên cînarê wê derketiye holê. Ji bo vê jî divê em spaskar bin ji bo wan destkeftiyên dewlemend û hêja ên destnivîs ku vê dawiye li çend cihan hatin dîtin.

Hem ev nivîs û hem jî yên berê, di navbera salên 100'ê berî û 68'ê piştî İsa de hatine nivîsîn. Her dozdeh demetên din jî di muzeya Qiptîyan a Kahîreyê de hatine dîtin, ew bi zaravayên cuda ên zimanê Qiptî hatine nivîsîn ku piştî dema Misra kevnare û berî bandoriya Ereban li wir pê hatiye xebirdan. Ev destnivîs mîna wanên ku li der û dorên Qumran hatine dîtin ne kevn in lê ew qala peywendiyên navbera xiristîyanîyê û wan mezhebên hember ên ginogistî [rêçikeke olî ya filozafî ye] dikin. Ji bo wan nivîsên Qiptî qala salên 300-400'î tê kirin lê hinek ji wan digel ku venivîsîna wan rastî wê demê hatiye jî jê kevntir in.

Wergêrê ji swêdî: EMİN NAROZİ

Ev nivîs bi kurtî ji hin cihên Litteratures Världs Historia Forntiden, ed. F. J. Billeskov Jansen, Hakon Stangerup, P. H. Traustedt û Sven rinman, Norstedts Förlag AB, Stockholm 1971, çapa duyemîn 1991, beşa Edebyata Incîlê ku Arvid Kapelrud amade kiriye, hatiye wergerandin.

Xewneke bihiştî

Li gel min bû perîzadek bihiştî
Li bin dara xelatê em runiştî
Bê parastin wekî yezdan em dabûn
Ne yek dergah li ber me qet
nemabûn

Bi guhdêrin li dengê ney û tembûr
dinoşin mey bi badê zêr û ferfûr
Me mey noşî ta em herdû ji hiş çûn
di nêv derya evînê em diwerbûn

Dixwestî yar go paldim ez mîna xaç
Bi dîdarî ji lêvê min dida maç
Zimanê xwe wê gerdûna mi malîşt
Bi ser hevde çûm û hatim zik û pişt

Perîzade ji laş xwestî endamek
Min go fermo bi gorî te kerwanek
Bi lêvê xwe ewe endame min dot
Dibê ku ez di nêv destê

[melkemot

Bi nermayî ewe tevde di alast
Dikir hembêz ji bona xwe diparast

Hêdî hêdî di sa yarê dihat jor
Bi xwer xistin eve carê ben û tor
Ji baxê xwe dida destê min dû sêv
Bi nazdarî dida min wê, çen û lêv
Dida pêla li jêrve geh li jorî

Bi ax û ox dikir qêrîn û borî
Nema îlham ji bona min ji jor hat
Belê xencer di kalan de çû bû hat
Hinir min bir perîzadê ji nişka
Ketim warê zîya mar û dûpişka

Bi jêr hatî ji ser min hate xwarî
Şîrê sipî ji endamên dibarî
Di bûn derya dibûn kanî û pingaz
Şîrê nûye ne kelyaye terr û xav
Di bû lêhyek di derbû bi zor û xurtî
Buxara min devê meşka xwe girtî
Rengê endam dibû sist û

[dima nerm


Digotî min ji te evcar dikim şerm
Bibûrî ketim xewn û xeyalê
Ne gunhê min belê sûncê hevalê
Bi zanib ku bi wê avami derkir
Kesê me tev di nav de wa xwe

[werkir

Sipas bo te dişînin ew bi hêvî
Dibê evcar ji mer derket û nêvî

berş

MAHMÛD LEWENDÎ



HELBESTXANE

Mirin

Ey mirîyo, evdê Xwedê
Te ne bav e û ne dê
Tir û vira tu guh medê
Mirin her emrê Xwedê ye!

Ji xwe re bike deyn û dîn
Tu metirse ji gulle w qurşûn
Hevalên te neman, giş çûn
Vê carê jî dora te ye!

Mirin xweş e piştî nodî
Eger tu gihîştî sedî
Te yî ji xwe re dunya dî
Yê mayî êdî vala ye!

De metirse w melorîne
Ev dunya her derewîn e
Dunya wî alî rastîn e
Tijî perî û horî ne!

Ger 'emelê te yî baş be
Ligel jinka te ya dunyê
Heftê horî wê bo te be
Êdî wê kêf kêfa te be!

(Her çendî min nedixwest li ser mirinê binivîsanda û morala gelê xwe xera bikira, lê hin hevalan gotin: "Seyda divê ku tu li ser mirinê jî binivîsî!" Ji ber wê yekê ez mecbûr mam min nivîsî.)

Helbesteke pendwarî

Dunya

Dunya bi dor e, ne bi zor e
Li serê me nema por e
Dawîya me dîsa gor e
Şalê min î cawîn e, sor e!

(Ger hûn baş bala xwe bidinê, di vê helbesta xwe de min prosesa avabûna dunyayê, çêbûna însanan û mirina wan pir xweş rêz kirîye. Mesela, qesta min a jî "li serê me nema por e" ew e, gava ku em nuh ji diya xwe dibin, porê me heye, lê piştî temenekî êdî por hêdî hêdî diweşe û mirov berbi navseretî û pîrbûnê diçe. Û "dawîya me dîsa gor e" jî dide diyarkirin ku li dawîyê mirov dimire. Ji "şalê min î cawîn e sor e" jî qesta min; wexta ku mirov dimire kefenê mirovî tê birrîn û paşê mirovî bi kefen vedişêrin û li ser gora mirovî jî gulên diçînin ku ew gul sor in. Ûfff! Bi rastî ez jî şaîr im ha!!! De kanê herin hemû dîwan û dîwançe û qenepe û qenepeçeyên şaîr-maîran binêrin kê şahesereke weha nivîsîye!?)

Ewê kengî vegerin!

Jinekê di nav nivînan de ji mêrê xwe re got:
— Hela piçekî bi wir de here!
Mêrê wê jî rahişt nivîna xwe da ser milê xwe û çû. Saetek, du saet heta ku di gundekî din re derket. Xelkê wî gundî gotin:
— Xêr e, ev çî nivîn in li ser milê te?
— Jina min ji min re got piçekî bi wir de here, ez jî hatime heta vir. Xêra xwe ger hûn çûn gundê me, ji jina min re bibêjin ma ez hinekî din jî bi wir de herim!
Îcar piştî 12'ê Îlona 1980'yê gelek kurdên me ji welêt derketin û piçekî bi wir de çûn. Gelo ez nizanim ma vegeer tê bîra wan an na!? Yan ewê hîn hinekî din jî bi wir de herin!

Dr. CIWAN

Qîjvîjokê û Vinvinoko - 1

Di odeyê xaniyêkî çewto-mewto yî paçeşikestî de bi dengê guve-guva bayê re, ewtîn û zûrîna kûçik û nirrenirra pisika ber derî dihat û li dîwarê odê diket. Li aliyêkî qîjvîja zarokan, li aliyê din jî qirçe qirça agir û pilqe-pilqa avê bû dikeliya. Bi pilqînîya avê re hilma ku ji ava kel kelî berbi jor hildihat û diçû bi asraxan ve dizelîqî, dibû dilop û vedigerya bi şipeşip dihat li erdê diket û ji erdê jî dipijiqî diçû ser destê jinikê. Jinikê dev ji pûrtikandina mirîşka niv-pûrtikandî berda û bû qarqara wê, bi ser mêrê xwe yê ku bi kufe kuf û hulme gulm kêra kalanî disû de qîrya:

— Çi kufe-kufa te ye, ma qey dengê pilqîna avê nayê te?

Mêrik jî bi dengêkî vin-vinokî bi ser jinikê de vinvinand:

— Çi qar-qara te ye, qîj-vîja zarokan ne bes bû, îcar qar-qara te bi ser de hat!

Bû fire-fira firnikên jinikê, hema tasa di destê xwe de avêt li erdê xist, çingînî jî tasê hat û pengizî çû li serê kurik ket. Qîjînî bi kurikî ket, bû barrebara wî. Qelepele ket hundurê malê, serê kurikî kûpya. Bû vinvina mêrik, bi niçe niç û pife pif hat ba kurikî. Kurik

kir hambêza xwe, bi mirçe-mirç ser û ruyê wî maç kir. Hilke-hilka girîna kurikî daket îskîniyê. Bi îske îsk û bi fişe-fişa firnikan destê xwe avêt hustiyê bavê xwe. Zarokên din jî li dorê kom bûn.

Mêrik jî alîkî de bi "na-na"yê dixwest kurê xwe aşt bike ji alîkî de bi niçe niç û bi awirên tûj li jinikê dinihêrt.

Jinikê jî qehra mêrik, mirîşka niv-pûrtikandî rakir û li erdê xist. Gulpînek ji mirîşka feqîra belengaz a niv-pûrtikandî ya bê-giyan derket û mirîşka jar û belengaz gêri nav agirê gurr ê nav argûn bû. Bi derbekê re dengê kizîniyê jî argûn hat. Pûrtikên nepûrtikandî yên mirîşka niv-pûrtikandî ya bêruh bi carê de şewitîn û kizirîn. Bû qere-pera zarokan, keça niv-xama ya malê hema bi carê de xwe gi-hand argûn û mirîşka niv-kizirî ji argûn derxist û bi lez û bez û bi aye-ay û ûfe-ûf avêt quncikekî odê. Bi avêtina mirîşka niv-kizirî re wajînî jî pitika pêçekî ya di dergûşê de hat. Mêrik kûpandina serê kurê xwe ji bîr kir û îcar berê xwe da keça xwe ya niv-xama.

dewama wê heye

Ma hişê wî heba..!

Gundî hemû li dorê civiyabûn. Wî jî li erebanê dixist û digot:

— Hê Allah hê!

Selawat li nebî Muhemmed hê hê!

Carê rabû pê û li dora xwe zîz bû. Bi zîz-bûnê re, him li erebana xwe dixist, ji alîkî de jî qesîde digot.

Ji gundiyan yekî, ji gundiyeke din pirsî:

— Ero tu dibînî, çawa li dora xwe zîz dibe, eynî wekî perwanê ye. Gelo ma hişê wî naçe?

Gundiye din:

— Na lo, ma hiş di serê wî de heba qet weha dikir!

Ezê pê şorbê vexwim!

Carekê gundiyeke diçe li malekê dibe mêvan. Kebanîya malê jê re şorbê tîne datîne ber, lê kevçî jî bîr ve dike. Mêvan dinihêre ku kebanî serwest nabe, dibêje:


— Xuşkê xuşkê, ca ji kerema xwe tu dikarî ji min re kêrê bînî!

Kebanî:

— Mêvanê delal ma tu yê çî bikî bi kêrê?

Mêvan:

— Wele ezê guhê xwe jêkim û bikim kevçî daku pê şorbê vexwim!



XAÇEPIRS

ÇEPELAST

1. a) Yekem rojnameya Kurdî ku di sala 1898'an de hate weşandin b) Pronavek 2. a) Hat (bi Dimilî, Zazakî) b) Melevanî, soberî 3. a) Imdat b) Muzîkê de îşareta rawestîne 4. a) Eksê bêjeya rakir (berevajî) b) Notayek c) Car (berevajî) 5. a) Kesê ku tişteki nizane b) Êş, zehmetî (berevajî) 6. a) Kurtiya pareyê Almaniyayê b) Ne rast (berevajî) 7. a) Rûvî (bi Dimilî, Zazakî) b) Ji hezarî yekê mîtroyê 8. a) Keç (berevajî) b) Hejmarek 9. a) Genim lê tê hêran b) Ev, va (bi Erebi) c) Kuşt (bi Dimilî) 10. a) Çem b) Şev (bi Erebi) 11. a) Derd, zehmetî b) Pîvana elektrîkê c) Navê kulîlkekê ku navê keçan e jî 12. Welatperwer, welatheskerdox

SEREJÊR

1. a) Bajare ku yekem rojnameya Kurdî lê hate weşandin b) Kavil (berevajî) 2. a) Welatek Ereban b) Li hin deveran ji qedehê re tete gotin 3. Li başurê Kurdistanê bajarek 4. a)

Pêxemberek b) Xanî, bîna (berevajî) 5. Qatixek (berevajî) 6. a) Li ber geryan b) Şikleke plakên muzîkê 7. a) Sûc b) Kitêba nexşeyan (berevajî) 8. Tişteke vexwarinê 9. a) Nivîşt û tiştên weha yên ku bi milê zarokan ve dikin (berevajî) b) Navekî keçan 10. a) Madeyek narkotîk b) Bê rehm (berevajî) 11. a) Na b) Bi vexwarinê re tê xwarin (berevajî) 12. Ronakbîrê Kurd ê ku yekem rojnameya Kurdî weşand

BERSIVA HEJMARA BORÎ

1	N	E	W	R	O	Z	K	A	W	A						
2	E	I	L	C	I	W	A	D								
3	H	Z	I	A	R	E										
4	R	E	N	G	W	E	Ş	A	H							
5	I	A	D	J	A	Z	O	L	A							
6	E	R	N	N	D	V	E	Q								
7	E	Y	U	B	I	H	A	W								
8	N	U	H	A	Y	I	P									
9	I	M	A	N	C	A	N	O	E							
10	R	O	J	R	O	D	U	R	E	D						
11	E	D	O	R	O	D										
12	Z	E	R	D	E	Ş	H	U	R	I						

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1	K	U	R	D	I	S	T	A	N							M
2	A	M	E				A	V	J	E	N	I				
3	H	A	W	A	R		W		E							Q
4	T	N	A	D			A		B	S	I	D				
5	R		N	E	Z	A	N									A
6	E		D	M					T	E	A					
7		L	U							B					M	M
8	N		Z	I	Q		S				M					T
9	A	Ş		H	A	Z	A			K	I	Ş	T			
10	R	U	B	A	R		L	E	T	L						H
11	Ê	Ş		V	O	L	T				A					E
12	W	E	L	A	T	P	A	R	E							T

Arêkerdax: SEYIDXAN KURIJ

Arwûnçî û Luy

Cayk benû cayk nibenû yew ar-wûnçî benû. Arwûnçî têna kiştê yew dewi di aryê xwi di mûnenû. Yew luy tim û tim yena û kinaray aryî wena. Arwûnçî sêrsibayûn wurzenû ki kinara çîna. Yew şew arwûnçî ranikwenû, xwi nûnû kiştê dyês aryî ya pawenû. Luy yena ki kinara bûrû, arwûnçî luy tepişenû. Wi luy ra vûnû:

— Ti qê yena kinaray mi wena? Ez gereka tu bikişî.

Luy vûna:

— Mi mekişî, ma bênî way û biray ciyê, ez tu ri zaf holê kena.

Arwûnçî luy veradûnû. Wi û luy bênî way û biray yewbînûn. Luy şîna sêr sulûyûn a gerêna, gerêna yew sulî seri di yew girrîş girêdaye vîna. Ya inî girrîş ûna kêye, kena a ki yew mujde (mejde) hun o tê, inî mujdî kêye di nûna rue.

Yewna ruej hune şîna sulî ser gêrena, na ray yew girrîş girêdaye vîna û ûna kêye di kena a ki yew altun hun o tê d' o. Ya inî altuni zî kêye di nûna rue.

Luy ruêjek dûna ra şîna kê paşay, vûna:

— Kerema xwi çap xwi bidiyeni mi, biray mi Tozî Beg pê altunûn xwi pêmaşenû.

Luy paşay ra çap gena ûna kêye, cuwa pê yew mujde kena çap ver ra û bena dûna paşay. Xizmetçî paşay bin çapi di mujdî vînenî, yi luy ra vûnû:

— Wayê, wayê, tu yew mujde tê xwi vîr a kerda.

Luy vûna:

— Ecebê şîma menda. Kê xelet pêmaşewit xwira yew heb tede mûnena.

Luy yena kêye di çend ruejî mûnena, ruejêk hune şîna kê paşay, vûna:

— Dê hune çap bidiyeni mi, biray mi Tozî Beg pê altunûn xwi pêmaşewit. Ya çap gena ûna kêye, yew altun kena çap ver ra, bena dûna kê paşay.

Xizmekar paşay altun bin çapi di vînenî, yi vanda luy dûnî, vûnû:

— Wayê, wayê, tu bin çapi di yew altun verdaya.

Luy vûna:

— Ecebê şîma menda, kê xelet pêmaşewit xwira yew heb tede mûnena.

Merdîm paşay xwi b' xwi vûnî herhalde ini Tozî Beg paşay ma ra hêna doletî wû.

Çend ruêj binate ra şîna, ruêjek luy wirzena şîna kê paşay. Kê paşayi di yew kulsî altunûn est. Kûm ini kulsî altunûn ser o ronîşt, yenû a mehna ki owi wazenû kêney paşay bigîrû.

Luy şîna kê paşayi di ê kulsî altunûn ser nişena rue. Merdîm paşay vûnû:

— Wayê, xelet, xelet!

Luy vûna:

— Niye xelet niye taway, ez ameya pê emir Hûmay qol Pêxember paşa kêney xwi bidû biray mi Tozî Beg.

Paşa vûnû:

— Temûm! Ez kêney xwi dûna biray tu, la gereka biray tu biyerû ez vî-nî.

Luy vûna:

— Erê, ma yêni.

Luy şîna kêye, arwûnçî ra vûna:

— Bira, mi tu ri kêney paşay waşt, la gereka ti biyerî ma şîmi kê paşay.

Arwûnçî vûnû:

— Wayê, hê bo hal mi ra, kincûn mi ra. Ez ini hal xwi ya şîni biyerî?

Luy vûna:

— Ti qarîş mebi, ti min a biye. Bînatê aryê û qonax paşayi di yew rue est. Luy û arwûnçî piya şîni vêr ruê, luy arwûnçî ra vûna:

— Bira, ti îta di kincûn xwi vec, xwi rind bişû, xwi pak kiri û tiraşî bi.

Arwûnçî kincûn xwi vecenû û xwi erzenû miyûn owk (awk). Luy kincûn yi gena erzena owk. Kinc arwûnçî owki di şîni, arwûnçî owca di zit mûnenû.

Luy dûna ra şîna kê paşay, vûna:

— Biray mi Tozî Beg ame vêr ruê, wi gina owki ri, kinc yi owki di şî. Kerema xwi yew qat kincûn bidiyen mi, ez bena wa biray mi piraygîrû.


Merdîm paşay yew qat kincûn gêni, bênî dûnî arwûnçî. Arwûnçî kincûn genû piray, xwi tuhaf vînenû, nat xwi ra wêt xwi ra uniyenû.

Merdîm paşay xwi b' xwi vûnî herhalde ini kincûn xwi qayil nibi, yi şîni yewna qat kincûn hêna rind ûnî. Arwûnçî kincûn xwi genû piray û kuênî rîya şîni kê paşay.

Luy riye ra ti ra vûna:

— Ti çi hend uniyênî xwi ra? `Eyb o ehend meyn xwi ra!

Yi şûn di kê paşayi di nişênî rue, yini



ri yew sofre nûnî rue, bye goşt têrûn her çî estû softe di. Arwûnçî zwar (zor) dûnû şorbay mercuy, wi têna mercuy wenû.

Xizmekar paşay cilûn luy û arwûnçî yew wade di rakênî, bêr wadî zî kilît kêni û yi şîni kuênî.

Şew arwûnçî ginenû pîze ri, la ber qefilnay' o, ayay ra nieşkenû şuerû teber. Wi luy ra vûnû:

— Wayê, ez ginaya pîze ri. Ma se bikirî?

Luy cizmûn yi ûna, vûna:

— Virrikê xwi zerrê inî cizmûn kiri!

Arwûnçî wird cizmûn zî kenû pirrê virrik. Sêrsibay fêcîri di luy vanda xizmekarûn dûna, vûna:

— Zehmêt xwi ra ber akiriyeni, ma şîni desmac.

Xizmekar ber kêni a, yi cizmûn bênî çîr ver di pak şuwênî û ûnî cadî nûnî rue. Sêrsibay paşa zî wirzenû, yi piyer piya siparê xwi wenî. Paşa vûnû:

— Temûm. Ez biray tu qayil bîya.

Yi ruejê vêvî tayîn kêni, luy û arwûnçî yêni kê xwi. Arwûnçî luy ra vûnû:

— Wayê, ma vêve kerd ma vêv unî çâ? Kêney paşay nîna ini arye di nivindena.

Luy vûna:

— Ti qarîş nyebi. Ez yew qonax zûna, îta d' dyêb vindênî. Ma vêv bênî ow qonax dyebûn.

Ruejê vêvî yena, luy û arwûnçî şîni kê paşay. Byesilmê (bêsilmê) paşay kênek xemilnênî, temzî ûncênî sûrat vêv ser. Pa def zurna ya vêv kuwena teber. Vêve kuwenû riye. Paşa xêliyek xizmekarûn û byesilmûn zî kêney xwi ya şawenû. Luy yin ra vûna:

— Şîma yawaş yawaş bîyêreni, ez vêv nî di şîna, semêd şîma ya çî kena hadre.

Luy şîna, raşt yew bir pês yena. Luy şûnûn ra vûna:

— Min a pê esker paşay ho yenû. Eger

şîma ra persay va "şîma şûnê kum ê?", vaciyeni ki "ma şûnê Tozî Beg ê." Nûn niye esker şîma kişenû.

Luy bir pês ra vyerena, binêna şîna raşt yew bir diwar yena. Ya gawûnûn ra vûna:

— Min a pê esker paşay ho yenû. Eger şîma ra persay va "şîma gawûn kum ê?", vaciyeni ki "ma gawûn Tozî Beg ê".

Luy şîna, şîna vêr qonax dyebûn. Di tenê dyêb hê zerre d' ê. Luy vengâ dyebûn dûna, vûna:

— Lo, lo, şîma hê zerre di se kêni? Esker paşay ho yenû şîma ser, wazênî şîma bikişî.

Dyêb vûnû:

— Wayê, ma se bikiri, ma sera şîmi?

Luy vûna:

— Vêciyeni teber, bin ina quçê çarrûn di xwi binimniyenî, îta di kes şîma nivînenû.

Dyêb yêni teber, kwênî bin quçê çarrûn. Luy ûna qaz kena dûmarê quçê çarrûn ri û adir nûna pa. Çarr vêşênî, wird dyêbî zî pa vêşênî. Ti rî dinya ra çînay vac koşkê dyebûn di est. Her çî yin altunûn û şîmûn. Vêve yenû, luy vêvî ûncena zerre. Xelatûn dûna piyerê xwiwêndiyûn û berbûriyûn. Firaqûn altunûn, shehûn altunûn, kemerûn şîmîmûn dûna xwiwêndiyûn û berbûriyûn. Yi piyer şîni kê paşay. Arwûnçî, cinî yi û luy qonax dyebûn di mûnenî. Arwûnçî raştâ benû Tozî Beg.

Ruêjêk luy xwi b' xwi vûna mi inî rî ehend holê kerd, dê ez xwi niwêşî nî de ini se kenû. Luy mexsûs xwi nûna niwêşî, ryex kena, ow cawûn a gêrena.

Arwûnçî cinî xwi ra vûnû:

— Ina çî ya inî zerrê piyer ryexi di verday, quêl yay tepîşî berzî teber.

Luy vûna:

— Hû! Arwûnçî aşûn,

Mi tu kerd zûmay paşûn,

Aya ra ti dêst mi gêni,

Mi erzenî kaşûn.

Kênak vûna:

— Ha! Dêmek ti arwûnçî!

Yers bena, kuwena teber, şîna. Arwûnçî xwi erzenû lingûn luy, vûnû:

— Wayê, qirbûn tu bena, ti şwêrî cinî mi bîyarî.

Luy şîna pê ra resena kêney paşay, vûna:

— Dê biye, ez xwi rî biray xwi di bîya şa, mi o qêde va. Kênek gêrena a, yena kiye.

Hin luy raştâ bena niwêşî zî, yi zaf miqatê yay bênî, zaf ci ri xizmet kêni. Luy mirena yi nieftûnî mehît yay bêrzî teber. Yi goşt luy wênî, estûn yay zî astarakûn a kêni dar d'. Estê luy tim kê yini di mûnenî.

AZAD DILÊR

Tepêş destê mi

Lajo tepêş destê mi,
Lawo tepêş destê mi,
Veramedi destê mi.
Ez gula bostanan a,
Ez dismala xortan a.
Ti tepêş destê mi,
Tepêş, tepêş destê mi.

Keynê destê xwi bidi destê mi,
Ez tepêşa destê to,
Ez nêverdana destê to.
Ez aşiqê bejna to,
Ez heyranê bejna to.
Ez nêveradana destê to,
Nêveradana destê to.

Lo lawo,
Ez kevaniya keyan a,
Ez bêriya helda şanî ya,
Bewrana sorniyan a,
Ez hewnê şewandê kilman a.
Lo lawo, ez xezala nê koyan a.
Ti tepêş destê mi,
Tepêş, tepêş destê mi.

Lê keynê, lê lê keynê,
Ez seydvane nê koyan a,
Ez gawanê nê dewan a.
Ez nêverdana destê to,
Ez heyranê bejna to.
Nêveradana,
nêveradana destê to,
Ez aşiqê bejna to.

Bi Kirdênda çorşmedê Madenî ya sohbetê -7-

HAYDAR DILJEN

Trênî amê Maden

— Wexto ki trênî amê Maden yeno to vîrî?

— E, yena mi vîrî. Kê Xal Newzafî mahlada qarşî di bi. Ma şiyê wija, cor ra seyr kerdê. Xal Newzat merdimêndo zof rind bi. Winî weş weş qesey kerdê. Trênî omêbî, wina tiya ra wija dûrî bî, ê tere-wizê tirênî estê ya, ê darê ki erzenê zeredê demirî (asîni), yê, nay ro, Xal Newzafî nan paştî û new-des teney epey mesafe eyştê. Trênî wija ra yawaş ameyê tiya û vînderdê. Eynan ancî darî eyştê û ray viraştê, trênî ancî yawaş ameyê. A hinî yena a mi vîrî.

— Yanê kiştê ra darî ronayê û asin nayê ser û kiştê ra trênî ameyê.

— E. Trênî dim a ameyê, yawaş yawaş ameyê.

— Miletî se vatê?

— Miletî vatê “çiyê esto yeno, trênî çî ya; la wedeyê pa, wedeyê pa, hergu jû wede zey nê wededê ma wo”. Verî wedey çînêbî. Winî her dewî di ya jû bî ya çînêbî. Vatê “zey nê wededê ma, nêzona çend tene insonon cênê (gênê) û bestenê piya”.. Hona ma nêdîbî. Bado diha ma dî, vatê wît wîit. Ma qeçkan xo bestê piya û zey trênî kerdê, vatê wît wîit.

— Şima trênî kay kardê?

— E. Ma şiyê dewarî ver. Ma trênî kay kardê. Ma pêro niştê pê, ma ze trênî kerdê wît wîit. Verniya ci min antê. Piyê min vatê “qaltaxî, ti şina dewarî ver, he-ta şon wît-wîti ken”.

Leyrê tomofili

Cinêkê estîbî, nameyê ci Pîra Ferikî bî. Dewda aşî ra bî. Lajê xo verdê biharî (behr, dolê Xezarî) di xebitiyayê. Lajdê xo rê non berdê. Vatê “ez Memedê xo rê non bona”. Maya minînan wija di nahay (nihay) çînayê. Maya mi va “aşta amê, wahşî bî, teba nêzonê”. Wahşî biya. Şiya wija, eyna qey cil-milî, palasi eyşta ser. Vato “na çî ya tiya?” Lajê ci vato “tomofil a, tomofili”. Ay vato “na tomofil a?” Vato “e.” Vato “nê çî yê?” Yê cilê ki xo rê tey piştî-miştî kuwenê, qey eyştê pê ser. Vato “nê leyrê tomofil ê, tomofili ziyawa (zaya) û leyrê xo yê wija di; cilî dayê pira ki wa germinî bê”. Pîra Ferikî omê, marda mi rê va “Hora min, Hora min, hele bê, Hora min hele bê”. Maya mi va “Pîra Ferikî çî yo?” Va “oxil, min ecêb dî, min ecêb dî!” Maya mi va “to çî dî?” Va “min non berd wija, tomofili ziyêbî û leyrê xo wija bî, cilî daybî pira, vatê wa tiya germinî bê”.

Portqalî

— Şima fina siftê pûrtqalî senî dî?

— Ma qijî bî. Di mêrdekî ameybî. Ê mêrdekî şîbî Adana di bigirweyê, aşta ameybî bêre şîrê dewda xo, wija pûkî yaxalamiş kerdîbî, yanê serd di qefilyaybî, xeniqayaybî. Şî ardî çêdê ma, ma kerdî meymanî. Jû portqalî veti dê ma. Ma portqalî nêsinasnê. Çînêbî o zeman portqalî.

— Ti wexta çend serrê biya?

— Ê wextî ez hendê Roza nêbiyê.

— Yanê şeş serrê? Nika ti çend serrê ya?

— 62

— Vanê cinî serranê xo raşt nêvanê, winî yo?

— Nê nê, ez raşt vana.

— Yanê 50 serrî verê ney, fina siftê çimê şima guna pûrtqalî ra?

— E.

— Pekî verî Maden di dûkanan ser o zî qe pûrtqalî çînêbî, qe to nêdîbî?

— Ez Maden nêşiyê. Ma dewî di bî. Nê nê, çînêbî. Bibiyayê ma diyê, pêre min sinasnayê.

— Ey zî nêsinasnayê?

— Nê, nêsinasnayê. Ma portqalî wija di dî. Emserr ancî birayê min na mewzû va. Birayê min kerd xo dest pa kay kerd.

— Bi portqal a kay kerd?

— E. Birayê min gazi kerd, va qey say a, çî ya. Mêrdekî va ki “na pi pi pi pajiyena”. Birayê min pati, va “boya weşî ci ra yena”.

— Qey mêrdekî zî bol serd girotbi, ziwanê ci nêgeyrayê?

— Esas kekez bî, zatan serd xo ra serd bî. Ziwan bîbî kilit. Adirî ver di ling-mingê inan kerdî awki, destê inan kerdî awda germi. İşte ma wexta portqalî dî. Portqalî çî bî oxil? Çînêbî.

— Cinîyê dewda şima û çorşmedê dewda şima Tirkî zanê, Verî zanayê?

— Nêzanayê.

— Senî Tirkî musay?

— Nika mûsay. Nika herkes şino şe-hêr mehêr, mûsay.

— Şinê sûkan ha?

— Ya, nika şinê. Pêro gencî xebîitiyênê, girwe dir ê. İşte zimistanî şinê Maden, şinê Xarpêt, amnanî yanê wija dewda xo. Nika qijik mijikê xo zî Tirkî vanê. Reşî xo rê Kird vana.

— Reşî kam a?

— Reşî, a cinêka ki Culêran remnêbî. Reşî, Pemi, Necîfa, Rayfa, nê Tirkî nêzanê. Nê nikayênî zanê.

Çilekî

— Çilekî key amey hetê şima ya?



— Çilekî, diha ma ameybî Xarpêt, wextî vejîyay. Diha lacê mi Ercan bi, wextî vejîyay. Verî ma çilekî nêsinasnayê.

— Yanê 25-30 serrî verê ney?

— E.

Kalikê pêrdê mi kelî naley kerdî

— Em Bêzar, şima rê çî rê vanê kê Kelaliyan?

— Leqemê (leqabê) ma winî yo. Kalikê pêrdê mi kelî naley kerdê, qandê coy.

— Kelî naley kerdê?

— E.

— Kelî senî naley benê?

— Fina siftîni aşnawênê, co ra nê leqebî nanê pa. Yanê çido wina dinya di nê-biyo.

— Yanê kelî senî naley kerdê?

— Verî trênî çînêbî; arabay, otobozî, tomofili çînêbî. Eskerê verênî pey karwana estorî, qatirî, devey arzaq bar kerdê şiyê. Yanê ray dayê karwanî. Wija kalikê pêrdê mi Alî ju baraqa viraştîbî, tepî ser o.

— Dewda şima hetî?

— E, dewda ma hetî. Ercanê min zono. Fêzê devan. Wija di fêz dayê devan. Barê xo nayê ro, îstirhet kerdê. Wija di o kalikê pêrdê mi cade (ray) dano ci. Zeki nika cade danê trênî. Ze bekçî wija tayin biyo, şew-siba cade dano karwanî; yanê “cade boş (veng) o, şêrî”.

— Yanê ray dano karwanî?

— E, ray dano karwanî. Dima, amey, karwano pîl o, jew alay esker. Yanê şinê Bexdadî ser di.

— Anqere ra yanê, kotî ra yanê?

— Nêzona, cor di yanê, diyar ra yanê. Baî (rojawan) ra yanê herhalde, şinê Bexdadî ser. Cade wija peydê dewda ma ra şino. Kalikê pêrdê mi, wija cade wezî-feyê xo yo. Wija cade dano ci, vano “şê-rê açix (akerde) o”. Alay qumondoarî vano “tiya, no dûz di ma îstirhet danê heywonon, eşmo (emşo) tiya benimi”. O vano “hay hay, eşmo mêmânê mi bê”.

— Kalikê pêrdê to vano?

— E. Heta wextî nomeyê xo Alî biyo.

Qumondon vano “ti senî winî vanê, ma bi heywonon a qoce ju alay esker zafî yê”.. Hem o dûz di heywona em kenê hem de (zî) insonî yemeg wenê. “Nika wija seha top a. Kalikê mi vano “to di qazanî estê, to rê çî lazim o”. Zengîn bi. Vano “ti mîi rê qazana roni, ez deworî ona; ti 24 saatî mêmânê min ê”. A şewi wija keno meyman. Qumondar vano “ma siba şinim Bexdadî ser di; ti çî jay (cay) wazenê, çiftlixî-miftlixî ez to dî”. O vano ki “teba mi medi, ê mi zof o; feqet

çewres tene kelê mi estê.” Kelî yanê bizê-kê di serran, hîrê serran. Kelê qertî. Vano “nalbendî to di estê, estoran, qatiran nale kenê”. Insonî qalî kenê, vanê her westiriyê kelonê kalikê mîi wina bi. Hewes bi kelan kerdê. Vato “ez salmişo koy kena, şon di yanê hergu jewî çiman ser o henday çerpe baxlamiş (girêdaye) beno. Lingê xo, simê xo çartlamiş biyê. Tabî kelê çend serran ê, şinê ro ko. Vano “ti yê kelanê min naley ki”. “Wîm” vano, “sere wû çimandê mi ser, zatan nalbend ma dir o, ez to rê naley kena”. Çiray kelî naley biyê? Aman ya Rebbî!

— Nê Dimilî bol yaman ê.

— Ya. Ma kel nale beno? Ano 40 tene kel nale keno. Nameyê kaldê ma Alî bi heta wextî. Zazan, Kelalî na pa. Yanê kelî naley kerdê. Leqemê ma wina biyo Kelaliyan.

Pêre min û Huseyndê Devî ya dayê pê-ro. Ciranî bî, sungu sungu ameyê pê. Vate “lila bêmâmûs, tebayê to tiya esto? Ti îçguwegî ameyê tiya çêdê camêrdan ser; kalikê min herê zey to nale kerdê û riştê ko”. İşte insonê veriînî wina bî.

Kayê qeçkan

— Wexto ki şima qijî bî, şima kamcî kay kay kerdê?

— Qontil kay kerdê. Tûl kay kerdê. Za Gulê Zaza Gulê kay kerdê. Çimovîl kay kerdê. Nimûnekey kay kerdê.

— Şima senî dest pa kerdê?

— Ma “Êkilo di nêkilo” vatê. Kê ser o mendê, ay dest pa kerdê.

— Ti “Êkilo di nêkilo” zana?

— Ez tayn zona.

Êkilo

Êkilo di nêkilo

Çara çim a

Biska Xim a

Ala ving a

Bê quling a

Taşî şiya

Çek boynî ya

Vistîkî ya

Qontil

— Qontil senî kay kerdê?

— Darêndo winayin cayê di nanê ro. Danê piro. Qontil heta ki şino, dest nanê to ya, vanê “ti veşay”.

Za Gulê, Zaza Gulê

— Zaza Gulê senî bî?

— Çiwe nayê lingda xo ser û eyştê. Her kesî sira ya eyştê. Ma vajim ponj kesî kay kenê û herkes çiweyê xo erzeno. Bi

sira ya eyan ra jew vano "Za Gulê, Zaza Gulê; Za Gulê, Zaza Gulê; Za Gulê, Zaza Gulê" û remeno, çawan arê keno. Ki bênefesgirotîşî, raşt vajo "Za Gulê, Zaza Gulê; Za Gulê, Zaza Gulê" û çixîza ki ci pey di çuwe eşto, ravêno, qezenc keno. Ki nefes bigîro, pey di şino û newe ra çawan arê keno.

Çimvît

— Çimvît senî kay kerdê?
— Êkilo di nêkilo vatê. Kê ser o mendê, çimê ci bi çit a bestê. Ê bînî ci dorme ra arêbiyayê û cikut kerdê, tayini gişti eştê ci. A ki çimê ci bestey bî zî geyrayê ki tepîşo. Ki jû tepîştê, ci vera nêdayê. Kamî ki tepîştê, çimê ay girêdayê. Na kay zof weşî bî.

— Wexto ki na kay kay kerdê, dêrî mêrî nêvatê?

— Nê. Huwayê, ha ha ha.

— Keynekan û lajekan a piya çimvît kay kerdê?

— E. Ma piya kay kerdê. Ma daha ki bî girdî, wexto ki pîlî ma ra qehriyayê vatê "şo çimvît kay ki, şo". Daha ki ma bî pîlî tepya, ma çeynekon xo rê ciya kay kerdê. Zaza yê, ma yaxme wo, winî nêbeno.

Nimûnekey

— Nimûnekey senî kay kerdê?
— Çimê xo girotê, şiyê nimyayê. Çimî girotê vatê "koko peşawo?" Jewî vatê "e". Ki vatê "e", ti bizani ki o ki çimê xo girotîbî, o yo geyreno ê ki xo nimito. Kam ki tepîştê, no qor ey çimê xo girotê. 8.4.1990

Dêrî

— Hetê Madenî ya dêrî zafî yê, winî nê?
— Nika çinîyê. Êgan, verî, înononê verênan, pêrê mi nê vatê. Kewtê axuri, dewar qaşaxu kerdê, nê dêrê verênî vatê. Vatê verî veyvan di teyşt dayê piro, nê dêrî, Xim Ximê -mimximê vatê, cinî û camêrdan kay kerdê.

— Xim Ximi senî vatê?

— Ez zof nêzona, min vîr ya şiya.

— Hema tayn vaji.

Xim Ximi

Xim Xima Silêmonî
Xim Çeyna Silêmonî
Riwenê serdê nonî
Pironê bindê zonî
Heyranê Xim û gonî
Ca çino lewê ponî
Wa vîndo gomda şonî

PANORAMAYA MENGANDÊ...

No di serrî yo ki dewletî temsîlcîyê Qibrîsî û dewletandê Tirkan ê bînan arê dana Anqere, merasim û konferansan virazena. Di nê merasim û konferansan di nutiqê millîyetçîyey yenê eştiş. Di konferansdê emserî di Demîrelî va "bextiyarey ê kesî rê ki vano/vana ez Tirk a" (Ne mutlu Türk'üm diyene).

Ka, neyna realîteya Kurdan qebûl kerdê? Ka, ma birayê pê bî? Na helwesta (tavirê) nîna zî fina eşkere kena ki, nê qandê ki Kurdan bêşexsiyet bikerê, çî çî eyan dest ra yeno kenê. Yanê çiyê layiqê Kurdan nêvînenê. Ki demeyê ra vajê "ma Tirkî niyê, ma Kurd ê", mat memanê!

Televîzyonê Kurdan ya ê koruciyân?

Hukmatê Mesût Yilmazî zî mesela Kurdan ze mesela "terorî" vînenê û mesela hewaleyê ordî kerda. Labirê ancîna zî ê

Germ o çinca omnanî
Maden o bê fermonî
Honik o serê bonî
Xim Ximê naşt û aşt a
Kembero kîşt raşt a
Ti vanê mi viraşt a
Ti Xima şardê aştî
Tifingê xortan raştî
Kalan erdîştî taştî
Ximi biskî viraştî
Verê bandê ma balconî
Peyê bandê ma balconî
Balconê Ezirconî
Xim ana boxçay nonî

Emî

Na Em a berî ver o
Giley sûrî zonyan ser o
Ez şêrî kom to bero
Derba Hecî xençer o
Xençer û debançer o

Emê hadê to berî
Heta mêrdê to bêro
Ti bena zeydê verî

Ma şinim Hemda reşî
Ma ra yena boya weşî
Çim keno ti biveşî

To keno qulda heşî
Heyranê gon û leşî
Qandê to bena nêweşî

Ti çeynê çeyna mîran
Engura rezdê hîran
Werdê kalan û pîran
Toleyê serdê stîlan

Ding-ding o banî ser o
Ding-ding o banî ser o
Tembûr o zoniyan ser o
Verg yeno tûşkî bero
Emoy Qijoy se kero

Teyrî

Teyrî yena teyra Mûşî
Per finena kaş û kuşî
Çimî korî bê Başçawîşî

Teyrî yena teyra zerdî
Per finena wetenî ser di
Çimî korî bê qomondona ver di

Teyrî yena teyra Wonî
Nişena çengedê bonî
Çimî korî bê Qomondonî

yê mesela TV û mektebandê xusûsiyan di wendişê Kurdkî munaqêşe kenê. Qandê ki Tirkî samîmî niyê, kes nêşeno bi na hedîse ya kêfweş bo. Labirê ki ewro fekde Tirkan ra qîseyê winasîni vîjenê, ganî kes bizano ki ê yê zaf tengane di.

Ki kes partiyanê Tirkan nêşinasno, kes do vajo qey ê yê kenê çiyêndo newe Kurdan rê biyarê. Labirê hefteyê miyan di bi qisandê wezîrdê zerrî Ülkü Güney û çend parlamentaran a kilawî kewtî û keçel vijya meydarî. Ülkü Güney na mesela ser o wina vano: "MED TV di o yo vera dewlatî propaganda bena. Qandê ki ma bi nê zîwanî (Kurdkî) ya raştêy ifade bikerê, ganî ma di TV3 û TV'dê GAP'î di bi Kurdkî ya neşriyat (weşan) bikerê". Na xeberî di 31.3.1996 di Radyo, TV û gazetandê Tirkiye di vila bî. Yanê zeki nê qisandê Ülkü Güney ra zî eşkere beno, ne ki ê wazenê ze heqêndê insanan biewniyê meselada TV ra û zîwanê Kurdkî, kultur û tarîxê Kurdkî vinîbiya-

FERHENGÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ - XIV • Malmîsanîj

Kirdkî (Zazakî)	Pehlevkî (1)	Kurmanckî
pewjiyayîş, powciyayîş	pejawişn	pijîn, pêjîn
pewte, powte, pote	puxtek	patî
peyser, pey, peynî, paştî	petsar, puşt, epaç	li ser piştê, pişt, paş
pê persayîş	hempursîşn, hempursekih	hevpirsîn, li hev pirsîn
pêr, pi, babî, baw	pîter, pît, pêt	bav
pêrî, pêrey, piyî	pîtarîh	bavtî
pêrodayene, pêrodayîş	purîten, purten	pevcûn, lihev xistin
pird	pul, puhr, viterek	pir
pirr	pur	tije, pîrr
pistan	pistan	pêşîr
piştene, piştîş	poşîten, pûştîten	pêçan, pêçandin
pîr	pîr, mester	pîr
pîrî, pîrey, pîriye, pîrenî	pîrîh	pîrî
piyaz, piyanz	piyaz, peyaz, peyaç	pîvaz
pol, per	pehlûk, bar	per
polat, pûlad, pola	polat, polawt	polat, pola
poste, pûste	post, pûst	post, pûst
posteyên, pûsteyîn	postên, pûstên	postîn, bi post
poşman	peşêman, pesêman	poşîman, poşman
poşmanî, poşmaney	peşamanîh	poşîmanî, poşmanî
pewtene, pewtiş, pewcnayîş	pezîten, peçîten, poxten,	patîn, pijandin, pêjandin
put, pût	but	pût
Q	Q	Q
qatir, qantir	ester	qantir, qatir, hêstir
qic, qiç, qij, qiz; qicek, qicik,	kûç, kuçek	piçûk, qic, qicik, kiçik,
qine, qeni	kûn	qûn, kûn
quling	kuling, kuleng	qulung
R	R	R
ra	heç	ji
ra/rê/rî (ena ra, na ra)	rad, ray, ra (êt rad, êt ray)	bi, jibo
ramitene, ramitiş	ranten, rewênîten	ajotin
rast, raşt	rast	rast
raştiye, raştêy	raştîh	raştî
ray, rey, reye, raye, rayir	rah, ras	rê
refşiyayîş, recifiyayîş	drefşîten, lerzîten	ricifîn, lerizîn
refşiyayox, recifiyayox	drefşnik	yê ku diricife
renci	renc, dert	renc
resayîş	resişn, ameten, averîten	rageyiştin, gihîştin, gehîştin
resayîş, deresayîş	resişten	gihîştin, gehîştin, gihan
resen, resne; rişte, riştik	resen, rişte, rîsman	rist, werîs
resnayîş	resênîten, anîten	ragihandin, gihandin
rey, ray, raye, fini	rîn, vîn; caver, bar	car
reya, reye	reg	reh, ra, reg
rez	rez	rez
rêç	rêşek	rîç, rîçal
rêm	rîm	nêm, kê m
rêmin	rîmen, çirkên	nê mî, kê mî
rês, rîs	rîs, rêş	rîs
rêşî	rêş	rêş
rêşin	rêşgon, rêşkên	rêşî, bi rêş
ri, rî	rod, roy	rû
ribês	rêpas, rêwas	ribês
risiyayî	rusvakîh	rûreşî
rişnayîş, rijnayîş	rêxten, rêçîten	rijandin
rişta, rişte	rêşte, rîstek	yê ku hatiye ristin
riştik, rişte, arûzi	rêşte, rîstek, arvis, arvês	rist, werîs
rîpikerey, ripikerî	rapekkerîh (2)	rîp kirin, rîpkarî, hilekarî

(1) Kellimêyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî
(2) Pehlewki di "rapekkerî" yena me'na "nalî".

yiş ra bireynê; ê wazenê zîwanê Kurdkî yo ki heta nika Kurdan bi günîda xo ya pawito û heta ewro ardo, ze sîleh vera Kurdan bigirweynê. Zeki Günerî Civaog-luy zî di gazetede Milliyetî di, 4.4.1996 di îtiraf kerd û va "xo ra verî zî di TV'dê GAP'î di bi Kurdkî ya tayn beyan û fer-manê dewletî ameyê vilakerdiş". Heta nika qandê vindarnayîştê MED TV'î çî çî ki eyan dest ra ame kerd, labirê ancîna zî

nêşay vindarnê. Nika zî ê yê dest erzenê karêndo wina. Tabî ki di TV'dê GAP'î di yan zî di TV3 di bi Kurdkî ya neşriyat bikerê do koruciyane resmîyan û xeyrî resmîyan (!) bi kar biyarê û bi no awa ya Kurdan verdê pê. Ganî bi no kay kes nê-xapiyo!

Di meselada mektebandê xusûsiyan di wendişê Kurdkî di zî feqê esta. Ez do di nuştina di na mesela sero vindêra.

PANORAMAYA MENGANDÊ VERÊNAN

HAYDAR DILJEN

Di mengandê Adari û Nîsani di hem welat di hem zî teber di xeylê hedîseyê ki raşterast alaqeyê ci bi Kurdan a esto qewimiyay. Nê hedîsan ra çend hebî bî sebêbê zerrîweşey û şayeyda Kurdan. Morale Kurdanê welatsîneayoxan pa bî weşû qandê meşti omidê eynan bî wêşî. Ez do nê nuştêdê xo di, nê hedîsan ra çend heban ser o bi çend rêzan a vîndera.

PDK û YEKÎTÎ ê yê yenê wery

Herkes zano ki sebêbê sernêkewtişdê Kurdan zafi yê; labirê semedo zaf muhîm, bê tifaqey a Kurdan a. Qandê ki Kurdî bê tifaq bê, çî çî ki destdê dişmenî ra yeno o yo keno. Yanê dişmenî qet dişmeneyda Kurdan ra vek verra nêdayo. Kurdî zî qandê ki peydimende yê û verniya xo rind nêvînenê, jûfini (gege) kêfê dişmenan bi xo anê û kewnê pê. Ma PKK çî rê êriş kerd PDK ser? Ma PDK û YEKÎTÎ pê ra çî çî wazenê? Kurdanê Başûrdê Kurdistanî, -ki ma verê 1960 nêhesibnê- nê 40 serrandê peyênan di qandê otonomî lej kerd û na ray di bi çes hezeran a şehîdî day. Herbdê Xelîcî dima tayn şertê newey vijayay orte û Kurdî bî wahêrê parlamentoy, hukmatî û dewletênda federali ki raşteyda xo di zê dewleta xoser a. Yanê zeki mirîçiki çîwe ro guno. Labirê herûnda ki Kurdî nê fersendî weş bi girweynê û jiyana şarê xo rind kerê û di mintiqada xo di bi her awa ya bibê numûneyêdo rind, tam zeki dişmenî waştê, bi xo kewtî pê û bi hezeran a şehîdî day.

PDK û YEKÎTÎ nika lejê xomiyani vîndarnayo û wazenê bîrê wery. Ez hêvî kena ki hewna vêşî şarî bi ma nêdê huwatiş û bi qeydandê demokrasî ya, yanê bi îradedê şarî rê hurmetkar biyayîş a aleqeyanê xo piya bidomnê. Ki PDK û YEKÎTÎ pê bikerê, ez texmîn nêkena ki PKK zî fina êriş biko Başûrdê Kurdistanî ser.

Partiyênda newê

KAWA, KUK, Teêkoşîna Sosyalîst, TSK, YEKBÛN û çend Kurdê xoserî, di çerçeweyêdo sosyalîst di piya kongreyê hazir kerdi û partiye rviraştî. Namê ya partiya Jubiyayîna (Yewbiyayena) Sosyalîst a Kurdistanî (Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê) ya. Na hedîsa hedîseyênda muhîm a. Kes hêvî keno ki çîyo ki na parti nayo xo ver, bi ca biyaro. Ki bi ca niyaro, a do zî bibo zey ê bînan.

Hem da'wa Kurdan da'wayênda gird û têmiyankewtê ya û hem zî dinyayê ma û demeyê ma virya yo. İhtiyac û waştîşê însanan viryayê. Zanayîş biyo sermaye û kilîtê heme çî. Di dinya û demedo winasîn di, bi grûbandê werdiyan û rêberandê nêzanan a siyaset kerdiş û şar xo dim a berdiş mumkun niyo. Co ra kes hêvî keno ki na parti na raştey xo vîr a nêkero, kadroyan û karanê xo goreyê na raştey 'eyar kero û pratîkdê HEVGIRTIN û YEKBÛNî ra ders bigîro.

PKK fek lejêdê koruciyar ra verda

Dişmenî qandê ki Kurdan verdo pê sistemê koruciyar vet. Bi nê sistemî ya 60 hezar Kurdî kerdi korucî û Kurdî verday gandê pê. Koruciyar ra tayn bi zerîda xo ya, yanê bi şîtherameyda xo ya, tayn bi zordê dewleti ya û tayn zî semedê şaşeyandê PKK bî korucî. Tayn Kurdanê welatperweran çend ki şaşeyê PKK û koruciyar ard ci vîrî zî, eynan na şaşeyda xo ra gami pey di nêştî. Labirê ewro ma yê vînenê ki PKK ya nê xetayanê xo qebûl kena û êrişkerdişdê koruciyar ser ra fek verdana û vana "pêkewtişê Kurdan bi kardê dişmenî yeno". Na polîtîka polîtîkayênda bereymendê (ereymendê) ya, labirê ancî zî baş a. Xo ra xeylê koruciyar zî wezîfeyê ki dewleti ci ra waştê, bi ca niyardê. Hem Kurdê welatperwerî û hem zî korucî çend ki pê ra geyribê û lûliyanê tîfingandê xo ver a dişmenî kerê, do azadiya welatî hendi ravêrî bêro.

Çorşmedê Diyarbekirî di operasyon

Dewleta Tirki, nezîdê Diyarbekirî di, bi fantoman a, bi helikopterandê skorskî, kobra û super kobrayan a, bi tanq û top û radarandê modernan a 20 hezar esker rîşt grûbênda gerillayandê PKK'î ser ki ci îhma bikerê. Labirê winî aseno ki no operasyon zî zey ê parî serî nêşîyo. Dewleti, par zî di 21'dê Adari di, yanê roja Newrozî, kiştê ra bi 70 hezar eskerî ya êriş kerd Kurdistanê Başûrî ser û kiştê bîni ra zî bi 20 hezar eskerî ya çorşmedê (dormedê) Dêrsimî di kewtibi Şemdin Sakikî dimi. Wirna operasyonî zî bi fiyasko ya qediyaybî.

Tirkî wazenê Newroza ma zî ma ra bigirê

Kurdan emser zî Newroza xo zilmî bin di pîroz kerdi. Kurdî, ê yê serrandê 70 ra nata yo ki Kurdistanê Vakurî di adirê Newrozî gurr kenê. Hetta tayn Kurdan, qandê ki barbareya dewleti protesto bikerê, xo veşna. Her serri zî polîs û eskerandê dewleti êriş kerdê nê roşandê Kurdan ser. Winî bibî ki, Tirkiya di û Kurdistan di Kurdan ser o kesî bol çî nêzanayê, labirê zanayê ki Newroza roşanê Kurdan a.

Dewleti û partiyanê ci di ki ê yê nêşanê vernîya pîrozkerdişdê Newrozî bigirê, dest pa kerd û va "Newrozî roşanê Tirkan ê hezar serran a". Ma dest di Newroza ma mendibi, wazenê ey zî bigirê.

Dewamê ci r. 23

**Operasyonê hukmatê newî: "Atmaca"**

Dwleti zey her serri emserr jî dest bi operasyonê wesarî kerd. "Operasyonê Atmaca" 5'ê Nîsane di dest pa kerd û hewna jî dewam keno.

Gorey ma'lûmatanê dewleti, çend rojanê sifan di 27 eskerî û nezdiyê se gerillayê PKK ameyê kiştene. Cenazeyê eskeran bi merasîm a amey definkerdiş, labelê dewleti tenya 2-3 gerillayê kiştêy mojnay rojnamenuştoxan.

Eke ma'lûmatê dewleti raştî bê, yeno o mane ki înan tayn sîlehê yasaxî girweynay, cora jî nêwazenê cenazan bimojnê rojnamenuşto-

xan. Winî aseno ki nê operasyonê emserrî jî zey ê bînan ser nêkewtê.

Kiştê bîni ra teyarey û helikopterê Tirkan her roj hucûm kenê mintiqanê Kurdistanê Îraqê yê sînorî ser. Gorey beyanê PDK a Îraqî, Tirkan 8'ê Nîsane ra nata dewê Baloka, Mîlxate, Helwa, Sipîndarê û Tirwanşê yê mintiqada Berwarî Bala û dewa Jame ya mintiqada Barzan bomberdûman kerdê.

Beyan di no çî yenê protestokerdiş û hukmatê Tirkiya ra yeno waştîş ki nê hucûman derhal vîndarno.

PYSK: Faydê mileta ma heme çî ra ver yeno

Panc parti û grûbanê Kurdistanê Vakiurî (KAWA, KUK, Teêkoşîna Sosyalîst, TSK û YEKBÛN) beyntarê 21-27'ê Nîsane di piya kongreya yewbiyayîşî (jewbiyayeni) viraştî û partiyanê newê, PYSK (Partiya Jubiyayîna

(Yewbiyayena) Sosyalîst a Kurdistanî) viraştî.

Nê panc parti û grûban no nezdiyê serr û nîm bi piya kar kerdê ki bibê yew (jew) û partiyanê newe ya sosyalîst virazê.

Yewê Gulane di gûnî rijiyê

Yewê Gulane di Îstebol Kadiköy di beyntarê polis û tayn grûbanê çepan ê Tirkan di lej vijiyay û netîce di hîrê tenî amey kiştene, xeylê kesî jî bî birîndar

Nê grûban meydanê mitîngî di nêverda mesûlê sendikayan qisey bikerê û kuçandê Îstebolî di 'erebey veşnay, camê dûkanan sikitî.

**Emrê tepîştîşê wezîrê Îranî**

Mehkema ki hewnêna da'waya kiştêna Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranî Sadiq Şerefkendî û embazanê ci -ki payizê 1992 di Berlin di ameybî kiştene-, emrê tepîştîşê wezîrê Karê Zerrî û serekê istixbaratê Îranî 'Elî Felahyanî da. Gorey mehkema, nê wezîrî emrê kiştêna rêberanê Kurdan dawo.

Ecevit: "Wa Saddam bêro Kurdistan."

Serekê DSP (Partiya Çep a Demokratîk) Bülent Ecevit wazeno Hêza Çakûçî Kurdistan ra şîro û Kurdê Başûrî bikewê binê xezebê Seddamî. Gorey Ecevitî heta no quwet mintiqaya nêşîro, talûkeyê perçebiyayîşê Tirkiya û viraziyeayîşê dewleta Kurdan orte ra nêwerzeno.